

FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ

# KURDÎZAN

Rûberîna Zaravên Kurdî



# **KURDÎZAN**

**(Rûberkirina zaravên Kurdî)**

**Fêrgîn Melîk Aykoç**

**Weşanên  
ÎNSTÎTÛTA KURDÎ**

# ÎNSTÎTÛTA KURDÎ

Ji bo Lêkolîn û Zanîst

**Navê pirtûke:** Kurdîzan ( Rûberîna Zaravên Kurdî)

**Nivîskar:** F. Melîk Aykoç

**Weşan No:** 10

**Çapa Yekemîn:** Êlûn 1996

Finowstr. 27, HH, 4. Etage

12045 BERLÎN

Tel.: (030) 6821145

Fax: (030) 6810243

© Weşanên Înstîtûta Kurdî

**ISBN:** 3- 930943- 10- 7

## **Dağıtım Yeri**

Mezopotamien Verlag

und Vertriebs GmbH

Stolberger Str. 200

50933 Köln

## NAVEROK

<b>Guhertina ziman .....</b>	<b>15</b>
1) Pirsgirêka zaravan.....	15
2) Dîtinên zanyaran li ser guhertin û pêşveçûna ziman .....	16
3) Di dîrokê de zaravên koma Êranî û di nav de cîhê zimanê Kurdî .....	26
4) Cîh û warên van zaravan .....	28
5) Zimanê Êranî yên nûjen û di nav wan de cîhê zimanê Kurdî Zaravayên Kurdî têkilî û cûdahiyên wan.....	37
 <b>A- Dengzanist (Phonetîk) .....</b>	 <b>39</b>
1) Dengzanista Radengî (Fonetîka Artîkulatorî).....	40
2) Tîpên dengdêr .....	40
3) Tîpên lal [dengdar].....	42
4) Varyantên tîpan (pîtan) .....	44
5) Têkiliyên tîpan .....	49
6) Di Kurdî de veguhezstina dengan .....	50
7) Di Kurdî de ketin yan jî wendabûna dengan .....	73
 <b>B-Peyvzanist (Morfoloji), çend gotin li ser peyvzanîne, yan jî virastina peyvên Kurdî (di zaravan de) .....</b>	 <b>77</b>
1) Bi alîkariya pêşgîn û daçekan virastina peyvan .....	77
2) Bi alîkariya paşgînan virastina peyvan .....	101
3) Di zaravên din de paşgîna zayendê .....	106
4) Bi alîkariya lêkeran virastina peyvan.....	135
5) Bi alîkariya rengdêran virastina peyvan .....	142
6) Bi alîkariya peyv û peyvan virastina peyvan .....	143
7) Di Kurdî de tewanga navan yan jî, tewanga peyvan .....	144
 <b>C- Bernavên Kurdî .....</b>	 <b>153</b>
 <b>D- Daçekên Kurdî .....</b>	 <b>163</b>

<b>E- Hoker</b> .....	169
<b>F- Pevgirekên zimanê Kurdî</b> .....	173
<b>G- Rengdêrên zimanê Kurdî</b> .....	175
<b>H- Lêkerên zimanê Kurdî û demên wan</b> .....	179
1) Di Lêkeran de radêr (infinitiv).....	179
2) Beramberkirina çend lêkerên bingehîn û hêsan .....	185
3) Beramber yan jî, rûberkirina çend lêkerên hevgîn .....	186
4) Di lêparîna lêkeran de dema niha .....	195
5) Di lêparîna lêkeran de dema boriya têdayî (perfectus) .....	209
6) Di lêparîna lêkeran de dema boriya dudar (passe - simple) ...	216
7) Di lêparîna lêkeran de, forma domdariya di nava dema borî de yan jî, çiroka dema niha (imperfectus) .....	219
8) Di lêparîna lêkeran de dema boriya çirokî (plus - quam perfect) .....	222
9) Di lêparîna lêkeran de rewa (mode, kîp) .....	224
10) Di lêparîna lêkeran de dema wêbê (futur) .....	229
11) Bikaranîna dema pasîv, yan jî forma pasîv .....	231
12) Dîsa awayek forma pasîv, tiştek dan kirin.....	237
13) Di Kurdî de forma taybetî (ergetive konstruktionen) .....	239
14) Lêkerên alîkar .....	241
15) Di Kurdî de Lêkera “hebûn” .....	246
<b>I- Çend mînak ji hevokên Kurdî (hevok - zanist)</b> .....	249
<b>J- Encam</b> .....	255
a) Kurmancî .....	256
1) Yekîtiya Kurmancî û Kirdkî (zazakî) .....	256
2) Cudahiyên zaravê Kurmancî û Kirdkî .....	261
3) Hin têngînen cuda xuya dikin le bi bingehîn ne cudanin .....	262
4) Yekîtiya Kurmancî û Soranî .....	267
5) Cudahiyên Kurmancî û Soranî .....	268
6) Yekîtiya Kurmancî û Goranî .....	268
7) Cûdahiyên Kurmancî û Goranî .....	272

8) Yekîtiyên Kurmancî û Feylî (Lorî) .....	273
9) Cudahiyên Kurmancî û Feylî .....	275
10) Zaravê Lakî (Kelhûrî) û Kurmancî .....	275
11) Zaravê Ardelanî û Kurmancî .....	276
<b>b) Kirdkî (Zazakî) .....</b>	<b>276</b>
1) Têkiliyên Kirdkî û Kurmancî .....	276
2) Têkiliyên û yekîtiyên Kirdkî û Soranî .....	276
3) Cudahiyên Kirdkî û Soranî .....	279
4) Yekîtiyên Kirdkî û Lorî (Feylî) .....	280
5) Cudahiyên Kirdkî û Lorî (Feylî) .....	283
6) Kirdkî û Lakî (Kelhûrî) .....	283
7) Kirdkî û Ardelanî .....	283
8) Kirdkî û Goranî û Yekîtiyên wan .....	284
9) Cudahiyên Kirdkî û Goranî .....	287
<b>c) Soranî .....</b>	<b>288</b>
1) Yekîti û Cudahiyên Soranî û Kurmancî .....	288
2) Soranî û Kirdkî .....	288
3) Yekîtiyên Soranî û zaravên başûr yên din .....	288
4) Cudahiyên wan .....	288
<b>d) Zaravên Başûrên Rojhilat û Goranî .....</b>	<b>289</b>
1) Yekîtiyên Zaravên Başûrên Rojhilat û Zaravên Bakûr .....	289
2) Cudahiyên van zaravan .....	290
<b>e) Gotina dawiyê .....</b>	<b>290</b>
<b>K- Ferhengok û Têgînên Rêziman .....</b>	<b>292</b>
<b>L- Çavkaniyên vê xebatê .....</b>	<b>306</b>

\* \* \*

## Pêşgotina Înstîtûta Kurdî

Zanistî, ji hêla perwerde, pêşveçûn û xwebûna civakan pêwîstiyêke bingehîn e. Civakeke bê zanist û zanyar ne di jiyaneke rastewan de ye. Înstîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist, ji avabûna xwe pê ve her tim tund li ser pêdiviya zanist û karên lêkolînê ji bo her beşên civaka Kurd û Kurdistan radiweste.

Mîna brêz Dr. Îsmail Beşikçi jî, dibêjê, kesên pêwîstiya wan bi zanistî hene, divê di warê zanistî de gelek zêde ked birijînin, iro ji herkesî bêtir divê Kurd di vî warî de bixebitin.

Çand, dîrok, ziman û jiyana netewan çiqas li ser rastebingehêke xurt ava bibe, pêşketin, bi xwe bawerî, evînmirovî, dilovaniya kesên wê netewî jî, ewqas dilberz dibin, li ser rastezeminê mirovahiyê dimînin. Kurd dixwazin bi rastiya xwe bijîn. Di her beşên civakê de avasazî pêk tînin û pêş ve diçin; ji ber vê jî, di avasazî pêşveçûnê de balkêşî, hesasî, durust û objektîfî divê her tim bingeh bin. Di hemû xebatên xwe de, heta ji me bê, em bê jibîrkirina xweşmeziyetên mirovatiyê giranî didin durustiya lêkolîn û zanistî.

Pirtûka birêz Fêrgîn Melik Aykoç, ji bo bibe sedema danûstandina lêkolînê li ser rûberîna zaravên Kurdî, mîna xebateke destpêk dikare bê pejirandin. Di warê lêkolîn û kedrêjê de nirxandina pirtûkê li ser xwendevan û pisporan dimîne. Mîna, her weşanên Înstîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist, ev pirtûk jî, ji rexne û nirxandinên zanistî re vekiriye û di pêşkêfxweşî û hêviya balkêşiyê de ye.

Pirtûk, li ser gelek zaravên Kurdî ji hemû perçeyên Kurdistanê radiweste, bi rûberîneke xurtepeyv dixwaze zelalî di navbera zaravan de ava bike. Carcaran cîgirtina hin peyvên devokan, bi taybetî devokên herdu zaravên Bakûr wek mînakên alîkar naverokê xurt dikin. Rûberîna ne tenê di warê peyv û hevoksazî de, di warê rêziman û dengzanistî de jî, dihêle ku mirov gelemperîçavekî li ser form û naveroka zaravan bigerîne. Bi vî awayî pirtûk, ne tenê ji bo pispor û zanyaran lê ji bo xwendevanan hemû balkêşiyek tîne pêş.

Ji aliyê ewlekariya zanistî birêz aykoç, xwe bi giranî dide ser informatan ku ev di lêkolîna zanistî de rêyekî baş e, lê hin xetere jî, bi xwe re tîne. Çavkaniyên zaravên Kurdî, bi giranî berhemên Ewropî ne; berhemên zimanê Rojhelata Navîn, bi taybetî jî, Kurdiya Navîn û Başûr (2) tê de kêma cî digirin, ev kêmasiyek e. Ev kêmasî dikare di xebatên pêşerojê de ji holê rabe.

Birêz Aykoç navê pirtûka xwe “Kurdîzan” daniye. Zimanê nivîsandina pirtûkê bi sînora hate guhertin. Di pirtûkê de, bi giranî ji dêvla tîpa “b”, “v” hatiye bikaranîn. Înstîtût guhertina lêkolînên zanistî zêde pêwîst nabîne, giranî dide naverokê. Hêviya me ew e ku ev pirtûk bi gelek pirtûk û lêkolînên din li ser rûberîna zaravan bê teqîbkirin. Weşan û kovarên Înstîtûtê ji hemû zanayan re vekirine. Em dixwazin rê li ber karên zanistî vekin daku armancên spekulatîv bi navê zanistkar pûç derkevin. Li ser zanistîbingeh pêwîstiya firehkirina kar heye. Di vî warî de gelek bar dikeve ser milên rewşenbîr û akademîkarên Kurd. Mîna her civakbeş, xurt û pêşketina zanistbeş jî, pêdiviya pêvajok û pêşerojê ye.

**Înstîtûta Kurdî  
ji bo Lêkolîn û Zanist  
Pûşper 1996**

---

1- Berhemên Ewropî, bi giranî yê Almanî ne. Berhemên Ewropî di warê ziman û zaravên Kurdî de bi piranî tijî spekulasyon in. Ewlekariya wan ji aliyê zanistî qels e. Pircaran xwe didin ser yek yan du înfomatîyan ku di warê çand û ziman de ne pîspor in. Di pêşeroja bernameya înstîtûtê de nîrxandina van berheman heye.

2- Zanyarên Başûrê Kurdistan xebatên xwe bi tîpên Erebî dinivîsînin, ev jî, dibe sedem ku kesên bi tîpên Erebî nizanibin, nikarin berjewendî ji wan bigrin.



## Pêşgotin

Li gel pirsgirekên rizgariya welat, şoreşa demoqratik û aboriya welat, Bûgîna herî giring pirsgirêka zimanek yekgirtî ye. Heta mirov dikane ji bo yekîtiya gelê Kurdistan zimanekî yekgirtî wek mercê yekemîn binirxîne. Ji bo pêkanîna zimanek wusa, pêwistî bi xebat û lêkolînên bingehînên zanistî heye.

Lêkolîn û hûrkolînên li ser ziman û rêzimanê zaravên Kurdî henin, lê gelek kêr û bi azîneyên ji hev cûda tên birêvebirin. Da Kurdistan hîn mêtîngeh û bindest e, her çi qas di bin perê YRWK de hinek gav hatibin avêtin jî otorîte û sazîyek di warê rêziman de rîstek navendî dilîze û pêşî li hemû nezanî, çewtî û kêmasîyan bigire tune. Jî ber vê egerê ev nexweşî derketine:

1- Her kesê ku zaravek (bi rasti devok di nava zaravekî de) parîkî baş dipeyîve xwe zimanzanek gelek giranbiha dihesibîne û dest bi pisporîya ziman dike. Bi serê xwe hinek qeîdeyan ji rêziman re diafirîne û peyvan çêdike.

2-Yên hinek agahdarê ziman in jî, divêjin hebe nebe Kurdîya bilind li navça me ye. Têvhevên navçe, devok û zaravayên din bîrdikin, tew naxwazin bibîhîsin, yan jî girîng navînin; bi serhişkî dikin rik, tu rexne, dîtî û rastîyên din napejirînin. (Ez divêjim, ev jî nîşanekî me Kurdan ê, em gişt xwe axa dihesibînin û bi ser xwe re tu kesî naxwazin.) Ev jî him xeletî dixê nav ziman û him jî devok û zaravayan ji hev dûr dixê.

3- Pêşnîyaran hûr nakolin û pêş de nabin, hima wisa nîv mirî dipejirînin, yan jî wek tîpên quranê pîrfiraz dipejirînin û nahêlin kêmasî û xeletiyên wan pêşnîyaran jî bê ser rastkirin. Em dikanin pêşnîyarên C. Bedirxan wek mînak bidin.

4- Zimanzanên me yên heta niha derketine piranîya wan ya Kurmancîzan yan jî, Soranîzan in. Yanî zaravên Kurdî yên din yan nizanin yan jî, tew girîng navînin û nagirin. Û gelek kesên fêlxirav û dijminê gelê me jî vê yekê bo berjewendiya xwe, van kêmasiyên me ji xwe re wekî keysek mezin divîne û li ser gelê me dilîze, Minak hinek divêjin Kird (Zaza, Kirmanc) miletek serbixwe ne.

5 - Heta îro bê di çend xalan de beramberkirina zaravan (C. Nebez

Zimanê yekgirtuy Kurd; Qanatê Kurdo Gramera Zimanê Kurdî Kurmancî - Soranî, Konferensa zimanê Kurdî yê bi hêla YRWK ê ve di navbera mêjûyê 6 - 8. 1. 1995 de li Berlînê hat darxistin de û di nav pelên Kovara lêkolîn de Xebatê Lerzan Jandil û Fêrgîn Melîk) Di vî warî de tu xebat nehatine kirin, yanî bi giştî li zimanê Kurdî nehatîye nêrîn.

Ji ber van egeran bi salane ez dixwazim li ser zimanê Kurdî, yanî ne li ser zaravek li ser hemû zaravan xebatek di pêvajoka zimanek yekgirtî de dikane bibe gavek, yan jî, di vî warî de rêya gotûbêjek vedike; pêşkêşê zimanzan û zanyaran bikim. Ez bi zanista dijwarî û çeperên li ber vê xebatê bi rê ketim. Materyalên min bidest xisti çawa kû min dixwast wisa nebûn, xebatên zimanzanên bîyanî yên li ser zaravayên Kurdî gelek kêr û bi transkripsiyonek gelek xirav û nerast hatiye nivisandin. Informantên min bi destxistin jî, tenê devokên gundên xwe û derdorên xwe dizanîn, û di ser de jî, haya xwe ji rêziman yan tinebûn yan jî gelek kêr haya xwe jê hebûn. Hinek informant jî dixwastin bi serê xwe tiştan çêbikin û bi min bidin pejirandin. Ji wê ez di pêwistiya ji gelek informantan li ser yek mijarêkî agahî hildanê de mam.

Ez ne di rîkek "tiştên herî rast van dîtin û nirxandinê min in" de me, bê gûman gelek kêmasîyên, heta dive hinek xeletî û şaşîyên min jî hebin. Ji xwe bê kêmasî jî nabin. Lê eger di pêvajoka zimanekî yekgirtî de rêya gotûbêjê veke, û bibe gavekî, wê çaxê wê armanca min bê cî û ezê gelek bextewar bim. Min di vê xebatê de giranî daye sê zaravan ji ber kû gelek materyalên van zaravan bi destên min ketin, materyalên zaravayên din him kêr û him jî min çawa dixwast wusa nebûn, nîve nîv û gelek kêr bûn. Ez di wê bawariyê de me kû wê zimanzanên me yên van zaravên din baş dizanin wê pêşkêşê me bikin. Min di vê xebatê de heta ji destê min hat yekîti û cûdahîyên zaravan, û cûdahiyên wan ji kû tîn, ew cûdahîyan bi awayek din di zaravên din de dijîn yan wenda bûne, min ev pîrsgirêkan şirove kirin. Min hinek dîtinên din jî bi gelek argumentan rexne kirin, û gelek mînak ji zimanên din jî anîn. Di gelek xalan de jî min nirxandina pîrsgirêkan li ser xwendewanan hîşt. Heta ji min hat min wateyên paşgîn û pêşgînan jî vekir daku dema peyvek tê afirandin, paşgîn yan jî pêşgînen şaş neyên bikaranîn.

Ezê li vir ji mijarê hinek biqetim û li ser afirandina peyvan jî çend gotinan bivêjim. Zimanzanên Ewropî dema ku peyvan çêdikin yan pêk tînin li ser van mercan radiwestin; ji nava ziman girtin û li ziman hatina peyvê, di rêziman de bikaranîna peyvê, di pratîkê de bikaranîneke hêsan, zanistbûna peyvê, lêkolînên di nava devok û zaravên wê zimanî de, zanyariya koma zimanên Îndo - Ewropî û xebatên pêşengan.

Çawa ku min zelal kir armanca vê xebatê di pêvajoka zimanek yekgirtî de gavek bi zanist avêtin û rêya gotûbêjê vekirin e.

Çawa ku tê zanîn sala 1995 an ji ber sêsid salîya nivisandina pirtûka

Mem û Zîn`ê Bi pêşnîyara Serokê netewî Abdullah Öcalan Di “Konferensa çand û hûnera Kurdî de ji hêla 200 rewşenbîrî ve hat pejirandin û îlankirin. Di vê salê de gelek Konferens jî, hatin darxistin. Mîna “konferensa zimanê Kûrdî”, li Berlîn; “ Konferensa wêjeyaKurdî “ li Swêd, “Konferensa Dîroka Kurdî” li Lozanê. Di salek wusa de bo vê bîranînê weşana xebatek wusa, bi dîtina min him girîng û him jî, şerefek mezine.

Dîsa ez di vê bawariyê de me wê gelek kesên zana rexneyên xweyên li ser vê xebatê ji min re birêkin, li hêla din wê hîn gelek zimanzanên me li ser vê pîrsgirêkê berhemên giranbiha pêşkêşê me bikin û di pêvajoka zimanek yekgirtî de gavên mezin bavêjin.

**Fergîn Melîk**

## GUHERTINA ZIMAN PIRSGIRÊKA ZARAVAN

Zarav çî ye? Zanyar jê re çî divêjin? Piranîya zimanzanên cîhanê peyva Grêkî “dialektos” ê bi kar tîne. Ev tê wateya şêwa peyvînê, yan jî bi awayek, zarek din peyvandinê. Di Kurdî de peyva “ZARAVA” dihê bikaranîn, zar di devkiya Mukrî de tê wateya dev, di Kurmancî de jî, tê wateya şikl û şêweyek axaftinê wekî; “Lo zarê min meke.” Icar ev zarava parek ziman çî ye, zanyar çewa zelal dikin, yan jî têdigêhêjin?

Heidrun pelz (1) wusa tîne ziman: “ Zarava şêweyek taybetîya ziman e, di herêmek erdnîgarîyê de tê peyvîn û xwe bi formên taybetî di nav komaleya ziman de wek jubînek (yekaniyek) serbixwe dide xuyan; lê bi tevhevî jî, ji wê komaleya ziman naqete.” Mînak Kurdî komaleyek ziman e. Soranî jî, di nava vê komaleyê de bi hinek formên peyvan û rêzimanî ve (wek: bi forma pasîv, tewînek [Causus] bernav, nenasîna zayendê, hêla tewang, bernavên paşgînkirî ve ) wek jubînek serbixwe ye, lê bi tevhevî ji vê komaleyê naqete, ango zaravek komaleya zimanê Kurdî ye. mirov dikane ji bo zarava Kirdkî (Zaza), Kurmancî, Goranî û Sinê jî wusa bivêje, dive guhertin di hinekan de zêde û di hinekan de kêm be, ev rastîyê naguherîne. Dîsa di nava her zaravayê de devok henin. Mînak: Di nava zarava Kurmancî de devokên wek; Bazidî, Bahdinî, Hekarî û Botî hene. Dîsa di nav zarava Kirdkî de devokên wek: Dêrsimî, Sêwergî, Paloyî, Gimgimî hene. Di zimanê zanyariya ziman de ji devokan re “patoîs” tê gotin.

Guchmann pirsgerêkê bi vî awayî vedirêse (2) “Zarava devkîya terîtoryal e. Zimanê nivisandinê (netewî, wêjeyî) û

zaravên navçeyî cûda û guherbar in, her yek ji wan katagoriyek dîrokî ye.

M. D. Stepanova û I.I. çesnişeva (3) cûdatiya di navbera zimanê nivisandinê û zaravên navçeyî (herêmî) wusa şirove dikin:

“a-Zimanê wêjeyî ya netewî li hemberê zaravên navçeyî pêşveçûnek herî berztirînê wê zimanî ye. Zarava navçeyî bi mintiqek ve girêdayiye, lê zimanê wêjeyî ya netewî hemû xaka welat digire ber xwe û rêya hevtêkiliya her aliyê jiyana komaleyî ya wê komala ziman vedike.”

“b-Zarava navçeyî tenê hevtêkiliya komek an jî mintiqek tîne cîh ne ya giştî.” Ev nirxandin pêwistîya zimanek netewî rind zelal dike.

Bê devok û zaravan devokên Komên civakî jî henin Walter Porzig (4) li ser devkiyên koman wusa dinivîse: “ Mirov virastina (avahî, dezgeh) formên taybetî yên di nava komaleya zimanek de bi hêsanî divîne . zaf komên mirovan, ew kesên kû ji ber gelek egeran bi hev re di têkiliyek teng de dijîn, di pêvajoka vê jîyanê de peyvandinek taybetî diafirînin. Egerên wusa dikane devkiyên ziman yên komên civakî û zaravayên taybetî biafirîne. Belê yê kû komên civakî, yên di nav de formên taybetîyên ziman derdikeve, tim têkilîyên nava mirova ne.” Li ser pirsgirêka zaravan hîn gelek nirxandinên din hene, lê nirxandinên herî zelal ev nirxandinên jorîn in.

### **DÎTINÊN ZANYARAN LI SER GUHERTIN Û PÊŞVEÇÛNA ZIMAN**

Gelek sedem û egerên di guhertina ziman de rol dilîzin, bûyare û bûgînên hîkarîyê li ziman dikin hene. Gelek zanyar di vî barî de serê xwe êşandine û berhemên zanistî afirandine. Pirsgirêkên zaravên zimanên xwe ne bi tevhev jî be, di gelek xalan de çareserkirine û di warê guhertina ziman de gelek dîtinên bi bingeş û delîl pêşkêş kirine. Dîtinên zimanzanan li ser guhertina ziman ev in:

1- Hinek zimanzan divêjin ziman jî wek xweza yê li ser qanûnên xwezagorînê diçe, posîdeyê klîmayê, xebata li ser axê lê dibe.

Fîlolog August Schleicher(5) divêje: “ziman jî nola xwezagorînê pêşve diçe û diguhere... ziman wek organîzma xwezayê di rêça qanuna xwe de diçe û mirovan godarî nake.”

Max Müller (6) jî, wusa zelal dike: “ Ziman wekî xwezayê xwe bi xwe diguhere. posîdeyê klîmayê, xebata li ser axê, cîh û war di guhertina ziman de rolê mezin dilîzin”. Em ji zimanê xwe mînakên bidin. Îroj em li zimanê Bêrtiyan û mirovên me yên li çiyên dijîn û pez û dewar xwedî dikin dinêrin di zimanê wan de peyv (gotin) û têgînên(terîm) têkilî û pêdiviyên jiyana wan gelek pêş ve çûne. Yê rênçberan peyvên têkiliya rênçberiyê, yên li keviya deryan dijîn jî bi zêdeyî peyvên têkiliya bi avê re di zimanên wan de pêşve çûne.

2- Hinek zimanzan divêjin guhertin û pêşveçûna ziman bi jîyana polîtîk û civakî ve girêdayiye.

Nîkolaus Marr (7) waha dinivîsîne: “Ziman bi pêşveçûn û rewşa komeleyî ve tê guhertin.” bê vê ev dîtin jî heye: “ Ziman seranser bi çarçova polîtîk civakî ve girêdayiye.”(8) Dema ku em li dîroka xwe dinêrin, zimanê me di dema Mîrîtiyên serbixwe de gelek pêşve çûne, hozanên me yên bi navûdeng di vê demê de derketine, ji ber ku zimanê fermiyên van Mîrîtiyan Kurdî bûn; qanûn, perwerdeyî, dad bi kurtî her tişt bi devkiyek Kurdî bûn.

Dîsa em îroj dinêrin bi pêşveçûn û rapêrîna tekoşîna rizgariya netewî, zimanê me ketîye nava ronensans û pêşveçûnek herî mezin, Institutionên ziman tîn demezrandin, peyvên pêdiviyên, polîtîk, dadî, perwerdeyî, sosyalî bi kurtî her warê jiyana de peyvên pêdiviya mirovan pê hene tîn afirandin, yan jî, ji zaravên din tîn standin. Gelek zelal e ku ev rewş di pêşveçûn û guherandina ziman de gelek rolê mezin dilîze.

3-Di guhertina ziman de zimanên dagirkeran û serdestan rolek mezin dilîze.

D. Whitney (9) Li gel dîtinên xwe yên din, di vî barî de jî van gotinên jêrîn divêje; “Zimanên serdest û dagirkeran hîkarîyê li ziman dike û diguhrîne.” Bê vê dîtinek din jî wisa ye: “Posîdeyê şer, dagirtin û bazirganiyê li ziman dibe.” (10)

Em baş dizanin ji egerê Kurdistan li ser rêya hevirmeşê û bazirganîya sê kontîenta ye, tim bûye warê şer û dagirtinan. Ji Îskîtan bigire hetan Bîzansan gelek dagirker ketine Kurdistanê. Em bixwazin nexwazin posîdeya zimanên wan li zimanên me bûye, gelek peyvên Bîzansî û Kafkasî di zimanê me de hene, dîsa dengên şîdandiyên wek “t, k”\* ji zimanên Kafkasî ketîye nav zaravên bakur. Di Rojhelata - Navîn de zimanê serdest berê Somerî, Babîlonî dîv re Aramî û tipên wê wek ziman û nivisandina fermî hat pejirandin. Bi ola Îslamî re Ziman û tipên Erebî wek ziman û nivisandina fermî hat pejirandin. Îroj em li zimanên xwe dinêrin gelek peyv û tîgînên van zimanan di peyvandinê de dihê bikaranîn. Heta Elementên Tirkî jî, cîh bi cîh tê bikaranîn, li zimanê Maraş, Meleyê û Kurdên navenda Anatolê binêrin.

Mînak: 1

Kurmancî,

Di cîhê: “Eger ez bêm.” de “Ez bêm se” tê bikaranîn.

Di cîhê “hizirandin,” de duşunmişbe,

Di cîhê „nivisandin“ de yazmışke . divêjin.

Kirdkî

Di şûna “Heger ama.” de “ama se.”

Di şûna “wenden, werden” de “wendiş, werdiş” tê bikaranîn.

Mînak: 2

Em baş dizanin ku Awesta Zend bi tipên Aramî hatiye nivisandin û ev ABC ya Aramî bi sedan sala li Rojhelata - Navîn hatiye bikaranîn. Di ABC ya Aramî de tenê tipên lal

(Konsonant) hene, tipên bi deng bi alîkarîya zêr û zeberan (wek Erebî) yan jî, bi alîkarîya tipên lalê din dihatin çêkirin. Xwendina wê gelek zor bû. Ev di Erebî de jî wusa ye. ji ber vê

---

\* Di zaravên bakûr de varyantên şîdandiyên van tîpan hene, fermo li bêşa varyantên dangan binêre.

egerê îroj di zimanê me de gelek gotin li her navçekî bi awayek din tên peyvîn.

Kurmancî,  
mirov, murov, merû, meriv, merî  
nan, nîn, non, nên  
Kirdkî,  
merdek, mêrd, mordem.  
maraen, moren, mûren, omaren  
Di hemû zaravan de;  
e'rd, erd, ard, hord, herd, hard ûwd,

Em mînakek jî, ji ABC ya Aramî, lê bi tipên Latînî bidin.  
'm'h 'br yzd'n (Rekonstruktion) ;  
xwendina wê : Amaha (emah, ameh, emeh) ber (bar, bîr, bir)  
yêzdan (yazdan, yîzdan)

Mirov dikane bi sedan mînanan ji werêça Erebi ya li ser Kurdî bide, em li vir çend mînanan û dengên ketine fonetîka Kurdî bidin bes e;

a,  
adar azar  
hadir hazir  
mirad miraz

b,  
dengên ji ABC ya Erebi derbazî Kurdî bûne.  
e' h' u' (i')  
e'rd h'ecî U'mer  
E'lî h'eft i'sk

Ev deng di nav zaravên navîn û Dêrsim de tunene.

hard (herd) hecî nîne  
Olî heft wuşk (hişk)



Gelek zimanzanên bîyanî jî, vê rewşî dîtine û hûrkolane. Mîna Walter Porzîk (11) di vî barî de wusa dinivisîne: “Zanîna em dizanin, zimanê herî kevn di bazirganî û dîplomasîyê de bi navnetewî dihat bikaranîn Babîlonî bû; li pey wê zimanê samî Aramî di tevhevê Rojhelata-Navîn de cîhê xwe girt. Hima li dû wê di dema Aleksandrê Mezin de Grêkî cîh girt.”

G. Morgenstierne (12) jî waha dinivisîne; “Tevhevên zaravên biçûk yên li Îranê di bin werêça Farsî de fetisîne. Hîkarîya Farsî li zimanên serbixwe wek Kurdî Belocî û Paştî hetanî li zaravên Pamîrê jî bûye.”

F. Justî (13) li ser zarava Goranî zelalkirinek wisa tîne: “Di nav Kurdên Zagros de Goran ne koçer in, bi çandin, zevî û zîyan ve mijûl bûne; ango Kurdên nava şaristaniyê ne, zimanê wan bi werêça zimanê Farisî ya niviskî serketîye.”

Di şerefnamê de nirxandinek wusa heye; “Turkmenên Akkoyunlu dema ku Hekarî dagirtin serkarîya Hekarîyê da destê Eşîrên Dimilîya. (eşîrên Dêrsim ne Dimilî ne) Dimilî ji ola Êzidî zivirîbûn û bûbûn Mislîman.” (14) Li pey van veristinan mirov dikane hîkariya zimanên din jî bîne ber çavên xwe, wek Asamî, Kafkasî, Hermenî ûwd.

4- Dema ku êl û kesên bîyanî di nava komaleyek ziman de dihelin hîkarîyê li ziman dikin, ango di guhertina zimande rolek girîng dilîzin.

Meillet (15) vê pisgirêkê waha dinirxîne: “Dema ku kes an jî, komên bîyanî ji ber têkiliyên bi komaleyek ziman re, di nav wê komaleya ziman de dihelin, posîdê li ziman dikin.” Îroj baş tê zanîn ku netewên ji yek nijadek yan jî ji rîçalek tine, gelek kes û êl di nav neteweyê din de heliyane. Di nava gelê Kurd de jî gelek êl û kesên bîyanî heliyane û di guhertina zimanê me de rolên gelek girîng lîstine. Îroj di zimanê me de jiyana gelek peyv û formên Somerî, Lûvî, Hûrî, Hermenî, Kafkasî ûwd. vê rastiyê didin testîqirin.

çend mînak:

Lûvî(16)	Hûrî	Kurdî
anna (awna)	.....	evana, (vana, na, nê)
sarda (salda)	sawal	sal (sar)
zitî	.....	zîlam
.....	pitiq (k)	pitik (derguşa keçik)
.....	tuwa	tav,(tav, tîje)

Somerî (17)	Kurdî
tar	tarûmar kirin
car	car, çend car kirin
şî	jîn
zal (zalag)	zelal
gur (tije,pir)	gurr (liberhev, gelek zêde)
na	na
cin	çûn ûwd.

5- A) Ziman bi zêdeyî bi destên peyvkarên wê komaleya ziman ve tê guhertin. li ser vê mijarê zimanzan wusa dinivîsin:

W.D. Whitney (18); “ Bi posîdeya her peyvkarên komaleya ziman ziman diguhere.”

O. Jespersen (19) “ Gava ku zarok ji mezinan ziman fêrdibin, Lêvkirina (telafuza) ne rast, yan jî peyvane bi tevhevî lêvkin (telafuzkin), dengên di nava peyvê de bi cûrekî din anîna ziman, di tanga peyvê re dibe guhertinek ziman.... Mirov dikane gelek mînakên ji bo vê bide.

a- Peyvandina mirovên cîwan, pîr û kal ne yek in.

b- Gund bi gund ji yek bavek jî, ji hev qetyabin, peyvandin û devokên wan cûda ne. Dema ku em li gundên derûdora xwe mîzekin emê vê rewşê baş bîvin.

c- Gelek zarok tipên wek “r”, “d” ûwd. nikanin bi rastî telafuz bikin. Mînak di şûna “ roví” “luwî, luyî” dibêjin. Di

Kurmancî de “rovî”, di Kirdkî de “luyî” ma gelo tesaduf e?.  
 Dîsa gelek kesên li derdora Dêrikê û Amedê di cîhê “d” de “c”  
 bi kar tînin .

Mînak :

di cîhê “ dîya min “ de “cîya min” divêjin.

“Dîyarbekir “ de “Cîyarbekir” divêjin.

B-Peyvkar gelek caran peyvan (gotinan) kêr bi lêv dikin, ev  
 di pêvajoka sedsalan de cîh digire û dibe guhertin.

Walter Portzîk (20) wusa dinivisîne: “ Divêt em vê baş  
 zanibin, hemû guhertin di serî de kêr axaftine, yan jî,  
 lêvkirinek (telafuzek) ne temam e û ev wusa dikudîne ta ku hat  
 pejirandin û di ziman de cîh girt..”

Jean Aitchison (21) jî bi vî awayî zelal dike: “Guhertin tim  
 di gotinên tê bikaranîn de dest pê dike. carcaran peyvek bi  
 awayek din tê telafuzkirin û li pey dibe guhertin.” Em mînakan  
 ji zimanê xwe bidin:

Awesta	Kurmancî	Kirdkî	Soranî
xw (wh)	xw	w, x	xw, x
	xwendî	wendî	xwendî
	xwe	xo	xo
	xweş	weş	xoş û hwd.

Ma gelo ev ne berhemên kêr axaftinê ne?

Kurmancî	Kirdkî
firotin	roten
jimartin	maren (omaren Palo)
rêstin (ristin)	virastin

Dîsa: di Kurmancî de

waha = aha

wenda = anda (Dep)

û hîn bi sedan peyvên din.

6-Bi awayek nerm, nazik û formek ne dîrekt peyvîn jî di guhertina ziman de rolên mezin dilîzin.

W. Havers (22) di vî barî de vê zelalkirinê tîne: “ Hewldana tiştek bi zelalî anîna ziman, bi lêvkirinek bihêz û werêça dijî wê, têkilîyên nav mirovan ; nazikî, rûmetî, nermî, hevparêzî û bi awayek camêrî peyvînê dixwaze. Ev jî, peyvîn û zimanek ne dîrek, di dora mijarê re zivirandinê dixwaze û ev div re dibin guhertin.”

Mirov dikane gelek mînakên ji bo vê bide. Gelek gotinên nedîrek hene.

Mînak:

Di cîhê	“nikanne” de	“xam e”
	“nizane”	“xerîbiyan dike”
	“mir “	“çû rehmetê” (heqîya xwe hat)
	“dîn “	“bi cinah dikeve” (nexweşe)
	“jina te”	“bermalîya te (pîreka te)
	“avise”	“bi zarok e” (bi hemle)

û hîn gelek axaftinên wusa hene.

7-Mirovên me dibe ji tesîra Tirkan be, ji virastina feodalî be, yan jî karekterek Rojhilata - Navîn be; bo ku xwe zana û mezin nîşan bidin, gelek gotinên yan jî bi zimanê wan kesan “lûgatên” biyanî bi kar tînin. Ango kes û civatên din li jor û mezin, lê xwe û gelên xwe biçûk divînin. Ev rewş di pêvajoka sedsalan de hîkarîyê li ziman dike û ji guhertinê re dibe eger. Bê vê di cîhên gotinên komeleya zimanê xwe de gotinên bîyanî bi kar tînin, di pêvajoka sedsalan de ev gotinên biyanî cîhê gotinên wê zimanî digirin û dibin guhertin. Demak em li klasîkên Kurdî dinêrin nîv nîv peyvên bîyanî ne.

K. Fuat (23) di vî barî de wusa dinivîsîne: “ Ji ber di nava mîrîtîyan de parçebûna Kurdistanê û her mîrîtîye bi serkarîyek Dynastîyê Rojhelata - Navîn ve girêdayî bû. Posîdeyek gelek

negatîv li zimanê Kurdî yê wêjeyî kiriye.”

Dîsa tu li şêxan û seyîdan dinêrî yan “ewladê Resul in” an jî “tovên Ehmed Yesevî” ne ev kes jî, di ziman de rolên mezin dilîzin.

8- Di pêvajoka sedsalan de hinek tejên (hêce) peyvan wenda dibin, wateya peyvan diguherin, fire yan jî teng dibin, yan jî di wateyên din de tên bikaranîn. Û ev jî di ziman de dibin guhertin.

Zimanzanê Amêrîkan Edward Sapir vê mijarê wusa dinirxîne: “Hinek parên peyvan tên ji bîrkin, yan jî wenda dibin.” (24)

Mînak: 1

Li deverên Mûşê “daketin” tê wateya cîh girtin runiştin, kur ve çûnê

Li Meletyê, Sarizê “daketin “ tê wateya peyabûnê

Li Depê “qefilîn” tê wateya westan, ji qiduman ketinê.

Li deverên din “qefilîn” tê wateya cemidin, serma lêgerîn, qutifînê

Mînak : 2

Kirdkî	Kurmancî
vesayen	sojin, sotin
êra / era	xwe ra
kişt	teniş
kose	kosegelî
lêr kerdên	glêr kirin
(he) misnayan	hevîsandin (m = v)
romerdayen	ramedyan

9- Têkiliyên olî, aborî û siyasiyên bi gelên cînar û din re jî di guhertin û pêşveçûna ziman de rolên gelek fire dilîzin. Wekî navên mirovan têgînên têkiliyên saziyên aborî, sîyasî û olî yên nû; têgînên diplomasiyê û berhemên nû ûwd.

Mînak :

Li pey pejirandina ola Îslamî, tevhevên navên Kurdî, bi gotinek din navên zerdeştî wek navên kafiran hatin hesabandin û di cîhên wan de navên Erebi li mirovên Kurd kirin. Mînak:

Navên têkilîyên ola zerdeştî wek: Kuraş, Zendiq, Pîr, Hurmuz, Homa, Ehrîman ûwd. hatin avêtin di şûna wan de

Navên Erebi wekî: Murşid, hafiz, şêx, Allah, Heq, şeytan û hwd. hatin danîn. Bê van gelek mezheb jî ketin nav Kurdan, vê rewşê di ziman de rolên negatîv lîstin.

10- Ji ber egera cîh guhertin, Koçbarî û ji welat derxistinê, bi gel yan jî, êlatên [eşîrên] cîgeh re têkilîyên nû tên danîn, ev têkilîyên nû jî di guhertina ziman de rolên mezin dileyîzin. Îroj gelek Kurdên Dêrsim divêjin; “Em ji Horasan in”. Kurdên bi destên Sasanîyan ji welat hatibûn derxistin, Koçbarê Horasan bûbûn, û hinek ji wan dû re şûn ve hatin. Bi têkilîya xwe ya bi zimanê Êranîya Rojhelat ve di binê werêça wan de mane.

Mînak:

Dêrsim	Paştî (25)
vas	vasa
simar	sumara
çim , çiko (tziko)	çim (tzim) (26)

E. Xemgîn di vî barî de wusa dinivîse: “Kurdên Gor yên di navbera Meve Ferqîn û başura derya Kaspînê de dijîn û li hember dagirkerîya Sasaniyan derdiketin di dema V. Bahrem di sedsala 6. paş mîladê de bo kû serhildanên gelê Kurd birûxîne û wan li hember êrişên Hunan bi kar bîne bi kotekê dan koçbarkirin û şandin Xorasanê.” (27)

Bê van veristin û zelalkirinan, dema ku em dîroka Kurdistan bînin ber çavên xwe, emê bivînin ku koçbarî û malkambaxîya

bi destên dagirkeran hatîkirin, şerên nava êlat û eşîrên Kurd, gelê me tim ji cîh û warên xwe kiriye. Ji bakûr ber bi başur, ji rojhelat ber bi rojava û vacîyê wan bar kirine. Ji ber êrişkar û

dagirkeran kişiyane çîyan û geliyan; di wur de warek nû avakirine, zimanên xwe jî, pê re pêş ve birine û nû kirine. Em çend mînakên bidin.

a-Ela “Lolan” li Erzingan, Dêrsim, Koçgirî û Gimgimê ne, lê li Kurdistana başûr bi navê wan û navên gundên wan, gund û mintiqe hene.

b-“Êlatên “Alan” li Dêrsim, Wan, Hekarî û Loristanê hene zaravên mintiqên xwe dipeyîvin. (bi Kurmancî, Kirdkî, û feylî dipeyîvin.)

c-Eşîra “Balan” him li Samsûrê (Adiyaman) û him jî li Dêrsimê hene; yên Samsûrê Kurmancî, yên Dêrsimê Kirdkî dipeyîvin.

Bê van gelek eşîrên din hene bi herdû zaravên bakûr dipeyîvin. wek: Îzolan, Xiranîyan, Kumsoran, Karsanan ûwd.

Bêrê bi sedan Mîrîtî hebûn, Heryek bi sedan sal li ser herêmek welat serkarî kiriye. (li “Şerefnama” Şerefxanê Betlîsî, Diroka E. Xemgîn, Cîgerxwîn û yên din binêrin.) Van mîrana di koşk û bircên xwe de; xwediyên Mele, Dengbêj, çîrokbêj, Hostan, şivanan, sekvanan ûwd. bûn. Qanûnên wek dilên xwe çêdikirin, zarav yan jî, devokên mintiqa xwe dikirin zimanê fermîyên mîrîtiya xwe û ji guhertina ziman re dibûn eger.

## **DI DÎROKÊ DE ZARAVÊN KOMA ÊRANÎ Û DI NAV DE CÎHÊ KURDÎ**

Di koma zimanê Êranî de nivisara herî kevn nivisara Awesta bi devkîya GATA ye, û ji hivde helbestên Zerdeşt pêk hatîne.

Gelek nivisandin, yên ji tabletên din jî henin wek, Hurî, Luvî ûwd. hinek gotinên wan Kurdî digire (li mînakên di bin nivisa “guhertina ziman” binêrin), lê hîn bi zanyarîyek filologî û peyvzanîne li ser wan nehatîye xebitîn, ji wê ezê li

ser ranewestim tenê çend mînanan ji Hurî bidim.

HURÎ

*tal*

sawal

zuga

tapu (tabletên Pijandî)

pitiq

pir

tuwa

dala

KURDÎ

*tal (çêsta (tema) mêwe û*

*fêkîyên hîn negîştî)*

sal, sar

zirav, zar, zuha

tepink (rêxa li ser keviran û li

ber tavê hişk bûye.)

pitik (derguşa keçik)

pire, pird, pir

tav, taw, tîje

dar ûwd.

Bê van hinek nivisên du zaravên din jî hene; Awesta Yasna û nivisarên mixî yên Parsîya Kevn Prof Jensen (28) wusa tîne ziman:

“Em Êranî 1- ji nivisên mixîyên Parsîya Kevn ku zaravek rojava ye; 2-Awesta ya ku tîkîliyên xwe bi zaravên rojava re heye, bi Bextîyarîya kevn, yan jî bi devkiya jê re zend divêjin û bi tipên Aramî hatye nivisandin. Bê van ji nivisa herî kevn bi devkiya GATA 1000 sal berê mîladê hatîye nivisandin dinasin. Devkiyên Êranî yên din wek Medî, Skîtî tenê navên kes û cîgehan li pey xwe hîştine.”

Karl Hofmann di vî barî de vê zelaliyê tîne;(29) “Ji zaravên din wek Medî Skîtî û sewkiya kevn ya zaravên Sogdî, Sakî, Osetî û Pašto ku di dema Êranî ya navendî û Êranî ya nû de hatiye nasîn, belge û nivisên wer girîng tinene.”

Em dikanin çend mînanan bo cûdahîya bakûr û başûr bidin:

Zarava Bakûra Rojava (30)

Awesta

Athura

Muzraya (Misir)

fravaşînam

Zarava Başûra rojava

Parsîya Kevn

Asura

Mudraya (Misir)

farvardîn



Medî  
vamerk

abemarg

**Cîh û warên van zaravan:**

Li ser cîh û warên ku ev zarav hatine peyvîn gelek zimanzan li pey xebatên xwe yên lê û hûrkolînî pirsgirêkê wusa zelal dikin:

O Mann (31) “ Parsî ya kevn, bi rastî zaravek Farisî ya herî kevn e û mirov dikane bê şik wek zaravek Êranîya Başura Rojava binasê. Zarava ku Awesta pê hatiye nivisandin Zaravek bakûr e.”

Prf Jensen (32) “ Sakî ya navendî kû Leyman jê re Êranî ya bakur gotiye, bi hêla Luders û Konov ve wek zaravek rojhilat hatiye îspatkirin, Farisî ya navîn û Osetî ya navend ku wek navek barbarî di nivisandinên Grêkî yên Pontî de heye, rind tê xûyan ku digêhêje Alanan, Alan jî, digêhêjin Medan.”

Karl Hoffmann (33) “ Li hemberê Farsîya kevn û Medî cîgeha Awestayê ne zelal e..... Zimanê wê her çiqas wek zarava Êranî ya Bakura Rojava xûyake jî, ne bi tevhevî ew e; têkiliyên wê yên bi Êranî ya rojhilat ve jî, ne yekîtiyek genetîk e.”

W.B. Henning (34) “ Parsî ya navîn, Partî, Sogdî, Xwarezmî û Sakî Êranî ya Navîn in. Ji van Sogdî Xwarezmî û Sakî Êranî ya Rojhilat, Parsîya navîn û Partî Êranî ya Rojava ye. “ Li pey vê nirxandinê şemayek dide û vê zelalkirinê tîne.

“Êranîya Rojava ku bi piranî li Îranê ye, zimanê wan ji dema kevnarê vir de bûye du komik; 1- Zaravên wîlayetên Farsî ya Başur, Êranî ya Başura Rojava. 2- Li wîlayetên rojava û bakura - rojava jî, Êranî ya Bakur-Rojava.”

Vê şemaya jêrîn dide.

Koma ziman

Başura - Rojava

Bakura - Rojava

Dema kevn

Parsîya kevn

Medî û yên din.

300 - 700 paş Mîl. Parsî

Li pey vê mînakê wusa dinivisîne “...Partî zaravek hev cêwiya Medî ye. Ev di wîlayeta Axamanî - Partî ( bi Parsî ya kevn Partawa) de zaravek navçeyî bû.” Li pey van zelalkirin û nirxandinan em bi hesanî dikanin bivêjin; zimanên Medan, Partan û Alanan di zimanê Kurdî de bi giranî û bingehî dijî. Lewre zimanê Kurdî, bi hemû taybetî û avayiya xwe ve zaravek Êranî ya bakura rojava ye. Heta mirov dikane bivêje Êranî ya bakura rojava di Kurdî de karakterize bûye.

### ZIMANÊ ÊRANÎ YÊN NÛJEN Û DI NAV WAN DE CÎHÊ ZIMANÊ KURDÎ

Me çewa li jor dabû zelalkirin komên zimanê Êranî sisê ne, û îro jî, her yek di çend zimanan de dijîn. Di vî barî de gelek nirxandin û lêkolîn hene, nirxandina Prof Jensen ya herî zelal e.

Prf Hans Jensen (35) li ser ziman û zaravên Êranî ya nû vê zelalkirinê tîne :

“ Zimanê Êranîyên nû yan jî zaravên Êranî yên nû ev in : Li rojhelat zarava Pamîr ya ku nêzê Sakî ya navîn e û Afganî (Pašto), li rûbarê wê Soxdî ya nû yan jî Yaxnobî û li Kafkasyê Osetî ya nû, zaravên Kaspîni yên modern û zaravên navendî yên nêzê Partî ya navîn, Belocî jî digêhêje vi ra, dîsa Kurdî ya li aliyek jî, zarava Êranî ya Bakûr e. Farsiya nû ya kû li ser hîmê Parsiya navîna başura - rojava pêk hatiye û hîkariya zaravên bakûr jî lê heye.” Em bi kurtî dikanin wusa rêz bikin:

- 1- Êranî ya Rojhilat
  - a- Zaravên Pamîr
  - b- Pašto (Afganî)
  - c- Soxdî (Yaxnobî)
- 2- Êranîya Bakûra - Rojava
  - a- Osetî

- b- Belocî
  - c- Zaravên Kaspînî (Talî, Azerî )
  - d- Kurdî
- 3- Êranîya Başura - Rojava
- a- Farisî û zaravên wê.

Li ser Êraniya Rojhilat û Êraniya Başura - Rojava zêde spekulasyon nayên kirin, lewrê Faris, Afgan û Tacîk dewlet in, him di rêya yekîtiya zimanên xwe de gelek gavên mezin avêtine û him jî dikanîn pêş li spekulasyonên têzên xwendewanên zanîngehên zimanasî, yê bo diplomana li ser her bendî dilîzin bigirin. Spekulasyonên li ser Êranî ya Bakura Rojava gelek in, li ser Kurdî û zaravên Kurdî hîn zêdetir in. Dijmin jî van spekulasyonan ji bo berjêwendên xwe bikartîne. Egerên vê yê herî mezin nebûna Kurdistanek serbixwe ye. Lê dîsa jî hinek zimanzan, bi kêmasî be jî rastiyan divînin û gotinên xwe bi pîvan divêjin û dinivîsin. Mînak:

G. Morgenstierne (36) di vî barî de wusa dinivîsîne; “Zanîna me ya li ser zimanên Êranî yê nû gelek kêr û ne zelal in. Ji wê em nikanin klasîfikationek zanyariya bersîvek têr dide bikin.”

Pierre Lecoq (37) jî wisa dide der; “Pir çetîne ku van pîvana me têr bikin, da kû em bivêjin komikê rojavayê Êranê hevdû digire û ji ya Kîrmanî (Kurdî) û Farisî cihê dibe. Gelek cûdabûn di nav zaravan de hene, em nikanin bi temamî yekîtiyek wana kevn ya zimanasî derxînin.”

Bi dîtina min ev herdû gotin rind dide xûyan û li ser nêrînên din zêde rawestan ne pêwîst e ji ber ku:

a- Ji zimanzanên bîyanî hima bigire tûkes ji wan zaravan û devkiyên nav zaravan nizanin.

b- çavkaniyên wan ne zanistî û ne jî bi bawar û belge ne.

c- Bo pîraniya wan tiştî herî giring pejirandina têzê wanên bo dîplomên wan e. Ji wê tenê li ser hinek xalan radiwestin ; wek çend dengên fonetîkê, çend gotin û çend hevokan.

Li hember gelek tevlihevî û nezanîyan diisa em dikanin bi kêrî be jî çend druvên kû zimanê Kurdî ji zimanê Êranîyên

din diqetîne û pirsgirêkê hinek zelal dike, bînin ziman.

1-Cûdatiya Êranî ya Bakûra-rojava û Başura-rojava xwe baştirîn di cûdatiya mabeyna Farisî û Kurdî de dide xûyan.

Mînak

	<u>Farisî</u>	<u>Kurdî</u>
z	zen zîndegan	jin, cênî jîndar, bi can
d	damat danistan dana	zava, zama zanîn zana
b	ab ban şehrîban	av, aw van, wan şarîvan

v

Dengê “v” di Farisî de tune.

2- a) Ji posîdeya zimanên Kafkasî di zaravên Kurdî yê bakur de wek Osetî dengên şidandiyên ser lêvî wek “p”, “t”, “k” pêk hatine. Ev di zaravên Bakura-rojavayên din de nînin.

G. Morgenstierne (38) li ser vê mijarê wusa dinivisîne : “Osetî û hinek zaravayên Kurdî yê bakûr, tîpên bêdengên şidandî di zimanên xwe de pêk anîne . Wek : “t”, “k” “

b) Di Kurdî de “b” û “v, w” tim vediguhezînin (cîh diguherin), ev di zaravên Êranîyên din de ne wusa ne.

Mînak :

<u>Kurmancî</u>	<u>Kirdkî</u>	<u>Soranî</u>
dibe = dive	bî = vî	dibe = diwe
bibêje = bivêje	baran = varan	bab = baw

dibînim =divînim  
bavo = babo ûwd.

G. Morgenstjerne (39) wiha tîne ziman : “ Di Kurdî de “b”  
û “v” dikevin navhev.

c) Dengên dema Awestayê bi tevhevî neguherîne, ji hîkarîya  
ABC ya Aramî û Erebi di zaravan de tevlihev bûne.

Mînak:

<u>Awesta</u>	<u>Kurmancî</u>	<u>Kirdkî</u>	<u>Sine</u>
thr hr, r	hr, r		
Putre	Pito, Kur, pis	pito	kur
pathana	pehîn	hîrê	
m v , m (kêm)	m, w (kêm)		
	gav	game	hengaw
	zivistan	zimistan	zistan
	ziman	ziwan	ziman
	emsal	.....	.....
	iro	ewro	emro
xw (hw)			
	xwe (xa,xo)	xo (ho)	xo
	xwarin	werden	xwarden.

3-Di Kurdî de zayend hene, di piranîya zimanên Êranî de  
wenda bûne. G. Morgenstjerne (40) wusa dinivîse ; “Bê çend  
zaravan zayend di zimanê Êranîyên din de wenda bûne.”

Pierre Lecoq (41) jî wiha zelal dike “Lê baş e em bizanin kû  
ew zaravên Kurdî yên bakûr de maye, lê di yên başur de wenda  
bûne.”

Mînak:

<u>Kurmancî</u>	<u>Kirdkî</u>
nêr	
mêr-ê min	mêrd-ê (mordem-ê) mi
mê	
jin-a min	cenî-ya mi

n  
mêrekî Kurd                      mordemêdî (kî) Kirmanc

m  
jinekê Kurd                      yew cenîkê Kirmanc (cênîyêde)

4-Di Kurdî de du sîstemên tewîneka bernavên kesanî hene, di piranîya zimanên Êranîyên din de tune. Ev sîstem di zaravên Kurdî yên başur de jî wenda bûne.

Mînak :

<u>Kurmancî</u>	<u>Kirdkî</u>	<u>Zaravayên Başur</u>
radêr		
ez, tu, ew	ez, ti, o, a	.....
em, hûn, ew	ma, şima, ê	.....
tewangî		
min, te, wê, wî	mi, to, ê, ayê	êmin, êto, ew
me, we, wan	ma, şima, îna	ême, êwe, êwan.

5-Di Kurdî de berê nav dû re attrîbût (nav + rengdêr û temamkar) tê, ango attrîbût le pey nav tê. Ev di zaravên Êranîyên Bakurên din de wisa nîne; vacîyê vê ye. Yanê berê attrîbût duv re nav tê.

Pierre Lecoq (42) di xebata xwe de (yak Mamo Cumî wergerandiye Kurdî) li pey zelalkirina vê mijarê şemayek wusa dide.

A:  
Mene pîta                      mo pîyê                      = Semnanî

Hece mene pît                      çimê pîyê                      = Taleşî

Mene heyê pîta                      menî piss                      = Belocî

B:  
Pîta mene

pîta heyê mene                      pîderê min                      = Farsî

bavê, pîyê min = Kurdî

pîta hece mene

Ev rewş di bikaranîna rengdêr û temamkarên (danasîn) din de jî wusa ye. Bi rastî ev dezgehê di warê viraştinê de zimanê Êranî dike du par.

6-Tenê zimanê Kurdî di kestîya sisyan de bikaranîna bernavek kevn parastîye.

<u>Kurmancî</u>	<u>Kirdkî</u>	<u>Soranî</u>	<u>Goranî</u>
jê	ci (cê)	.....	ce
Min jê re anî.	Mi ci ra ard.	Boy hêna.	.....
ê	dey	dey	.....
Min gotê	Mi dey ra va.	dey wut, dey got.	

Pierre Lecoq (43) vê wusa veristiye : “Hima zazakî (Kirdkî) di bernava sisyanê yewmarî (tekanî) de jenîtîvek (bernavê) ,, cey,, parastiye, ev jî ji ,,hece , eveheye,, derketiye. Va forma bi du aliyan ve girînge ; yek, ev nîşan dide kû zazakî forma mîna zaravên din parastîye, du, ev dihêle em bivêjin zazakî zaravek ji para ,,B,, ye.”

7-Di piraniya zaravên Kurdî de hokera kevn “heda” bûye “de, di, ti, e, a, ye”. Zimanên din vê nanasin an jî formên din pêk anîne. Hinek jî ji tesîra Farisî “mi” bi kar tînin.

<u>Kurmancî</u>	<u>Kirdkî (44)</u>	<u>Sine</u>
divêjim	vana (êvajan Sw)	êjim
têm(dihêm, êm)	yênan(ayênan Sw)	êçim
disojim	aveşnena (Sw)	
Tu çêdikî	ti yê virajena (Sw)	

Soranî  
yêjim  
dellên  
eyt/ deyt

Bextîyarî  
(ê) îxom  
eyêm /îyêm  
estom

Di Kurmancî de jî gelek caran li hinek deveran ev hokera bûye pêşgir, nayê bikaranîn.

Botan:  
ez êm , tu êy, ew ê.  
em ên, hûn ên, ew ên.

Li deverên din:  
Ez zanim. Ez kenim.  
Ez kanim. Ez xwazim.

8-Tenê di Kurdî de partizipa dema borî ya di druvê forma pasîv (Perfect-partizip-passiv) de heye. Di zaravên Êranîyên din de wenda bûye.

G. Morgenstierne (45) vê mijarê wusa zelal dike ; “Di zaravên Kurmancî, Zaza û Goranî de dema boriya lêkerên derbazî virastinek jê re pasîv tê gotin, bi zêdeyî wek „ mihi factum,, yan jî „a me factum,, bi dewlemendî parastîye. “

Mînak:  
Kurmancî : Wî ez dîtîm = Ez bi hêla wî ve hatim dîtîm.  
Wan em dîtîm.

Kirdkî : O ez dîyo.  
Îna ma dîmê. (dîn)

9- Di Kurdî de lêkerên têneper (intransitiv) û têper (transitiv, rawirî) di dema borî de ji ber hebûna du tewînekên bernavan cûda cûda tê lêparîn (kişandin). Ev di zimanên Êranîyên din de tune.



Mînak:

Intransîtîv	dema nika	dema borî
Kurmancî	Ez têm	Ez hatim
Kirdkî	Ez yêna (n)	Ez ama
Z. Başur	êmin deçem	êmin çom

Transitiv

Kurmancî	Ez divêjim	Min got
Kirdkî	Ez vana (vajan)	Mi va , vato (Palo)
Z. Başur	“min êjim / dellêm	“min wut , got

Belê çuqas cûdatî di navbera Kurdî û zaravên Êraniyên din de hebin jî dîsa gelek xal û forman de digêhêjin hev. Mîna di peyvên, dangan, formên rêzimanî ûwd.

**ZARAVÊN KURDÎ WEKHEVÎ Û  
CUDATIYÊN WAN**

## A - DENGZANIST (FONETÎK)

Li ser fonetîka Kurdî hinek xebat û lêkolîn henE, mîna xebata Mîr Celadet Bedirxan , Qanatê Kurdo û hwd. Lê hîn jî nehatine zelalkirin. Ez jî dixwazim çend gotinan li ser fonetîka Kurdî bivêjim. Di hemû zimanê cîhanê de veguestina (cîh guhertina) tipan ango dengan heye . Di Kurdî de jî, ji egerê tîpên bîyanî, hîkarîya zimanên dagirkeran û hwd. veguestina dengan him di nav zaravek de û him jî, di navbera zaravan de bi giranî heye. Divêt ev velîstin bi kêmî be jî, were zelal kirin.

Hima bigire di hemû zaravan de deng yek in. bê çend dengên ji tesîra zimanên bîyanî ketiye zimanê me.

### a- Tipên Kurdî

Tîp	Kurmancî	Kirdkî	Soranî
A - a	av	aw	aw
B - b	ban	bon	ban
C - c	canbaz	canbaz	cuanbaz
Ç - ç	çar	çuar	çuar
	çem	çem	çem
D - d	debar	debari	deçê
E - e	ez (ew)	ez (o,a)	ew
Ê - ê	pêr	pê	cêge
F - f	fêm /fam	fame	def
G - g	gul	gul	gul
H - h	her roj	her roz	hecê

I - i	çi	çi	çi
Î - î	îdî	îndî	hîç
J - j	jan	jan	jan, jîyan
K - k	kal	kal	koke
L - l	law	law	lak
	lawik	lajek	
M - m	mal	male	mal
N - n	nan	non	nan
O - o	jor	cor	cor
P - p	pirs	pers	pers
Q - q	qul	quli	qulapî masî
R - r	rê	rayîr	ray
S - s	seranser	seraser	sereta
ş	şev	şewe	şewe
T - t	tirs	ters	ters / tirs
U - u	Kurd	Kurd	Kurd
Û - û	bûyîn / bûn	bûyen	bûyîn
V - v	varik	varike	..... nîne
W - w	war	ware	ewan
X - x	Xemilandin	xemilnayen	xemilayen
Y - y	yek	yew / jû	yek
Z - z	zanîn	zanayen	zanîn
XW - xw	xwe (xa / xo)	xwi ( xo, ho)	xo, xwend

### **DENGZANISTA RADENGÎ (FONETÎKA ARTÎKULATORÎ)**

Ev tê wateya cîhên dengyan jî, cîhên dengjê derdikeve. Aşkeraye kû hemû dengji dev derdikeve, di dev de jî, cîh û cîhên wek lêv didan pidî, asuman û qirikê derdikeve, di zimanê zanistî de peyva latînî "ARTIKULATOR" tê bikaranîn.

#### **I- Tipên Dengdêr**

Piranîya dengdêran bi alîkariya bayê ji pişikê tê û bi awayî şikilgirtina lêv û didanan rengê xwe digire.

1- Tipên dengdêrên dirêj;

“a”

Di Kurdî de ji bo derxistina tîpa “a” yê dev hindek tê vekirin, bayek nerm ji pişikê tê şikefta dev bi asumanê pašîn tê tandan (tehdan) û di nav lêvê re derdikeve û bi vî awayî tîpa “a” diafire.

“ê”

Demak lêv hêdî û nerm hat pankirin û bêhn di nav lêvan re hat berdan, ev denga derdikeve.

E. C. Bedirxan (46) di xebata xwe de bi fireyî li ser vê tîpê radiweste û wisa dinirxîne : “Eger peyvek bi „ê,, biqedê û paşgînek bi „y,, bigire xwe diguhezîne „e,, .”

Li Muş, Erzorom , Serhed, Dêrsimê û hinek zaravayan de xwe diguhezîne „î,, mînak:

dê = dîya min  
pê = pîyên min  
rê = rîya min

Gelek caran jî xwe naguhezîne, mînak:

Tu lawê kê yî ?

Ew li ber masê ye. ûwd.

“î”: Lêva jêr berjêr tê kişandin, bi asumanê hişkê bi ziman ve zeliqî bayê berjêr avêtinê ve ev deng tê derxistin. Hinek rikitiyên li ser vê tîpê wusa ne. Da “y” nîv deng e, dibêjin demak li pey tîpa “î” “y” were “î” xwe diguhezîne “i” lê ev di piratîka ziman, hêla pedegojîkî û zanistîyê de ne rast e. Mînak:

Tu kes ji	“mîyê” re navêje (nabêje)	“miyê”.
”	“sîyê”	“siyê”
”	“bêriyê”	“bêriyê”
”	“nêriyê”	“nêriyê”
”		
ûwd.		

“o” :Bi, jî şikefta dev ba di nava lêvên giloverkirî û hinek

vekirî de derxistinê ve ev deng derdikeve.

“û”: Lêv tê giloverkirin lê nayê vekirin, di ber didanan de ba bi zik tê tandan û ev deng tê derxistin.

2- Tipên dengdêrên Kurt,

“e”: Dev wek dengê “a” kêr tê vekirin û bi çenê hinek berjêr kişandinê ve, ev deng tê derxistin.

“i” : Didan tîn ser hev, lêv nayên leqandin, bi zik ba tê tandan û li pey vê livbaziye ev deng derdikeve.

“u”: Lêv bigire hima wekî dengê “o” pêş û berjor ve tê tandan , alikarî ji asuman tê girtin, bi wî awayî ev deng tê derxistin. Ev deng dengê di navbera “î, i, î, w “ de ye.

## II - Tîpên Lal (bêdeng)

	Fîtikî bê / bi	Lêgerî bê / bi	pozî û /layê re / fijiqî	nîv dengdêr
Lêvî	p b			w
lêv û didanî		v f		
didanî	t d	z		
pidî pêş paş	c ç		n l r	
Ezmanê hişk	k	ş s j		
E. nerm	g	q		y
zimanê piçûk				
qirikî			x h	

Latînî ya van Têgînan:  
bîlabial = lêvî

labio-dental	= lêv û didanî (lêvedidan)
dental	= didanî
alveolar	= paşpidî
prûpaletal	= pêş asumanî hişk
paletal	= asumanê hişk û paş asumanê hişk
velar	= asumanê nerm
uvular	= zimanê piçûk
pharyngal	= qirikî
plosive	= fîtikî, (bi bayê fîtikê)
frikative	= lêgerî
laterale	= ber tişteke re, layê re.
vibrantin	= fijiqî

Em nika jî van dengên lal fer bi fer ber çav re derbazkin.

#### Fîtikî (Plosive)

“b”: Tîpek lêvî û bi fîtik yan jî fîtikî ye.

“p”: Tîpek lêvî le bê fîtikî ye. Varyanta wê ya nîv fîtikî jî heye û nerm e.

“d”: Tîpek didanî û bi fîtik e.

“t”: Tîpek didanî lê bê fîtik e. Varyantek wê ya nerm û nîv fîtikî jî heye.

“ç”: Dengê paş pidî, şidandî û bi fîtik e. Di Kurdî de du varyantên vê dengê heye. 1- Vekirî û nîv fîtikî ye. 2- Di mabeyna pidî, didan û pozê ziman de dengê hîn hişkîrîn e. (li mintiqaya Dêrsim : çayê = tsayê).

“c”: Dengê paş pidî û bê fîtik e.

“g”: Dengê asumanê nerm û bi fîtik e.

“k”: Dengê paş asumanê hişk şidandî û bi fîtik e. Varyantek vêya pêş asumanê nerm heye û nîvfîtikî ye. Di çend gotinên Kurmancî de pirsgirêk çêke jî, ne girîng e.

#### Lêgerî (Frikativ)

“f”: Dengê lêv û didanî ye, didanê jor li ser lêva jêr tê şidandin, ba di nav de tê gerandin, bi vê awayî ev deng derdikeve. yanî tîpek lêgerî ye.

“v”: Dengek lêv û didanî ye; lêva jêr tê ber didanên jor û ev deng derdikeve yanî tîpek bê lêgerî ye.

“s”: Tîpek paşpidî û lêgerî ye.

“z”: Tîpek paşpidî lê bê lêgerî ye.

“j”: Dengek asumanê hişkê pêş û lêgerî ye.

“ş”: Dengek asumanê hişk paş lê bê lêgerî ye.

“x”: Dengek asumanê nerm û lêgerî ye.

“q”: Dengek asumanê nermê pêş (nîv hişk) û bê lêgerî ye.

“h”: Dengek qirikê û bê lêgerî ye.

Pozî û layê re fijiqî

“n”: Dengek paş pidî û pozî ye.

“L”: Dengek di navbera didanî û paş pidî ye, layê re difijiqe. Varyantek wê di zaravên başur de heye, di awayek dengê didanî û şidandî de ye.

Mînak : dellêm.

“r”: Dengek paş pidî û gilorkirîyê fijiqî ye.

Nîv dengdêr

“w”: Dengek lêvî û glover e.

“y”: Dengek asumanê hişkê paşîn e.

## VARYANTÊN TÎPAN (DENGAN)

Du cure varyantên foneman tîp zanîn : Ya yekemîn varyanta Kombînekirî (bi cîhê derketina dengan ve girêdayî). Ya duwemîn varyanta fakultativ (bikaranîna serbestî)

### Varyanta Kombînekirî,

Ev di zimanê Almanî, Îngîlîzî û Fransîzî de gelek eşkere ye. Mînak:

Tîpa “c” li pêş tîpên dengdêrên nerm wek “s” , li ber tîpên dengdêrên qalind jî, wek “k” dihê telafuzkirin. Dîsa di Almanî de dudenga (dîftonga) “ch” li pêş tîpên dengdêrên nerm wek “ş” , li ber tîpên dengdêrên qalind jî wek “x” dihê xwendin.

Mînak:



Bach = bax

mich = mîş

Fransî de

Clair , chrêtien

car, cou col

Buch = bux

dîch = dîş

Di Kurdî de jî, tîpên “k” , “x”, “t” û “ç” li ser vê mêlê ne, lê hîna di zimanê nivisandinê de runeniştiye. Bi rastî jî varyantên Artikulator in, ne yên nivisandinê ne û li nola dengên qalind û nerm rola varîyanta Kombinekirî nalîzin.

### **A) Di Kurdî de varyantên dengen**

“ç”

1- Paş pidiya, nerm hima bigire wek “ç” ya Tirkî ye.  
çel, çar, çend , çawa ûwd.

2-Dengek paş pidiyê şidandî ye.

çem = ç'em

çav = ç'av

çim = ç'im

çêlik = ç'êlik ûwd.

3- Me çawa ku di pêş de jî gotibû, ev deng di devokê Dêrsim de bi awayek din dihê bikaranîn, mînak :

“çayê berbena “ = “tsayê berbena”

Peyva “se” ku di cîhê “çi û çawa” de dihê bikaranîn, ji “çi” (tse) yê afirîye.

Mînak :

Namê to çiko? (tsiko)

=Navê te çi ye?

sinîna ? (çiturya)

=çewanî?

Se kena?

=çi dikî?

“j”

1- Di navbera “j” û “c” de

a,

ji mal (Kurmancî)

ce dilî Îsfahan (Goranî)

b,

jê re anî (Kurmancî)

ci ra ard (Kirdkî)  
Jin (Kurmancî)  
cinî (Kirdkî)  
2- Di navbera “j” û “z” de  
ez jî (Kurmancî)  
ez zî (Kirdkî)

“k”

Bi rastî dema ku mirov bi zanistî li ser vê tipê raweste , gelek bi hesanî têdigêje ku her çuqas di pir gotinan di rewşa varyantê tîpek de be jî, di hinek peyvan de gelek ji hev dûr e. Ev ji vê tê dengê ji ezmanê hişkê paşîn ya din jî, ji ezmanê nerm derdikeve.

1-di awaya varyantê de :

kanî = Kehnî

kar

a) dema mê be =Kara bizinê (gîska virnî)  
b) dema nêr be =Karê bizinê çilo xwarine, (girwe, îş)

kêr

a) dema mê be =Kêra pola, (çaki, xinçer)  
b) awayê hokerî de =Ez kêrê vî karî têm.

ket

a) bê zayend be =Lêker e , ew ket.  
b) bi zayend =Keta mêrgê, cureyek gîha ye.

2-Ji varyantê dûr ketî, (tenê di zaravê Kurmancî de zehmetiya wê heye), divêt ev di ziman de bi zelalî ji hev bîn cûdakirin. Ev cûdakirin dibe bi du tipên dengdêr yan jî bi alîkarîya tîpa “h” yê bêt zelalkirin. Di hemû zimanên cîhanê de ev rewş hene, lê çareser bûne.

Ker

a) çarpê, her ( herê boz, kera nêr, manker)

b) mirovên (însanên) nabîhîsin.

mirovê ker:

a) mirovek bêhiş e û fêmkor e.

b) mirovek nabîhîse.

“L”

Tenê di zaravên başur de du varyantên vê dengê heye.

a) Dengê normal

b) dengê di navbera “d” û “L” de ye.

Mînak:

dellêm

rolle ûwd.

“p”

Ev tîp jî bi du varyantan dihê bikaranîn.

a) nerm

par

a). Di wateya maf de ( para te çend bizin ket, te para xwe girt.)

b) Hoker (par tu li ku bûyî.)

“r”

Bi rastî mirov nikane wek varyant binirxîne, tenê pîrsgirêkek nivisandinê ye. Sererast kirin gelek hesan e.

Mînak:

birîn = kul, cîhê ku hatiye birîn û xwîn jê tê, dirvêt. ( nerm e, û li ser zimane. Mirov dikane wisa jî binivisîne: Brîn

birîn = tiştê ji rayê wê, ji tevheviyê, bi birekê birîn. (hişk e, û dubarkiriyê) Mirov dikane wusa sererast bike:

birîn = kul

birrîn = jêkirin.

“t”

Du varyantên vê tîpê hene, li pêş û dinava peyvê de.

Tevir ( şidandiye)

tê ( „ )

divêt (nerme)

### **B) Varyantên fakultativ (bikaranîna serbest)**

Dive ji hîkarîya zimanê dagirkeran bî, yan jî tunebûna zimanek yekgirtiyê bilind bî, li gelek deverên Kurdistanê, cure cure varyantên fakultativ tî bikaranîn. Lê ezê tenê çend varyantên girîng wek mînak bidim.

“e” Ji posîdeyê ziman û Abc ya Erebî, du varyantên wê derketîye pêş me. Yek varyanta Kurdî, ya duwêmin varyanta ji hîkarîya Erebî.

1- Varyanta Kurdî

Ez, ew, em, erê û hwd.

2- Varyanta ji hîkarîya Erebî

ewr (e'wr)

erd (e'rd)

eyamî (e'yamî) ûwd.

3- Li deverên Torê û Meletyê di awayek “a” yan jî “ë” tî bi lêvkinin . Mirov dikane vê jî wek varyantek “e” binirxîne.

Torî

Feqîyê Teyra idî kal a (e).

Newal bi dar a (e).

Meletî

ma (me)

xa (xwe) ûwd.

“h”: Ji posîdeyê zimanê Erebî du variantên vê tîpê jî derketîye pêş me.

1- Varyanta Kurdî

hes, hebûn, hatin, hîrê, hilo ûwd.

2- Varyantê ji tesîra Erebî,

Gotinên Bîyanî

Hecî (H'ecî)

Hesen (H'esen)

Helîm (H'elîm)

Gotinên Kurdî

heft (h'eft)

heyşt (h'eyşt)

hezar (h'ezar) ûwd.

“x”: Bi kêmî jî be varyantek vê tipê ya serbest heye.

Varyanta Kurdî

xanî, xew, xav

Varyanta Din,

baxçe (bax'çe)

axa (ax'a) ûwd.

“u”

gul = gwil

bûk = bewîk (veyvik) ! ûwd.

### TEKILIYÊN TÎPAN

Ji hêla artîkulatorî ve tîpên cîhên derketina wan cûda, lê bi hev re di tîkiliyek nêz de ne.

1- “b, p, v, w, m” ev tîp gelek caran di cîhên hevdu de tîp bikaranîn.

Mînak:

bibe = bive = biwe bi + vê (wê) = pê piçûk = biçûk.

berbena = bervena = berwena = bermena

nimbêj = nimêj = nivêj

bisilman = misilman

bimbarek = mubarek,

2- “k, g, q” Mînak:

kanî = kehnî = qanî = ganî = hênî

çaydang = çaydank,

kom = gom = qom

3- “h, x, k” Mînak:

xo = ho xolxol = holhol (navê gundek Gêxî yê)

gotinên bîyanî de;

bardak = bardax yasaq (k) = yasax.

4-”d, t, “ Mînak  
mêrêd = mêrêt  
tar = dar tevir = devir, û hwd.

5- “c, j, ş, s, z “ mînak:  
jin = cinî, cêr = jêr, cor = jor  
cejn = ceşn, ajne (avjenî) =aşne  
şar =sar, rast =raşt  
laj = lac =lazê min  
bec =bej=beş = bez ûwd.

6- “ç, k, c, g “ mînak:  
çê = kê  
çêber = kêber  
cêxî = gêxî

7- “v, w, m” Mînak:  
dim = duv =duw  
zama= zawa = zava,  
nam = naw = nav.

## DI KURDÎ DE VEGUHEZTINA DENGAN (TÎPAN)

Gelek sedemên veguheztina dengan hene, li **bêşa** guhertina ziman binêrin. Em di wur de bi dirêjahî li ser vê pirsgirêkê rawestiyên. Ezê li vir bi giranî li ser Kurmancî û Kirdkî rawestim.

### A- Veguheztina dengdêran,

1- Velîstina “a = e” Pierre Lecoq (47) di vî barî de wusa divêje: “Em nizanin çima li rojava di Kurdîya bakur de, li rojhelat di Sorxî û Sengaserî de û hinek zaravayên navendî de „a,, bûye „e,, “

### KURMANCÎ

kal a (Torî) = kal e  
pan = pehn

tat	= teht
tal	= tehl
şanik	= şenik
barebar	= behrebehr ûwd.

#### KIRDKÎ

hawle	= hewle
hawn	= hewn
hak	= hek
atîya	= etîya
hard	= herd, erd

#### KURMANCÎ

şerbet
tenê
werîs
terr û turr
teht (tat)

#### KIRDKÎ

şarbet
tanî
waris
tarr û turr
taht,

#### KURMANCÎ

ezman
beredar
parçe

#### SORANÎ

asuman
bardar (baredar)
parçe.

2- Veguheztina “a” û “o” G. Morgenstierne (48) li ser veguheztina bi vî awayî wisa dinivisîne: “ a ya Êranî ya kevn gelek caran xwe diguhezîne „o,, „ô,, carcaran jî „û,, yê.”

#### KURMANCÎ

Kamo	= Komo (Mereş)
xam	= xom
xa (Mazgîrt)	= xo
na	= no (Cîzre)
nan	= non

## KIRDKÎ

Di Kirdkî ya başûr (Palû û berjêr) bi piranî “a” û di Kirdkî ya bakûr (Dêrsim û berjor) bi piranî “o” dihê bikaranîn.

Mînak:

Başûr	Bakûr
avêr	= over
cana	= cona
camêrd	= comêrd
canik	= conik
giran	= giron
gam	= gom ûwd.

## KURMANCÎ

ban  
caran (ti caran)  
camêr  
gamêş  
mast  
çamûr  
cam  
axrê

## KIRDKÎ

bone  
corû (coran)  
comêrd  
gomêş  
most  
çomir  
com  
oxro û hwd.

## KURMANCÎ

firof  
tilorbûn

## SORANÎ

firaşt  
tolan bûyîn

3-Veguheztina “a, u” veguheztina van tipan gelek kêr û tenî di devokên navçên biçûk de xuya dikin.

## KURMANCÎ

waha  
wand (wenda)  
waqas

= wuha  
=wunda  
=wuqas

## KIRDKÎ

game

= gumi



gan = gûn  
qizban = qizbûn

#### 4- Veguheztina “e, i, î”

##### KURMANCÎ

werîs = wirîs  
merov = mirov  
wenda = winda

##### KIRDKÎ

gogi = goge  
golik = golek  
imbaz = embaz  
ino = eno  
gil = gel (gêl)

##### KURMANCÎ

heliyan  
hinek  
hişar  
hindik  
êdî  
gir

##### KIRDKÎ

hiliyayen (hel)  
hinî  
heşar  
hendek  
indî  
gere

##### KURMANCÎ

li  
di  
hilbirin  
keç  
lîl

##### SORANÎ

le  
de  
helbirin  
kiç  
lel

5- Veguheztina “e, ê” li gelek deveran ev deng di cîhê hev de tèn bikaranîn. çend mînak:

### KURMANCÎ

mewuj	= mêwuj
fesad	= fêsad
fesal	= fêsal
kengê	= kêngê
kevgîr	= kêfgir

### KIRDKÎ

embaz	= êmbaz
kerva	= kêrwa
qurvetî	= qurvêtî
vacê	= vaze
nemaz	= nêmaj

### KURMANCÎ

êş
gêrmî (germî)
vegeryan
kêmî
kêrva (kirîv)

### KIRDKÎ

dej
germî
agêyrayen
kemî
kêwra

6-Veguhezina “e, o” herçiqas kêm be jî di navbera zaravan de xûya dike.

### KURMANCÎ

gewre	= gore
gwez	= goz (guz)
gwert	= gort

### KIRDKÎ

hewn	= hown
cew	= cow
gewr	= gowr
gew	= gow

**KURMANCÎ**

xew /xewn  
 gewr  
 kef  
 lep  
 merêve

**KIRDKÎ**

hown, xewn  
 gowr  
 kow, kof  
 lop  
 moreba

**KURMANCÎ**

xweş  
 xwe  
 çem  
 xew  
 serok

**SORANÎ**

xoş  
 xo  
 çom, çem  
 xowten  
 serek, sereta

**7- Veguheztina “e, u”****KURMANCÎ**

weha = wuha  
 wesa = wusa  
 merov = murov

**KIRDKÎ**

hergu = hurke  
 heli = huli  
 kewndez = kundez

8- Veguheztina “î, ê” Ev herdû deng bi hêla artikularî ve jî gelek nêzîkên hev in. Ji wê gelek caran di ber hev de tên bikaranîn. Mînak; şûna pezê (n) me de pezî me.

**KURMANCÎ**

êdî = îdî  
 bêhn = bîn (bîhn)  
 têhn = tîn  
 pezê = pezî  
 dervayê = dervayî

### KIRDKÎ

rindekî	= rindekê /y
parîn	= parên
pîrar	= pêrar
pîser	= pêser
bizî	= bizê /n (zafmarî, piranî)

9-Veguhezina “i, u” Li ser vî dengê nêrîna G. Morgenstierne (49) wisa ye: “<û> Êranîya kevn him li rojhilat û him jî li rojava gelek caran xwe vediguhezîne <î>, <i>.”

### KURMANCÎ

xwîn	= xûn
winda	= wûnda
rî	= rû
wiha	= wuha
wir	= wur

### KIRDKÎ

kiho	= kuho
piro	= puro
pirtik	= pûrtik
pirçikin	= pûrçikin

### KURMANCÎ

mirdar  
miruz  
mij  
milç  
mixare  
muzir  
pûrt  
rû

### KIRDKÎ

murdar  
mûriz  
mûj , miz  
mulç  
mûxare  
mizir  
pirt, pûrt  
ri

9-Veguhezina “o, û, u” gelek mirov me van dengan jî, di berhev de bi kar tînin, heta dinivisandinê de jî gelek caran

derdikeve hember me.

### KURMANCÎ

ku	= ko
du	= doh
dûtmam	= dotmam
sor	= sûr
bandûr	= bandor
serok	= seruk
kur	= kor

### KIRDKÎ

kûç	= Koç
Kûnî	= konî
kû	= ko
pişûtî	= pişotî
guş	= goş
gulik	= golik
guweze	= goze

### KURMANCÎ

golik  
kûr  
buhtan /botan  
bocik

### KIRDKÎ

gulik  
kore  
botan  
bûweçe

### KURMANCÎ

cot  
sor  
sotin  
gotin  
şuşt  
dotin

### SORANÎ

cût  
sûr  
sûtin  
wutin  
şot  
dûtin

10-Veguhezina “o, w” van dengana hima bigire di hemû zaravan de wek hev cîh diguherin. Karl Hoffman (50) li ser

dengê “w” nirxandinek wisa tîne: “Bi awayek din wek Awesta nû (zend) girêdanên mîna „w,, kû pêşveçûna wê „v,, = „f,, ye, rind dide xûyan.”

di hemû zaravan de  
ordeg = werdek  
olam = welam (xizmet)  
ode = wede  
ojdan = wîjdan

11-Velîstina sêbare “a,o,e”

### KURMANCÎ

Feqiyê Teyra kal a (herêma Torê).

newal bi dar o.

F. T. kal e , newal bi dar e.

### KIRDKÎ

hewn = hawn = hown

wazen = wazan = wazon.

Bê vanan dengên dengdêrên din jî gelek caran cîh diguherin, di ber hev de dihên bikaranîn. gelek caran yek gotinek bi çend lêvkirinên (telafûz) xwe ve, bi me wek gotinên bîyanî tên. Em çend mînakan bidin:

û = îwî , ewî

bûk = bîk, bîwîk , bewîk = weyvî (Erdalanî-Sine) , veyvîk (Kirdkî).

bûn = bîn, bûyîn, biwîn û hwd.

### **B- Veguheztina Dengên Lal (Dengdar),**

Hima bigire di hemû zimanê cîhanê de hinek dengên lal cîh diguherin, ev cîh guhertin gelek caran çawa ku me pêş de jî zelal kiribû dibe sedemê afirandina zaravan. Û carcaran jî zimanan ji hev cûda dike. Ezê li vir li ser veguheztinên herî girîng rawestim.

1- Veguheztina “b” û “v,w” Di zimanê Kurdî de ev veguheztina gelek girîng e, lê hîna lêkolînên bersiva vê pirsgirêkê dide nehatiye çêkirin. Ev divêt baş bête zanîn, ji cûdahiyên di navbera zimanê Farisî û Kurdî de yek jî, ev deng e. Di Farisî de dengê “v” nîne, di cîhê wê de “b” dihê bikaranîn, û vê werêçek gelek mezin li zaravên Kurdî yên başur jî, kiriye, heta hîkarîya wê li herêmên Hekarî, Botan û Behdînan jî, heye. Ev rewş di zimanê nivisandinê de jî xwe dide xûyan. Em çend mînakên ji Farisî û Kurdî bidin:

FARISÎ	KURDÎ
şehrîban	şarîvan
çoban	şivan
mîhrîban	mîhrîvan
ab	av, aw ûwd.

Gelek zimanzanên cîhanê jî, li ser vê pirsgirêkê rawestîyan û dîtînen xwe û rastîyên ziman wisa anîn ziman:

W. B. Henning (51) wusa zelaldike. “Zimanê Medî ya kû Êranî ya bakûr e, tiştên kevn pir hilnegirtiye. Cûdahiya wê û Parsî.”

Medî = vemark (bê mirin)

Parsî = abê marg (bê mirin)

Karl Hoffmann (52) wisa dinirxîne: “Li gel analogiya Awesta nû <tbaêşah> mabû, di Awesta gata de jî <dvaêşah> ango „tb,,=,,dv,, ye.”

G. Morgenstierne (53) wiha dinivisîne “ „b,, û „v,, li hev geryane.”

Pierre Lecoq (54) di vî warî de wusa divêje ; “Piraniya zaravên Kurdî de „ba,, e, lê ev guhertinek nû ye (tesîra Farsî “bad”), ji ber kû zaravên bakur forma kevntirîn „wa, va,, parastine.”

O. Mann jî wiha zelaldike (55) “Zaravên Êranî ya bakûra rojava di ber <b> ya Farsî^ya nû de <v> bi kar tîne.” Ez bawarim ku ev dîtîn bes in, divêt em divî warî de bi tundî bixebitin. divêt em vê jî baş bizanin dema ku em di cîhê <b>

yê de <v> bi kar bînin emên zaravên xwe jî gelek nêzîkên hev bikin, lewra di gelek zaravan û devokên me de bi giranî dengê <v> tê bikaranîn. Em niha jî, li zaravên Kurdî binêrin.

### KURMANCÎ

bibe	= bive
bibêje	= bivêje
nebêje	= nevêje
kebanî	= kevanî
babo	= bavo
neqeb	= neqev
bibîne	= bivîne ûwd.

### KIRDKÎ

bî	= vî
cewab	= cewav
bin	= vin, win
qizban	= qizvan
herb	= herv
kerba	= kerva
qurban	= qurvan
arban	= arvan
seba	= seva û hwd.

### KURMANCÎ

ba  
berdayîn  
dever  
nebêje (nevêje)  
bakur (zimag)  
bazdan  
belg  
şalvar  
bûk (bewîk)  
ber

### KIRDKÎ

va  
verdayen  
teber  
nêvaje (z,c)  
vakur (zimag)  
vazdan  
velg  
şalbar  
veyvîk  
ver



berê (berênî)	verênî
berx	vare (verx)
hember	hemver
bîrî	vîrî
bîhndayîn	vindan
(bîhnek bide)	(hero vinde)
berf (befr,bewr)	vore, vowr, vewr, vefr

Di zaravê Soranî de hima bigire dengê <v> nayê bikaranîn di cîhê wî de <w> tê bikaranîn.

### SORANÎ

bab	baw
bibe	biwe
dibe	diwe. û hwd.

2- Veguheztina <c> û <j> Pierre Lecoq (56) di vî warî de wisa divêje: “<ç> bûye <j>”

### KURMANCÎ

wîcdan	= wîjdan
bacar	= bajar
hecîn	= hejîn
hêcîr	= hêjîr

### KIRDKÎ

car cor	= jar jor
wîca	= wîja
vacê	= vajê
ci	= jê
gaci	= gaji

### KURMANCÎ

jê (jê re)  
jêr  
jor

### KIRDKÎ

cê (cê ra)  
cêr  
cor

gac  
jin

gaj  
cini ûwd.

3- Veguheztina <j> û <z> Gotinên bi <z> gelek caran ji hîkariya Farisî ketiye zimanê Kurdî, lewrê cûdahiyek Kurdî û Farisî jî, bikaranîna van herdû dengan e.

#### KURMANCÎ

jîrek = zîrek  
jengar = zingar  
jeng = zeng  
jendin = zendin  
limêj = limêz.

#### KIRDKÎ

vajê = vazê  
aj = az  
gijik = gizik  
jîrç = zîç  
jêde = zêde  
jû = zû  
jûbîna = zûbîna

#### KURMANCÎ

mizgîn  
mîz  
nêz (nêzîk)  
zîrç  
zuha, zuwa  
zîyaret  
erzan  
gezik  
mij  
gijik  
jî  
aj

#### KIRDKÎ

mijdanî, mijdan  
mij  
nêjdî (nêzdî)  
jîrç  
joa, juwa, zuwa  
jîyarede, jîyare  
erjan  
gejik  
miz  
gizik  
zî  
az ûwd.

4- Veguheztina <h> û <w> G. Morgenstierne (57) di vî warî de wusa dinivisîne: “Bi gelemperî <hw> kevn xwe veguhezandiye <xw> tenê di Belocî û hinek zaravên Êranî ya bakûrê rojava de gelek caran ji hev hatiye qetandin û wusa bûye ; <w>, <h>, <f>”

Dîsa Pierre Lecoq (58) wiha dinirxîne: “ Piraniya zaravan yan <xw> parastine yan jî, yek wenda kirine.

Mînak:

Ormûrî	= xolok
Gîlakî	= xor
Mazandarani	= xêr
Azerî	= xwerden*

#### KURDÎ

Kurmancî Kirdkî Soranî Goranî (Kendulay)  
xwarin werden xwerden werden (xwarden) . “

Em naha jî, di zaravan de veguheztina van dengan verisin.

#### KURMANCÎ

hefqas	= waqas
hêjmar	= wêjmar
hêrs	= wêrs
hêştir	= wêştir
heylo	= weylo
hêca	= wêca
Hûnik	= wûnik

#### KIRDKÎ

hurdi	= wurdi
huşk	= wuşk
hûyî	= wîye
hewsar	= wefsar
hewnayen	= winîyayen
hero	= wirro

---

\* Li Azerbeycanê devokek Taleşî heye jê re Azerî tê gotin. Li vir qest ne Azeriyên Tirk e. Pierre Lecoq di xebata xwe de li ser vî zaravayî radiweste.

hût = wit  
herdi = wirde  
hiwayen = wiyayen.

<b>KURMANCÎ</b>	<b>KIRDKÎ</b>
hur	wurd
huşk (hişk)	wuşk
hilçinîn	wiçinayen (weçinayen)
hildan	wirjnayen
hilkirin (hilavêtin)	wuranten
hirç	wurç (heş)
hût	wit

<b>KURMANCÎ</b>	<b>SORANÎ</b>
nihêrîn (nêrîn)	niwarîn
hûr	wurd
hişk	wuşk
hirç	wurç ûwd.

5-Veguhezina <L> û <r> Ev velîstin di cûdahiya hinek zaravan de rolek gelek mezin dilîze. Û di mêj de ketiye nav ziman. Mirov dikane wek karekterek zimanê Kurdî binirxîne.

Karl Hoffmann (59) vê mijarê wisa şirove dike: “<L> ya Îndo-Germanî bi kêmî be jî, di zaravên Vedî de heye, vê xwe di zimanê Êranî de bi piranî veguheztîye <R> . “

G. Morgenstierne (60) wisa dinirxîne : “Li gel <L> ya Îndo-Germanî di Êranî de bi <R> re lihevgerîyanê, dîsa <L> dijî.” Em niha jî, di nav û navbera zaravan de velîstina <L> û <R> yê binêrin.

<b>KURMANCÎ</b>	
alîkar	= arîkar
şol (şolik)	= şor , şorik
gilol	= gilor
girol	= gilor

lawir = rawir  
zelû = zerû

### SORANÎ

Hewlêrî Silêmanî  
rore = role  
berê = belle (bivêje)  
mar = mal  
minder = mindal

### KIRDKÎ

fotêl = fotêr  
fîlar = firar  
heleket = hereket  
gulaş = gureş  
şîlgerm = şîrgerm  
încîlî = încîrî  
dolbend = dorbend  
dolim = dorim  
bilûl = bilûr  
lojing = rojing  
çila = çira

### KURMANCÎ

rovî  
rûpel  
sal  
dormal  
gustîl  
bilûr  
çira  
şor  
qirêj  
rojing

### KIRDKÎ

lûwî, lûyî  
rîper  
sar  
dormar  
gistîr, giştane  
bilul  
çila  
şol, sol  
qilêj  
lojing

çend gotinên bîyanî

esrar	esral
hereket	heleket
fîrar	filal, filar
marîfet	malîfet
fotêr	fotêl

6-Veguhezina <m>, <v,w> Ev guhertin tenê di hinek zaravên Êraniya bakurê rojava de çêbûye. wek Belocî = di cîhê gamêş de “gawêş” û bi dewlemendî di Kurdî de xuya dike.

Di zaravê Kurmancî û Soranî de ji sedî nod, di Ardelanî (Sine) û hinek zaravên navendî de ji sedî şêst <M> bûye <V>. Di Kirdkî û Goranî de ji sedî heştê û pênc <M> maye.

#### KURMANCÎ

nimêj	= nivêj
temam	= tevav
selam	= silav
temsî	= tevsî
dehmdan	= devdan

Di gelek peyvan de guhertin tine, mînak

gamêş  
hemêz  
hember  
ziman  
nerm  
çem

#### KURMANCÎ

gav  
eva  
ziman  
zava  
zivistan  
nîv  
hingiv  
îroj

#### KIRDKÎ

gam  
ew  
ziwan  
zama  
zimistan  
nîm  
hengem  
ewroj

#### ARDELAN (Sine)

qam hengaw,  
eme em  
ziman ziman  
zamawend  
zimisani  
nîm, nîw  
hengemîn  
emroj

çav	çim
duv(div)	dime
mêvan	meyman
nav	nam
revîn (randin)	ramayen
kevan	keman (wek Farsî)
havîn	hamîn (omnen) ûwd.

### SORANÎ

hengaw  
eme, em  
ziman  
zawa, zamawend  
zîstan  
nîw  
hengemîn

7- Veguheztina <g> û <c> ev bi piranî di nabera Kirdkî û Kurmancî de xûya dike. Di nava meteryalên zaravên din yên destên min de ne, rastê nehatim.

KURMANCÎ	KIRDKÎ
gerîn	cêrayen, geyrayen,
can, gîyan	gan, can
hacîdar	hagîdar,
megire (girtin)	mecêre (gureten)
canawer (cinawir)	ganawer
gênc (cîwan)	cênc
gef	cîf ûwd.

8- Veguheztina <k> û <x> gelek kêmbê jî, dîsa xuya dike.

KURMANCÎ	KIRDKÎ
kefî (çefî)	xafî
kap (kape)	xape
kurî	xûrî

9-Veguheztina <k> û <ç>

KURMANCÎ

kefî	= çefî
kêrî	= çêrî
kenge	= çenge
kerm	= çerm

KIRDKÎ

kê	= çê
kes	= çês

10- Veguheztina <s> û <z>

KURMANCÎ

derbas	= derbaz
gest	= gezt
nas	= naz
xinis	= xiniz
gevast	= gevazt

KIRDKÎ

girs	= girz
sêw	= zêw, zow
seybî	= zeybî, zoyvî, zoybî
simil	= zimbêl

KURMANCÎ

ç = t	
çêjik	= têjik
çu, (çi)	= tu (ti)
çîk	= tîk

KURMANCÎ

ti

KIRDKÎ

çi



kuçik (kutî)

kutik

11- Hinek veguheztinên tenê dinava zaravek de hene.

**a) KURMANCÎ**

f = v

mirof	= mirov
heft	= hevt
hefsar	= hevsar
kefgîr	= kevgîr
tifing	= tiving

g = k

çaydang	= çaydang
hegê	= hekê
gew	= kew
gewz	= kevw
çog	= çok

b = p

biçûk	= biçûk
kebab	= kebap
kab	= kap
celeb	= celep.

m = n

mêvan	= nîvan
merdîven	= nerdîven

d = t

deqya	= teqya
devir	= tevir
def	= tef

j = ş

kujan	= kuştin
-------	----------

şijtin = şuştin  
gîj = giş  
rahêjan = rahêştin

v = w  
şev = şew  
rave = rawe  
şivan = şivan  
govend = gowend  
vexwarin = wexwarin  
veketin = weketin

w = y  
sûwar = sîyar  
qawîş = qayîş  
zuwa = ziya (ziha)  
zewani = zîyanî

y = h  
edlahî = edlayî  
rindahî = rindayî  
saya = saha

## **b- KIRDKÎ**

d = n  
gosdan = gosnan  
hûrdina = hûrna

g = k  
ginc = kinc  
hergû = herke  
gozig = kozik

g = q  
gewat = qawat

gumgumik = qumqumik

j = y

jey = yey

jînî = yînî

jû (jo) = yew

n = y

koune = koyê

bêbextênî = bêbextîyê

mêne = mîyane

s = ş

gos = goş

dos = doş

wes = weş

les = leş

12- Veguheztina <o> û <ev, ew> ev herdû diftonan bigire tim, dengek nêzî <o> dide ji wê gelek caran di peyvînê de cî diguherin, yan jî mirov wisa dibihîse.

KURMANCÎ

ew

dew (dou)

kevçî

ketin (keftin)

KIRDKÎ

o (ow, ew)

do

koçike,

kawçîk(kowçîk)

koten, kewten kewtin

SORANÎ

ew

dow

kawçîk

13- Hinek velîstinên di navbera Soranî û Kurmancî de,

KURMANCÎ

xweş

xwe

çem

xew

SORANÎ

xoş

xo

çom

xouten

serok                      serek (sereta)

cot                      cut  
sor                      sur  
şuşt                      şot, şort, şoşt  
dot                      dut

bîn (bêhn)              bon  
alîn                      alozin  
tilorbûn              tolan

firot                      fraşt  
stand                      send

av                      aw  
pîv                      pîw  
nîv                      nîw

vêsîn                      aysîn  
vêsandin              aysandin

14 - Veguheztinek taybetî velîstina <t> û <ç>

KURMANCÎ	KIRDKÎ	BEXTÎYARÎ
çav	çim	tîya
tîşt (çîyek)	çîyê	
têjik = çêjik		
ti = çu /çi	çî (çîno)	

15- Di navbera zaravên Kurmancî û Kirdkî de velîstina dengê <v> û <g>

KURMANCÎ	KIRDKÎ
guherîn (giherandin)	virnayen (vurnayen)
gur (gurg, gwurg)	verg
gulîlk	vîliki

## DI KURDÎ DE KETIN Û WENDABÛNA DENGAN

Me çewak di mijara guhertina ziman de jî, anibû ziman gelek caran parek yan jî tîpek gotinan wenda dibe yan jî dikevin. Ev rewş di her zimanî de heye û tiştek xwezayî ye. Di zimanê Kurdî de jî, gelek caran deng dikevin yan jî, wenda dibin. Di vî warî de jî, lêkolînên hinek zimanasên biyanî hene, ez ji wan çend mînakên bidim.

Karl Hoffmann (61) wisa dinivîse: “ Deng kurtbûn, yan jî kêmbûn di dema Awestayê de jî, hebû.

Mînak :

Awesta Gata = daibişyanat (hêrsbûn)

Awesta Zend = tbişyant ”

A. Gata = drogva (ragirtin)

A. Zend = drva ”

A. Gata = çathwaro

Partî = çtf’r (çetfar)

dîsa ji Gatayê

ayêm = aêm

bavom = baom

aînîyem = anîm

sraota = sruta = srwta (bîhîst, godarî kir)

Elamî = tar - qa - ai - u - iş ( derg, drêj)

Parsiya kevn = dargayuş ” ”

A. Gata = darigayu (dargauyu) ” ” “

W. B. Henning wiha dinirxîne (62) “ Saziya kurtbûna peyvan yê ku pêşte dengên kin girt ber xwe, li rojhilat û li rojava her yekî berê xwe da hêlekî ; mînak :

Li Rojhelat = Xurmazda

Li Rojava = Ormizd (Hurmiz) “

Dîsa

birader = bira = bra

duşmenun = dijmin û hwd.

1-Di zaravê Kurmancî de ketina dengê <d>

KURMANCÎ	KIRDKÎ	SORANÎ
ar (ard)	ard (î)	ard
hûr	hûrdî	wird
kêr	kardî	kard (çaku)
kir	kerd	kird
mir	merd	mird
nêz (îk)	nêzdî	nêzîk/ nêzdîk
pir (e)	pird	pird
sar	serd (sard)	sard
zer	zerd	zerd

2- Di Kurmancî de ketina dengên <w>, <s> û <h>

KURMANCÎ	KIRDKÎ	SORANÎ
ketin	kewten/koten	kewten
guhastin	vernayen	gwastinewe
gir	girs	gewre
ewr	hewr	hewr
erd	hard / herd	
eyamî	heyamî	

3-Di Kirdkî de dîftonga <xw> ji hev hatiye qetandin û dengê <x> ketîye.

KURMANCÎ	KIRDKÎ	SORANÎ
xwendî	wendî	xwendî
xwastin (xwazin)	wazen	wîstin
xwarin	werden	xwarden
xweş	weş (wes)	xoş
xwar	war	...
xwa / xweng	wa	wale, xuşk

xwedî, xweyî	wayîr / weyîr	xawên
xwelî	welî	.....
xweşanî	weşanî	
xwasta	waştâ	
xwarzî	wareza	
xwedî /xweyî kirin	weye kerden	
xwirandin	wirnayen	
xwe	xo xwî ûwd.	

#### 4 - Di Kirdkî de ketina hinek dengên din.

<b>KURMANCÎ</b>	<b>KIRDKÎ</b>
jmartin	maren (moren)
frotin	roten

Ez di vir de tenê li ser veguheztinên girîng rawestîyam, armanca min bi kêmî be jî, şanîdana velîstinek sîstematîk ya dengên Kurdî ye. Demak mirov li ser pirsgirêke hinek raweste, dikane hemû zaravan têbigêhêjê. Bilî vê nirxandinê ji xwendewanan re dihêlim.

**B - MORFOLOJÎ**  
**ÇEND GOTIN LI SER PEYVZANÎNÊ,**  
**YAN JÎ, VIRASTINA (AVASAZÎ)**  
**PEYVÊN KURDÎ**

**I- BI ALÎKARIYA PÊŞGÎN Û DAÇEKAN**  
**VIRASTINA PEYVAN**

1- Bi alikariya <bê>  
I - Di wateya nayênî û dijayetî de

**KURMANCÎ**

bê + ..... bêdeng  
bêpar  
bêcan  
bêkeys /bêkes  
bêav /bejî

**SORANÎ**

bê + .... bêmeşk  
bêhest (bêheş, bê hîs)  
bêdadî  
bêkutayî

**KIRDKÎ**

bê + ..... bêro (bêcan, bê ruh)  
bêma  
bêpî



bêbextîyê

II - Bi alîkariya <bê> peyvên serbixwe û di wateyên din de tê afirandin.

KURMANCÎ

bê + ... bêzar (ji xwe ketin, bê hêvî)  
bêder , bênder (Cîhê sap tê hurkirin û genim  
jê tê niqandin.)  
bêçî  
bêrîk (cêv)  
bêjing

SORANÎ

bênçe

KIRDKÎ

bêçîkê  
vêre (revok, “b” di Kirdkî de dibe “v”)

2 - Bi alîkariya daçeka <BER>

I - Wateyek pêşîn, li ber yan jî, li ber tiştek, li ber karek, li ber bûyînek dide xuyan, yanî delometek li peyvê bar dike.

KURMANCÎ

ber + ..... berdestî  
bermalî  
berçavk  
berbûk  
berbajark

SORANÎ

ber + ..... berkewten (hatin girtin)  
berberekane (pevçûn)  
bergir  
berva

KIRDKÎ

ber + ..... bervayen (gîryan, ber yekî ketin, di ber yekî de way kirin)

ber + way +en =berwayen)  
 kêber, çêber, çêver  
 ver + ..... verva (berva; “b “ û “v” cîh guhertine)  
 verdira

II - Wateyek bi adan bûyînê û bereketê dide, yan jî li peyvê bar dike.

#### KURMANCÎ

ber + ..... berdar (cîh û tiştên bi xêr û bêr)  
 bergirtî  
 berhem

#### SORANÎ

ber + ..... berhemdar  
 bergirî  
 zikber

#### KIRDKÎ

berhem  
 berok amo ver  
 amber

III - Bi alîkariya vê daçekê peyvên serbixwe û di wateyên din de tê afirandin.

#### KURMANCÎ

berdan  
 berbang  
 berbenî

#### SORANÎ

berberî (barbar)  
 berzaw (laser, lehî)

#### KIRDKÎ

berdayen  
 berdoş  
 berden (birin, birdin)

3 - Bi alîkarîya <BI , BE>

Ev bernav tim wateyek erênî û pozîtîv dide peyvan.

I - Hebûna tiştan dide pejirandin.

**KURMANCÎ**

bi + ..... biber  
biaram  
biçêj (bi t'am)  
bijûn (zindî)

**SORANÎ**

be + ..... bedaxewe (mixabin)  
beheredar (bi huner, ji dest hatî)  
betaybet

**KIRDKÎ**

bikeme  
biliye  
vilaw

II -Pê vê daçekê peyvên di wateyên din de jî, tên virastin (çêkirin).

**KURMANCÎ**

bijartin  
bihuşt  
biha (buha)  
bihar

**SORANÎ**

bizutnewe (birêkxistinî)  
betiwana (dikane, ji dest tê)  
beraz  
beşuş (keyf li cîh)

**KIRDKÎ**

bijek  
birayene

4 - Bi alîkariya daçeka <BIN>

Ev wateyek çewisandinê, bingehî li peyvan bar dike, bi alikariya vê peyvê kurahî tê nişandan.

I - Di wateya binî bingehî û çewsandinê de.

#### KURMANCÎ

bin + ..... binçeng  
bindest  
bingeh  
binav , benav

#### SORANÎ

Di vê zarava me de daçeka <bin> nayê bikaranîn, di cîhê wê de daçeka <jêr> tê bikaranîn

jêrzemîn  
jêrdest  
bindestey (ji zarava Kurmancî)  
bingeh

#### KIRDKÎ

binêhardî  
binêawî  
binêşîramî  
bingeh

II - Di wateyek serbixwe de.

#### KURMANCÎ

binîse (belengaz)  
bindeq

#### SORANÎ

bindeq

#### KIRDKÎ

binge

5 - Bi alîkariya pêşgîna <CA> virastina peyvan.  
Gelek kêm be jî, dîsa di hemû zaravan de çend mînak hene.  
Ev ji peyva <CAN> tê

Rastiya peyvê

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
canmêr	camêr	camêr (canmêr)
camêr	canwer	cinawir
canawer	canwer	
canbaz	canbaz	canbaz canbaz

6 - Virastina peyvan bi alîkariya pêşgîna <ÇÊ>  
Pêşgîna <çê> wateyek rindî û avakirî li peyvê bar dike, yan jî di afirandina peyvên wisa de tê bikaranîn.

KURMANCÎ

çê + ..... çêkirin  
çêbûn  
çêbûwar  
çêyî  
çêyîtî

SORANÎ

Di vê zarava me de di cîhê <çê> de pêşgîna <çak> tê bikaranîn.

çak + ..... çak  
çakîyane  
bi çake

KIRDKÎ

çê + ..... çêyîtî  
çêriya dow  
çêver  
çêvêsayê

7 - Virastina peyvan bi alîkariya pêşgîna <DA, DE>  
Ev wateyek runîştinê, berjêr çûyînê, serî çemandinê û di nava tiştêk de wendabûnê li peyvê bardike.

## KURMANCÎ

da + ..... daketin  
dagirtin  
damîtin  
dahatin  
dageryan

## SORANÎ

dawêşan  
daniştin  
dagirsandin (elektirîkê, maşînê pêxistin)  
dapoşîn (porkirin)  
dakewtin  
dahênan

## KIRDKÎ

Di vê zarava me de <da> nerm dibe û dibe <de>

debîyayen  
degrewten  
deverdayen  
dekerden  
dekerdî

8 - Virastina peyvan bi alîkariya daçeka <DER>

Bi alîkariya vê daçekê peyvên di wateya derxistinê, dayîna ber tiştê, ber ra buhurandin û jihevketinê de tên virastin (çêkirin).

## KURMANCÎ

der + ..... deranîn  
derbûn  
derbaz  
dergeh  
derguş

## SORANÎ

dergeh  
derzen (tîmek 12 yî , duzîne)

derhêner  
derfet  
dergehwan  
derbirinî (formule)

### KIRDKÎ

a-

derzayen  
derze  
derjen  
dergo  
dereza

b- di vê zarava me de di cîhê <der> de <teber, tever> tê bikaranîn.

teverver (li rex hev)  
teberde  
tever (der, dever)

9 - Virastina peyvan bi alîkariya <DÛ>, <DO>  
Bi alîkarîya vê peyvên di wateya li pey, domdar, û berhemên sotinê de tînan afirandin.

### KURMANCÎ

du + .....

dûkêl  
dûmahîk  
dûketin  
dûaco  
dûmayîn /dûpişk

### SORANÎ

dûwahêmî (yê paşîn)  
dûreq (xilt, melez)  
dûrandin (binketin)  
dûcakirdin  
dûpişk

### KIRDKÎ

doman (dûman, dunde, zarok, nivş)  
dûnika

dûman  
dimî kewtenê

10 - Bi alîkariya daçeka <HER> virastina peyvan.  
Bi alîkariya vê pêşgînê peyvên di wateya berdomkirinê,  
çencarbûnê û cardin kirinê de tên virastin.

#### KURMANCÎ

her + ..... heryek  
herbihev  
hercarekî  
herçend  
heroj  
herwekî  
herwuha

#### SORANÎ

herşêweyek  
herweha  
herbabet  
herwek  
herzor  
herçonek (bi şêweyek)  
herkê

#### KIRDKÎ

herdiş  
herçî  
hertim  
herçiyê  
herkes  
herwext  
herkî

11 - Virastina peyvan bi alîkariya daçeka <HEV> , di Kirdkî  
de <Pêv>

Bi alîkariya vê pêşgînê, peyvên di wateya li gel hevî, hevparî  
û nîvekiyê de tên afirandin.



## KURMANCÎ

hev + ..... hevanî (kolektion)  
hevdak (sac)  
hevden  
hevdudanî (hevgîn)  
hevdûr  
hevgel  
hevpeyvîn

## SORANÎ

Çawa ku me di nav dengzanînê de dabû zelalkirin, di vê zaravê me de dengê <v> nîne , deng <w> di cîhê <v > de tê bikaranîn.

hewlêdan  
hewbeş  
hewrey  
hewtawan  
hewkirdin

## KIRDKÎ

a-

hewna  
hevcar

b-Di zaravê Kirdkî de daçeka <hev> nayê bikaranîn, di cîhê wê de pêşgîna <pê, pêv> tê bikaranîn.

pêamayen (li hev hatin, lêv gerîn)  
pêy geyrayen (li hev gerîn)  
pêy hesîyayen ( pêy hesîn)  
pêv manayen (pêve man)

12 - Virastina peyvan bi alîkarîya pêşgîna <HIL>, di Kirdkî de <F / VIR>. Ev wateyek berzbûn, avêtin, ji erdê qetandin ûwd. dide peyvan.

## KURMANCÎ

hil + ... hilanîn

hilavêj/hilkişok  
hilavêtin (virkirin, qilkirin, avêtina hewa.)  
hildan  
hilkişîn  
hilperîn

### SORANÎ

helbijardin (bijartin)  
helperandin (helfûrandin)  
helweşandinewe  
helbûnewe  
helperînewe

### KIRDKÎ

Di vê zaravê me de di şûna <hel,hil> de <vir, fir, wer, wur, hur> tên bikaranîn. Di Hewremî de jî <hur> dihê bikaranîn.

1- Çawa ku me di nav dengzanînê de dabû zelalkirin, di Kurdî de dengên <h>, <w> û <y> gelek caran cîh diguherin.

(f) virbîyayen (hilbûn, virbûn)  
(f) virkerden (hilkirin, virkirin, hilavêtin)  
wereznayen (hildan, rakirin)  
wurznayen ( „ „ rawestan)  
hurznayen (rabûn )  
serehewenayen (serhildan)

13 - Bi alîkariya daçeka <ji>, <ci> û <Le> virastina peyvan.

Ev daçek di nav zaravan de ne wek hev dihê bikaranîn , di nav zaravê Kurmancî û Kirdkî de ne bi tevhevî be jî, yekîtiyek heye. Ev wateyek ji tiştê qetandin, girtin, û hatinê li peyvan bar dike.

### KURMANCÎ

jê + ..... serjêkirin  
jêgirtî  
jêhatî  
jêlî  
jêketin.

## SORANÎ

Di vî zaravê me de daçeka <Ji> nîne, daçeka <Li> him di wateya xwe ya hîmî û him di wateya <ji> de tê bikaranîn. Bi rastî <Li> cîgehê, yan jî, cîhê ku kiryar hîn lê ye, nîşan dide. Lê <Ji> xala hereketê, rîçalê jê hatî nîşan dide. Vê zarava me de ev guheriye.

lêçûn, lê dest çûn	= jê çûn, ji dest çûn
lê bîr çûn	= ji bîr çûn
lêkewtin	= jê ketin
lêgirtin	= jê girtin
lêkirdinewe	= jê kirin
lêderkewti	= jê derketin
lêkêşan	= jê kişandin

## KIRDKÎ

a- Min çawa pêş de jî, anîbû ziman, di vê zarava me de gelek caran di cîhê tîpa <J> de tîpên <c> û <z> tên bikaranîn. Mînak: Ez jî = ez zî; roj = roz ûwd. Di vê zarava me de cîhê daçeka <Ji> paşgîna <ra> hilgirtiye.

cêkerden	= jê kirin
cêbîyayen	= jê bûn
cêkewten (koten)	= jê ketin
cêdikewten	= ji hev ketin.

b- Di zarava Kirdkî de mirov dikane di cîhê daçeka <Ji> de <tîre /a> jî, bi kar bîne. ev daçek daçekkek hevgîn e. ji van peyvên afiriye:

“di a / eyê ra	= tîra (kirdkî)
“di wê re	= tîre (Kurmancî), ango mantiq yeke.
(cê) tîra amayen	= jê hatin
(cê) tîra birnayen	= jê birîn (tîre birîn)
(cê) tîra girewten (gureten)	= jê girtin
(cê) tîra peye bîyayen	= jê peya bûn

c-Di Kirdkî de daçekek <der / dera> jî, tê bikaranîn lê ev û <tîre> bi bingehîn yek in û herdû jî, ji <di eyê ra> afiriye.  
Mînak

dergeyrayen = jê gerîn  
dermenden  
derqeleyayen

14 - Virastina peyvan bi alîkariya daçeka <LI>

Ev daçek pêkhatinek nû ye, di Kurmancî de delometa daçeka <di..... de> hilgirtiye ser xwe. F. Justîn (63) wusa dinivîse: “Ev ne elementekî Îndo-Ari ye, Elementekî Erebbî ye”. Ev bi serê xwe mijarekî lêkolînê ye. Di hemû zaravan de tune. Di Kurmanciya Bazidî de kê, lê ya Botan - Behdînan û Zaravê Soranî de gelek bi firehî dihê bikaranîn. Di zaravê Kirdkî û Feylî de nayê bikaranîn. Bi piranî li pêş lêkeran dihê bikaranîn. Ev daçek paşgîna îzafê digire û dibe <lê>

Mînak:

li + darê = lê ; li + wê = lê.

#### KURMANCÎ

lêdan  
lêhatî  
lêgerîn  
lêbarkirî  
lêketin  
lêxistin

#### SORANÎ

lêbirdin  
lêkewtin  
lênan  
lêbirdî  
lêkolînewe

#### KIRDKÎ

Min çawa li pêş jî, zelal kiribû di vê zaravê me de daçeka <Li, Lê> nayê bikaranîn, di çend gotinan de hebe jî, ne girînge. Di cîhê vê daçekê de, daçekên hevgîn <bider,bede,

bere> tên bikaranîn. Ev jî li ber lêkeran dihên bikaranîn û wisa afirîne:

bi + di + ra (re)	= bider
bi + eyî (ey) + de	= bede
bi + eyî (eyê) + ra (re)	= bere

di Kurmancî de	
bi + wê (yan jî <ê>) +re	= pêre
bi wê (<ê>) + de	= pêde

bere huwanayen	= lê xuyabûn, pê re xûyan
bider suwarbîyayen	= lê suwarbûn, pê suwarbûn
bider geyrayen	= lê gerîn, pey gerîn
bider qelibnayen	= lêqelibîn, pê ra qelibîn
bere şonayen	= lê çûn, pê de çûn
bede kerden	= lê kirin, pê da kirin
bider tadayen	= lê tadekirin, pê re kirin, pê tadekirin

15 - Bi alîkariya daçeka <NAV> virastina peyvan, ev jî di hemû zaravan de nayê bikaranîn. Di Kurmancî de bi alîkarîya vê peyvê, gelek peyv tên virastin. Ev wateyên navîn, navendî û cîgehî li peyvan bar dike.

### KURMANCÎ

navber	
navber	
navbîrêk	= des, dîwar
navçe	= mintiqe, cîh
navik	
navketin	
navçeng	= binçeng

### SORANÎ

Di Soranî de dengê <v> nîne, di cîhê wî de dengê <w> tê bikaranîn.

binaw	= nav re
-------	----------

nawerast	
lenêwan	= mabeyn
nawerok	
nawk	= navik
nawde	
be nawde çûn	= di nav re çûn

### KIRDKÎ

a - Di vê zaravê me de cîhê <nav> de daçeka <de> tê bikaranîn. Ev di hemû zaravan de gelek vekiriye kû wateya daçeka <di> û <nav> yek e. Em mînakê ji Kurmancî bigirin

Kurmancî	
di zewiyê de	= nav zevyê de
di mêrgê de	= nav mêrgê de
di malê de	= nav malê de

Di zaravê Kirdkî de daçeka <di> bi awakî din tê bikaranîn. Gelek kes ji ber ku di dema nika de wek berlêker nayê bikaranîn. haya wan ji vê daçekê nîne.

dekewten	= navketin
dekerden	= nav tiştê kirin
defereknayen	= navde hurkirin
denayen	= nav de kirin.

b - Di vê zarava me de gelek caran peyva “zere” (zerik, hundir) û peyva “werte” (orte) jî dihê bikaranîn.

werte aw de
zerê aw de
zerê mi de

c - Di vî zaravê me de peyva “miyan” jî, tê bikaranîn.

hêga miyan de
daran miyan de

Peyva “mîyan” bi piranî di wateya “nîvek “ , “ mabeyn” û “navend” de tê bikaranîn. Mînak:

aw mîyan de	= nîveka avê de (nava avê de)
daran mîyan de	= nava daran de
pîyê xo û ma xo mîyan de	= mabeyna dê û bavê xwe de.

Ji bo ku em vê cûdahiyê têbigêhêjin. mirov dikane wisa şlovebike: Di zimanê me de pircaran dengên <m> û <n> cîh diguherin.

Mînak:

mêvan	= nîvan
merdîven	= nerdîven
merdane	= nardane
meke	= neke
mêr	= nêr û hwd.

Bê vî mirov dikane têkiliya peyva “mabeyn” û “mîyan” jî bi hesanî bîvîne. Yek di hêla wateyê de, ya duwêmîn di warê velîstina dengê <b> û <M> de.

Mînak:

bisilman	= misilman
bimbarek	= mubarek
ma gelo ev ne wusa ye?	
mabeyn	= mîyan , (ma) mîyan.

16 - Bi alîkarîya daçekên <PAŞ> û <PEY> virastina peyvan.

Wateya van herdû daçeka bigire hema wek hev in, hinek zanyar di vî warî de divêjin ku daçeka <paş> ji Farisî tê , ne peyvek Êraniya bakurê - rojava ye.

Di Kurmancî de delometa daçekên <paş> û <pey> ne wek hev in. <paş> tê wateya tiştê ne dûr, ango nêz e, ji heyîya ber xwe naqete. Lê <pey> wateyek dûriyê nîşan dide.

Mînak :

Ew li paş min siwar bû	= Herdu li yek tiştê siwar bûne, nêz in.
------------------------	--

Ew li pey min dihat. = Yanî jê gelek dûr e.

Daçeka <paş> wateyek şundemayîne, tiştên hîn li dû ye û negîhîştiye pêşbîra xwe, yan şunveçûnê li peyvan bardike.

### KURMANCÎ

Paş + .... paşverû  
paşeroj  
paşîn  
paşîv  
paşpê  
paşgotin  
pey + ..... peyhatî  
peyhev  
peyîtandin  
peyke

= marionet, uydu

### SORANÎ

Di soranî de bi piranî daçekên <pey> û <dîw> bên bikaranîn jî, dîsa carcaran daçeka <paş> tê bikaranîn

paşko = romork  
paşeroj = dema pêş  
paşan  
paşgir  
lepaş  
paşkişekirdin.  
peyman  
peywendî  
peyke  
dîwa +..... diwa çûn  
dîwa man  
dîwa ranan = pey ajotin

### KIRDKÎ

Di vî zaravê me de tenê daçeka <pey> tê bikaranîn. <Pey> him wateya xwe û him wateya <paş> hilgirtîye.  
paştîyê



peyên	
peynîyê	
peyser	
peyhesîyayen	
peysayen	= zuhabûn
peymaweyen	= pîvan
peyda	

17 - Virastina peyvan bi alîkariya daçeka <PEV>  
 Ev daçekek hevgîn e. Ji yekîtiya <bi> û <hev> tê : bi + hev  
 =pev wateyek girêdayînê û beramberiyê dide peyvan. yan jî,  
 wateya wan xurt dike. Li hêla din wateya pev û hev bigire  
 hema yek in.

### KURMANCÎ

pevre	= hev re
pevçûn	= li hev xistin
peve	= yekûn, encam
pevgirêk	= peyman

### SORANÎ

a-	pêwe	= berzî
	pêwekirdin	= rakirin, hilkirin
	pêwgirêk	
	pêwebestin	= pêve girêdan
	pêwe çaspan	= pêve zeliqîn
b-	pêk ketin	= pêv ketin
	pêk nan	= pev xistin
c-	lêk bestin	= pev dirûtin (bi hev ve)
	lêk çaspan	

### KIRDKÎ

Di vî zaravê me de tenê <pê> tê bikaranîn, lewra di cîhê  
 >hev> de jî, <pîya> tê bikaranîn.

a-	pê kerdin	= pev kirin (bi hev ve kirin)
	pê kewten	= pev ketin (bi hev ketin)
	pê menden	

b-                   pero dayen       = pevçûn  
                       pero ginayen   = pêra li hev ketin

18 - Bi alîkariya daçeka hevgîn <PÊ> virastina peyvan.

Ev daçekek hevgîn e. Ji daçeka <bi> û paşgîna îzafê, bi navek din keştiya sisyan ya veşartî hatiye virastin. Ango bi + wê = pê . Demak ev tê pêş peyvan wateya bi tişteki yan jî, bi kesek ve / re bûyîne, yan jî, bi wan karek û bûyînek bicîhanîne, dide peyvan.

#### KURMANCÎ

pê + .....       = pêve ( bi tişteki ve)  
                       = pêre ( bi tişteki, bi kesek re.)  
                       = pêbawar  
                       = pêkenî  
                       = pêşabûn  
                       = pêçan  
                       = pêçik

#### SORANÎ

= pêwerîn       (ewtîn, kaztîn, lawayen)  
                       = pêdan  
                       = pênasî  
                       = pênûs  
                       = pêçik

#### KIRDKÎ

= pêro           (pêre)  
                       = pêser (li ser hev)  
                       = pêda  
                       = pêgureten  
                       = pêwerden   (pê werkirin, lê werkirin)  
                       = pêresten   (pêre rast hev hatin)

19 - Bi alîkariya daçeka <PÊŞ> virastina peyvan.

Di hinek zaravan de ev daçek tune, di cîhê wê de daçeka <ver> (ber) tê bikaranîn. Bi alîkariya vê daçekê peyvên di wateya li ber, li pêşangê û li pey kişandinê, tîn virastin.

## KURMANCÎ

pêş + ..... = pêûkêş  
= pêşange / pêşeng  
= pêşverû  
= pêşîn  
= pêşveçûn  
= pêşhatî

## SORANÎ

= pêşange  
= pêşewe  
= pêşbînîn  
= pêşnîyaz  
= pêşkir  
= pêştewawbûn

## KIRDKÎ

.Di vî zaravê me de daçeka <pêş> tune, di cîhê wê de daçeka <ver> tê bikaranîn. Ev him bersiva “ber” û him jî bersiva “pêş” dide.

Di Kurmancî de:

# ber ———> # pêş

Di Kirdkî de:

# ver ———> # ver  
= verînîde (pêşte)  
= verindîyê  
= verêde  
= verîşîyo  
= verde

20 - Bi alîkariya pêşgîna <RA> virastina peyvan.

Bi alîkariya vê pêşgînê: 1- Wateya peyvan tê xurtkirin. 2- Wateya “ hil, hel, hur, wur” dide peyvan û bi piranî wek berlêker tê bikaranîn. 3- Wateyek dirêjbûnê, belavbûnê dide peyvan.

## KURMANCÎ

ra + .....	raberkirin	= pênîşandan, şirove kirin
	radêr	
	ragirtin	= binî girtin, berxwedan, rawe standin
	rabûn	
	rageş	= sinîr
	raker	= lastîka pakirinê
	ranerm	
	raketin	

## SORANÎ

	rabûrdû:rabuhurî, derbazbûyî	
	ragirtin	
	rakêşan	
	raperîn	=xwe pêşdan, serîhildan,ber bi pêş ve avêtin
	raweşan	
	rahênan	= şirove kirin
	rakewtin	

## KIRDKÎ

	rakerden	
	rabiryayen	=rabirin, veqetîn
	racêrayen	= dagerîn, veqerîn
	rausten (rawusten)	
	ravêr	= berjêr
	rakewten	

21 - Bi alîkariya berlêkerên < RU, RO> virastina peyvên Kurdî.

Ev pêşgîna wateyek sûretî yan jî, li panîyek danîn û hemberiyek dide peyvan, carcaran jî, wateya peyvan xurt dike. bi piranî wek berlêker tê bikaranîn.

## KURMANCÎ

rû + .....	rûdemî	= rojîn
	rûmet	

ro + .....  
 rûnîgar  
 rûniştin  
 rûpel  
 rûnivîn  
 rokirin  
 rocî / rojî  
 robar  
 roker

### SORANÎ

rûmet  
 rûxandin  
 rûreşîy  
 rûtanewe = şêlandin  
 rûkêşî  
 roşitinî = herikîn  
 robîheman = sakoyê şuştinê  
 rojû  
 roşenbîr

### KIRDKÎ

rûveten  
 rûweşonayen  
 rûwenayen  
 rûmiten: ajotin  
 rûçeke  
 ronayen = danîn  
 roniştin = rûniştin  
 rosnayen = rêkirin, rêşandin  
 roveten = şirove kirina mijarê

22 - Bi alîkariya daçeka <SER> virastina peyvân. Demak ev daçek tê pêşiya peyvân, yan jî, peyvên bi vê daçekê tîn virastin wateyek serdestî, pêşberî, pêşangî û pozîtîv distîne.

### KURMANCÎ

ser + .....  
 seratir  
 serbajêr

	serbest	
	serderî	
	serkeftin	
	serfiraz	
	serokwezîr	
	sermaye	
SORANÎ		
	sersurman	= heyran hîştin, heyîrî man, (fasînation)
	sercem	= bruto
	serqab	= devxûn, qapax
	sertaş	= berber
	serokayetî	
	sermayedar	
	serkewtin	
KIRDKÎ		
	sernayen	= sernan, serdanîn, girtin
	serva	= ji ber, seva
	serpernayen	= sera pirîn, sera firîn
	serbestîyê	
	sermîyan	
	pêser	
	serbar	
	seracêr	

23 - Bi alîkariya daçeka hevgîn <TÊ> virastina peyvên Kurdî.

Ev daçekek hevgîn e. Ji daçeka “di” û peykar tewangê pêk tê Mînak : di + wê = tê. Wateyek di nav de, kirina nav tiştek dide peyvan. Mînak: “tê de kir.” Di zarava Kirdkî de delometa pêşgînên “pê” û “vê” jî hildigire ser xwe.

#### KURMANCÎ

tê + .....	têkilandin	
	têkilav	= hatî tevdan

têde  
têkilî  
têxistin  
têwerdan  
têdan

### SORANÎ

têkewtin  
têgîhîştin  
têkirdin  
têkûşîn  
têdan  
têkçûn

### KIRDKÎ

a-  
têde  
têdest  
têlewe  
têmîyan  
têjer

b- Di wateya pêşgînên “vê” û “pê” de  
têkewten = (pê) vêketin  
têbirnayen = vebirîn  
têgeyrayen = pê gerîn, lê gerîn  
têver kerden

24 - Bi alîkariya berlêkera <VE> virastina peyvan. 1- Navê wê li ser e, berlêker, tim tê ber lêkeran û wata wan diguherîne. 2- Wateyek dirêjbûnî, vekirinî, belavkirinî, rehetiyekî û kurahiyek dide peyvan. 3- Wata peyvan xurt dike. Ev di zaravan û devokan de cihê cihê tê bikaranîn.

### KURMANCÎ

ve + .....  
vebirî  
veger  
vedan  
vera  
veşart

a + ..... vexwarin  
 vemirîn  
 anda bû (devokî ye, Dep)  
 axwar (devokî)  
 alastin

### SORANÎ

a- Di vî zaravê me de çawa ku me pêş de jî, gotibû, dengê “v” nîne, cîhê wê de “w” tê bikaranîn.

b- Ev berlêker tê paş lêkeran û dibe paşlêker.

kirdinewe = vekirin  
 giranewe = vegeirîn  
 xwardinewe  
 rijandinewe  
 şandinewe  
 pêçanewe

### KIRDKÎ

a- Di cîhê “ve” de wek Soranî “we” tê bikaranîn.

wedayen = veşartin  
 wekerden  
 weonten  
 weranden = kêşandin  
 wereznayen = rakirin, verazandin

b- Di cîhê “ve” de “a” dihê bikaranîn

(aw) abîyayen = vebûn  
 (aw) akerden = vekirin  
 (aw) asayen = xuya kirin, vexuyan

## II- BI ALÎKARIYA PAŞGÎNAN VIRASTINA PEYVAN

1 - Paşgîn yan jî, paşgira zayendê:

Di Kurdî de paşgîna zayendê heye û ev nîşanek zimanê Kurdî ye. Di hinek zaravan de wenda bûye, di hinekan melûl û hinekan de jî, bi dewlemendî dihê bikaranîn. Di nava hevokê,



yan jî pevgirêdana du gotinan de, li pêş temamkarê û di tewanga navan de dihê bikaranîn.

I - Di pevgirêdana peyvan, li pêş attrîbûtê de bo nêr <ê> bo heyiyên mê jî <a> ye, li hinek herêman <ê> wek <e> tê bilêvkirin. Mînak:

jina min, bizina kol, manga sor,  
cînîya to, veyvika rindek.  
mêrê / mordemê min, beranê wî, gayê sor.

II - Di tewanga bangê (Vokativ) bona heyiyên nêr <o> û bo heyiyên mê jî <ê> tê bikaranîn. Di hemû zaravan de wek hev e. Mînak:

lo Heso  
lê Bêrîvanê  
Zafmariya (piranî) tewanga bangê bi alîkariya paşgîna <ino, no> tê virastin.

Mînak:

yewmarî	zafmarî
lo Heso	Hesenino
lê keçikê	Keçikino

Di hinek zaravan de tenê bi alîkariya peyva <gelî> tê çêkirin

lo Heso	gelî hesenan
lê keçikê	gelî keçikan

III-Li pey zayenda ne xuya bo heyiyên nêr <î> bo heyiyên mê jî <ê> tê bikaranîn.

Mînak:  
Mêrekî, jinekê.  
wî, wê, ayî. ayê

IV - Paşgîna îzafê bi gelemperî <ê> gelek kêr jî <î> ye.

Mînak:

Kurmancî	Kirdkî	Soranî
darê xizagê	darê xizagî	darî gelîskeke

bizina cîranê

biza cîranê

bizinî dirawse

### KURMANCÎ

Di Kurmancî de zayend bi bingehî runiştîye, dema ku yek bê zayend baxive, jê rind nayê fêmkirin, biyanî xuya dike. Bo Kurmanciyek zelal, divê zayend bê bikaranîn.

a- Zayenda xuya, yan jî, zayenda pevxistinê,

Heyiyên nêr

serê min

nêriyê belek

hevalê min

bavê min

gayê min

darê sotinê

çemê firatê

Heyiyên mê

eniya min

bizina kol

hevala min

meta (ika) te

manga / çêleka min

dara sêvê

kaniya / kehniya we

b- Zayenda nexûya

I - Awayê fire û rast.

serîyekî gir

nêriyekî, bi stur

hevalekî gernas

bavekî bihêrs

gayekî bor

II - Awayê kurtkirî

serîkî

nêrîkî

hevalkî

bavkî

gakî

enîyekê fire

bizinekê, gobel

hevalekê bedew

metekê rind

mangekê gewez

enîkê

bizinkê

hevalkê

metkî

kanîkî

c- Di piranîyê de

I - Zafmariya zayenda xuya

ne tewangî

seriyan

bizinan

tewangî

seriyên gir

bizinên kol

metikan

bavan

II - Zafmariya zayenda nexûya

serîn

nerîn

bizinîn

gayîn

metikên rind

navên rind

serînê

nerînê

bizinînê

gayînê

### SORANÎ

Di vî zaravê Kurdî de zayend wenda bûye, qet nayê bikaranîn, tenê awayek peykarê (îzafê) <î>, <ê> bo hemû zayenda tê bikaranîn. Û çend bermayî mane. Mînak:

pîremêrd, biralê, mamê

pîrajîn, xwuşkala, pûra (met)

Di Soranî de wisa tê bikaranîn. ji bona herdû zayenda jî, <î> tê bikaranîn.

a- Zayenda xûya

I - Bi alîkariya paşgîna <Î>

Heyiyên nêr

pîyawî min

şarî Misrê

Kurî wî

şîrî xom

Hakîmî Helebê

Heyiyên mê

jinî min

xuşkî min

lîbasî dewrêşiyê

daykî Misto

kîtabî Zimanî Kurdî

II - Bi alîkariya dengê <ê> bi piranî pêyvên zayenda mê bi vê paşgîne tê virastin ev jî, tê vê wateyê bi kêmî be jî, bêhna zayendê ji vê zarava me tê.

jinê meleksayê

malê xom

qesrê xo

dakê xoy

dîwanê petrusay kiçî mamî wî

III - Di devoka Mukrî de tewîneka (kasus) xwedîtî (genitiv) bi alîkariya paşgînek wusa <de> tê bikaranîn. Awayek wê jî, di

## Kurmancîya Bahdinî û Hekarî de heye

Mukrî  
fêl û feracî dê piyawî  
muxtarî de dîwanê  
çawî de min  
piyawî de paşa  
dakî de henarê

Kurmancîya Bahdinî  
fêl û feracêd mêrik  
muxtarêd dîwanê  
çavêd min  
merivêd paşa  
dayîkad henarê

b - Zayenda ne xûya  
piyawekî gernas  
jinekî Kurd  
gurgekî har  
biryarekî wa girîng  
lêkolîneweyekî zanistî  
kiçekî Kurd fêrdibe  
duwarekî xanû rûxa  
destekî ew şika

### KIRDKÎ

Di vî zaravê me de zayend gelek dewlemend e, Hema bigire  
bê zayend nabe, lê di hinek devokên vê zarava me de jî, zayend  
melul bûye. Mînak devoka Çewlîgê û Pîranê.

Li pey navan yan jî, li ber temamkar, zayenda pevgirêdanê.

a - Zayenda xûya  
zayenda nêr  
darê min  
piyê min  
kemerê girs  
mordemê to  
gayê sur

zayenda mê  
dara say (sêw)  
waya min  
weleya sur  
jina to (cînîya to)  
manga sur

b - zayenda nexuya

I- Bi alîkariya <ek>

mordemekî  
beronekî  
arwêşekî

çêneyekê  
bizekê  
mêrgekî

II - Bi alîkarê ya <yew, jû> û wendabûna <k>  
yew (jû) reyê  
yew çîyê  
gayê (gaê)

III - Bi alîkariya paşgîna <ede>  
darêdi / o min                      bizade / bizêde kole  
darode min  
mêrdêde to                      jinêde to  
nonêde serd                      wayêde rindekê

IV - Bi ketina tîpa <k>  
rozê (k)  
cayê (k)

c - Daçek jî paşgîna zayendê digire  
mordem ro                      çênekê ra

d - Lêker jî, di lêparîna deme nonaya keştiya sêyemîn de  
paşgîna zayendê digire  
o yêno                      a yêna  
o sono                      a sona

### III- DI ZARAVÊN DIN DE PAŞGÎNA ZAYENDÊ

#### BEXTIYARÎ

Her çiqas ji werêça Farsî zayend bi piranî miribe jî, (ji ber kû Kurdên Bextiyarî wek Farisan şîî nin têkiliyên wan gelek germin) dîsa cîh bi cîh hîn paşgîna zayendê dijî.

yu                      = wî  
yuna                      = wê  
kara dures

merdê qesan  
Kurê Xusên  
genduma vas = tasik genim

### FEYLÎ

Ev zaravê me hîn bêtir di hîkarîya Farsî de maye. Zayend miriye, lê dîsa jî, di çend gotinan de xuyaye.

a - zayenda mê  
bala vala  
zî mala diroma  
hef serkirda desê

b - zayenda nêr  
menzîlê evel  
payê kuwê kever  
kurê waliyê serdar.

### GORANÎ

Her çiqas di nav zaravên başur de hinek zayend di vê zarava me de xuya ke jî, di nav hevokê de bi piranî vemiriye. Di nav hevokê de yan nayê bikaranîn yan jî, tenê <ê> tê bikaranîn.

Di bernavên kesani de

ad luwan                    = ew diçe (wî)  
ade luwana                 = ew diçe (wê)

Di nav hevokê de

I - Zayenda xuya  
Kur-u şuwane  
kinaça-u şuwane  
giloko-î taze-î Leyl = gora Leylêya teze (nû)  
berê şehri  
des wîş  
wuştirê te  
barê wuştîrey

neferî şîkerwan  
salaê bax

II - Zayenda nexuya  
piyayekê  
genimekî  
genimê  
yê Tirkî  
yê piyayî  
yê jenî

2- Bi alîkariya paşgîna zafmariyê (pirehêjmar) virastina peyvvan

Di Kurdî de paşgîna zafmarî bi bingehîn <an> e. Ev jî gelek zelal e ku di dema tewangê de tîpên dengdêr nerm dibe. Mînak <a> dibe <ê> carcaran jî, dibe <î>. Bê vanan di hinek zaravan de deng tên xurtkirin û dibe <kan, akan>. Dîsa di hinek zaravan de peyva zêdetiyê „gelî,, bi kurtî wek paşgîna zafmarî tê bikaranîn, yan jî dibe jî, Farisî hatibe, <gel>. Bê vanan gelek caran li gelek herêman tîpa lal <n> dikeve. Demak em giştî tov bikin bi tev hevî ev in: —î, —a, —n, —în, —an, —kan, —kanyan, —gel (yel).

### KURMANCÎ

Di Kurmancî de bi bingehîn <—an> tê bikaranîn, lê di hinek navçan û devokan de <n> dikeve û <a> nerm dibe dibe <î>.

I - Paşgîna zafmarîya bingehîn

netewangî	tewangî
hespan	hespên sor
mêran	mêrên Kurd
jinan	jinên Kurd
daran	darên gund
bizinan	bizinên me

II - Ketina tîpa <n>  
a - ne tewangî

Rastî	bê tîpa <n>
jinan	jina çî kirin
mêran	mêra nan xwarin,
keran	kera bar avêtin.
beranan	berana bifiroşe.
daran	dara nesotîne.

b - tewangî	
jinên gund	jinê gund
pezên me	pezê me
çêlekên me	çêlekê gund
zarên me	zarê me

III - Hem tîpa <n> dikeve hem jî <ê> dibe <î>.

a - Li gelek navçan

Rast	bikaranîna bê <n> û bi <î>
heft mêran	heft mêrî
gelek Kurdan	gelek Kurdî
neh jinan	neh jinî
bi çel bizinan	bi çel bizinî

b-Bêrtî yên tên zozanên Bêhngul û Şerevdîne dema ku zafmariyê bi kar tînin, hem <n> yê davêjin û him jî <ê> dikin <î>

Rastî	Devokên Bêrtîyan
pezên me	pezî me
nanên wan	nanî wan
miyên sor	mîiyî sor
mastên miyan	mastî miyan
berxên me	berxî me

IV - li hinek deveran dema ku paşgîna piraniyê tê tewandin, yan jî di tewanga xwedîtiyê de paşgînên wek <êd, êt> jî tê bikaranîn.



Mînak:

Rast

Bi <êd> û <êt>

hespên wan  
merivên maqûl  
xulamên min  
hozanên Kurd

hespêd wan  
merivêd maqûl  
xulamêt min  
hozanêt Kurd

### SORANÎ

Di vî zaravê me de paşgînên zafmariyê dihên bikaranîn ev in: <an>, <akan> û di tewangê de dengê <a> tenê di devoka Mukrî de nerm dibe.

I - Bi <an>

ne tewangî  
pîyawan  
aspan  
jînan  
bizinan  
kiçekan

tewangî  
pîyawanî Kurd  
aspanî sur  
jînanî Kurd  
bizinî me  
kiçekanî me

II - Bi <akan>

ne tewangî  
darekan  
dirawsekan  
dolçekan  
hevrêyekan  
mindalekan

tewangî  
darekanî min  
dirawsekanî to  
dolçekanî dar  
hevrêyekanî gerîla  
mindalekanî Kurd

III - Devoka Mukrî de  
Xwendekarêd Kurd  
piyawêd Paşa

### KIRDKÎ

Di vî zaravê me de paşgîna <an> (carcaran <n> dikeve), <ê> û carcaran jî <î> tê bikaranîn. Ev tê vê wateyê, bi piran di

awayê tewangî de tê bikaranîn, lê tîpa zafmarî <n> dikeve.

I - Bi <an>

kalikan

Mêrxasan

dismenan

lingan

qiloçan

II - Tewangî

Beron lingên xo şa erd.

Qiloçên xo kê berz.

III - Wek Soranî bi <akan>

ne tewangî

tewangî

xizmekaran

xizmekaranî xo

lajekan

lajekanî Kird

IV - Bi <ê>

darê (ey)

darên xizagî

bizê (ey)

bizên cîranan

çimê (ey)

çimên min

şanikê (êy)

şanikên ma

v - Wek Bêrtiyan

darî

bizî

çimî

ARDELANÎ (SINE)

Di vî zaravê me de wek zaravên navîn ev paşgîn zafmariyê  
tên bikaranîn <kanyan>, <gel>

I - Bi piranî demak navên gelen yan jî navên malbatan tên  
bikaranîn <gel>

Kurdgel

= Kurdan

Farsgel = Farisan  
Memgel = Meman

II - Bi <kanyan>  
darkanyan  
pirtûkanyan  
hewrkanyan  
şerekanyan

### GORANÎ

Bi tevhevî wek Soranî û zaravên navîn e.

I - Bi alîkariya paşgînên —an, —ekan  
bi —an                      bi —ekan  
baran                        barekan  
dukanan                    dukanekan  
heşan                      heşekan  
pîyan                        pîyakan  
yanan                        yanekan (cih guhertina <h> û <y>,  
ango=hane)  
zarûwan                    zarûwekan

II - Wek zaravên navîn (Bextiyarî) bi —gel, —yel yan jî bi  
ketina <g> û <y> —el  
Îsfahanyel (gel)        Îsfahanel  
çîamyel                    çîamel  
pergel                      perel (per)  
denonyel                  denonel (didan)  
levyel                      lêvel  
solyel                      solel (sal)

III - Di çend gotinan de jî —et heye.

mîwacet                  (mêywe, fêkî)  
alwet                        (pale)

3- Bi alîkariya paşgîna nîrxandinê, yan jî beranber kirinê virastina peyvan. Di Kurdî de paşgînên nîrxandinê ji hev ne cûda ye. Hima bigire di hemû zaravan de yek in. Ew jî ev in : —tir, —der , —tirîn

#### KURMANCÎ

Peyv	nirxa çê	nirxa çêtir
delal	delaltir	delaltirîn
rind	rintir	rintirîn
berz	berztir	berztirîn
sor	sortir	sortirîn
gir	girtir	girtirîn
nerm	nermtir	nermtirîn

Nîrxandina fireh  
herî delal  
herî rind  
herî sor  
herî berz  
herî nerm

#### SORANÎ

gewre	————	gewretirîn
çak	————	çaktirîn
xoşewîst	————	xoşewîstirîn
sard	————	sardtirîn
sur	————	surtirîn
barîk	————	barîktirîn
kon	————	kontirîn

Nîrxandina fireh  
herî gewretirîn  
herî çaktirîn

herî xoşewîst  
herî sard  
herî sur  
herî barîk  
herî kon

### KIRDKÎ

I -

rind	——	rindero
serd	——	serdero (sard)
weş	weştir	——
girs	girstir	——
berz	berztir	——
rew	rewtir	——
barik	bariktir	——

Nirxandina fire  
zaf rindo  
zaf serdo  
zaf weşo  
zaf girso  
zaf berzo  
zaf rewo  
zaf barîko

4 - Bi alîkariya paşgîna biçûkirinê virastina peyvan. hema bigire di hemû zaravên Kurdî de yek in. Ew jî, ev in : —**ik**, —**ok**, —**kok** û nermkirina wan —**ox** kû wateyek delometî li peyvan bar dike

a- di wateya biçûkirinê de

### KURMANCÎ

I - Bi —ik

berx	berxik
kar	karik
mal	malik

dar                    darik  
berx                  berxik

II - Bi —ok

zarû                  zarok  
gêj                    gêjok  
bîhn                  bîhnok (bêhnok)  
mêj (mît)            mêjok  
gilor                  gilok

III - Bi —kok

mêr                    mêrkok  
jin                     jinkok  
mal                     malkok

IV - Bi —onek

tirs                    tirsonek  
bizd                    bizdonek  
qûn                     qûnek

SORANÎ

I - Bi —ik

goweç                goweçik  
lût                     lûtik  
ges                     gesik  
mişar                mişarik  
text                    textik

II - Bi —ok

tirs                    tirsînok  
bez                     bezok  
turp                    turpok  
xilîs                  xilîsok (xîşkirin)  
tîr                     tîrok (lox)

## KIRDKÎ

### I - Bi —ik

leyr	leyrik
boxe	boxik
sêw	sêwik
fîn	fînik
dar	darik
bir	birik

### II - Bi —ok

dar	darok
gêj	gêjok
mirîç	mirîçok
nêr	nêrok

### III - Bi —kok, —ek

mirîç	mirîçkok
laz	lazez
keyna	keynek

b- Di wateya pîşe, delomet û kargûzarî de bikaranîna paşgînên —ok, —ox, —ek, ev paşgîn li gel wateya biçûkirinê, bi piranî kar, kirin, kargûzarî û karektera kesek yan jî, tiştek dide xuyan. Mînak:

kenok, virek, tirsonek ûwd.

Gelek zelal e ku di zimanê me de gelek caran <k> û <x> cîh diguherin.

Mînak:

I - Di peyvên Kurdî de

kap	xap
kefî	xefî
kûrîn	xûrîn
nebanok	nebanox ûwd.

II - Di peyvên bîyanî de  
 bardak            bardax  
 çirak             çirax  
 çatlak            çatlax ûwd.

Çawa ku ev mînak jî, dide xuyan bi dîtina min paşgîna <—ox> veguheztinek paşgîna <—ok> e. Hinak kesên Kurdî dinivisînin, gelek caran di cîhê paşgîna <—kar> de <—ox> bi kar tînin.

Mînak :  
 wendekar            wendox  
 xwendekar            xwendox

Dîsa veguheztinek vê yê din heye ew jî <—êx> e. Lê pir kêmtê bikaranîn.

Mînak:  
 gur                    = gurox                = gurêx  
 werd                  = werdox              = werdex

#### KURMANCÎ

Bi—ok	bi—ox	bi paşgînên din
babelîsok	babelîsox	babelîsk
rêkirok	rêkirox	peywîr
behecok	behecox	
devkenok	zimanlox	
metelok	metelox	
_____	xwendox	xwendekar / xwendewan
borandok	borandox	

#### SORANÎ

xilîsok	xilîsox	= xîşkirin
turpok	turpox	
_____	xembenox	



———— barudox

### KIRDKÎ

nuştox	= nuştkar, niviskar
arekerdox	= arekerdkar
persayox	= persayar
remayox	= revok, remdar
resayox	= resaykar, rastêbûn
rotox	= rotkar, froşkar
ardox	= ardar

5 - Bi alîkariya paşgîna radêr (mesder, invinitivum), yan jî lêkeran dike rewşa radêr, virastina peyvên. Di Kurdî de ev paşgîn bi bingehîn <—n> e. lê awayên wê yên fire jî, gelek in, gişt bi hev re ev in: —n, —in, —în, —an, —en, —îyan, —yen, awayê dankirinê jî, ev in: —tin, —andin, —din, —nayen, —yayen. Bê vanan hinek îdîa û rikên bê bingeh û nezan jî hene, ezê wan di bin sernivsa wan zaravan de zelal kim . Ezê li vir tenê çend mînakên bidim. Agahdarîya zêde çewak min di hevoka pêş de jî nivisî, ezê di bin ser nivsa lêkeran û wan zaravan de bidim.

6- Ev jî paşgînên <AR , ER> yên karguzariyê ye. Bi piranî peyvên bûyînek , kiryarek yan jî, cîh û awayek dide xuyan.

### KURMANCÎ

Bi —ar	bi —er, —êr
azar	bender
zengar	karêr
bîwar	bûyêr
fîzar	gelêr
fîkar	raker

### SORANÎ

parêzar	nêrer
komar	bizwêner (Motor, gerende)

wutar	rifener
gotar	awazdanêr
	palnêr

### KIRDKÎ

aspar	asmêr
destar	dengeser
goşar	kemêr
anasar	meqeşer
asarend	

7- Paşgîna <VAN, WAN> tenê wateya karguzarî, delomet û huneriyê li peyvan bardike. Di zimanê mede gelek bi dewlemendî, bo kargûzariyên, panêrî û karên heyyên jîndarî tê bikaranîn. Mînak: mirov nikane “cotwan” bivêje, lewra cot ne jîndar e. Lê mirov dikane “gavan” bivêje, ga jîndar e.

### KURMANCÎ

lûlvan	berxivan
gavan	golikvan
qanzwan	karwan
bêrîvan	bilûrwan
tembûrwan	bajarwan

### SORANÎ

Daniştwan	baxwan
destwan	pasewan (noker)
çêşwan	firokewan
melêwan	

### KIRDKÎ

Arêwan	karwan
gawan	sedwan
bêrîwan	lecwan

8 - Paşgînên <KAR>, <GAR, GER> wateya; hunermendî, karguzarî û delometiyê li peyva bar dike.

### KURMANCÎ

hesinkar	dozger
cotkar	yadîgar
peyvkar	parêzgar
dadkar	pingar
êrişkar	
bestekar	

### SORANÎ

dawekar	asingar
kirekar	cadugar
derwazekar	parêzgar
amûjkar	tîwekar (doxtorê şîrurgî)
niwêjkar	
xawênkar	

### KIRDKÎ

danişkar	asinkar
dawekar	gunekar
wendekar	efkar
heweskar	koşkar

9 - Paşgîna <BAZ> ji lêkera werzişê, yanê bazdanê tê. Wateyek hunermendiya taybetî, yan jî, livbaziyeke taybetî li peyvan bar dike.

### KURMANCÎ

cambaz	tîrbaz
serbaz	pencebaz
sêrbaz	çenebaz
livbaz	fêlbaz

## SORANÎ

gelembaz	tenefîbaz (akrobot)
serbaz	sêyrbaz
çenebaz	rêbaz (destur, tîzîk)
telekebaz (gêj)	

## KIRDKÎ

embaz	canbaz
dumilbaz	sêrbaz
deyîrbaz	pirenbaz

10 - Paşgîna <MEND>. Ev paşgîn wateyek pisporî û hunermendîyê li peyvan bardike.

## KURMANCÎ

hunermend  
aqilmend  
karmend  
dadmend

## SORANÎ

karmend  
heşmend  
taybetmend  
hunermend  
zamawend

## KIRDKÎ

aqilmend  
beremend (hêca)  
hermend  
sekmend  
hunermend

11- Paşgîna <YAR> wateyek hezkirinê û dostanîyê li peyvan bar dike. bê daçeka nayînê tim di wateya pozitiv de ye.

## KURMANCÎ

destyar	zanyar
dadyar	bextîyar
biryar	bîryar
balyar	neyar
şîyar	dilyar

## SORANÎ

cutyar	pêşnîyar
nasyar	endezyar
biryar	mafyar
dadyar	kiryar
kirîyar	

## KIRDKÎ

heşîyar	dîyar
gulîyar	hevîyar
sadiqyar	heqîyar
neyar	hetyar

12 - Paşgîna <DAR> li gel wateya karguzarî û karmendî wateyek kirinê, domandinê, raydayîn rewşek jî, li peyvê bardike.

## KURMANCÎ

deyndar	oldar
birîndar	jîndar
agahdar	guhdar
baldar	serdar
hêvîdar	sîdar
domdar	û . hwd.

## SORANÎ

rêşandar	bondar
beheredar	nawdar

çekdar  
pêjdar  
sedefkar

berhemdar

### KIRDKÎ

birîndar  
sipêdar  
goşdar  
hukumdar  
qilêdar

cindar  
deyndar  
domdar  
çekdar

13 - Paşgîna <BEND> li gel wateya bestinê (girêdanê)  
wateyek hunermendî û kirina tiştê li peyvê bar dike.

### KURMANCÎ

pazbend  
dorbend  
sazbend  
berbend

hevalbend  
qesîrbend  
pêşbend  
şabend

textebend  
siyabend

### SORANÎ

sazbend  
melbend (metropol)  
arêzebend  
berbend  
nalbend

### KIRDKÎ

bazbend  
dolbend  
lûlbend  
sazbend  
nalbend

14 - Paşgîna <BAR, BER> li gel wateya delometî wateyek, lêpayîn, berçavî, aşîkar, giranî û têkiliyê li peyvan bardike.

### KURMANCÎ

hevbar	razber
serbar	navber
debar	rencber
dîtbar	agirber
berbar	ajneber

### SORANÎ

karûbar	şalewber
xanûbar	pênaber
tewanbar	nameber
supasbar	peyamber (misyoner)

### KIRDKÎ

serbar	asnever
debar	çarber
	kember
	rayber
	rencber
	çêber
	çember

15 - Paşgîna <SAR, SER> li gel wateya negativi hinek jî wateya pêşangî û ser rastî li peyvan bar dike

### KURMANCÎ

dilsar	evser (tac çelenk)
hevsar	navser
rûsar	rada ser (êriş)
cansar	seranser
xwînsar	destbeser

## SORANÎ

xwensard

## KIRDKÎ

gonîsar  
hewsar  
pankisar

paser  
peyser  
pêser

16 - Paşgîna <ÎN> bi zêdeyî li pey rengdêran dihê bikaranîn û wateyek şeweyî û druvê wê peyvê dide pejirandin, û şidandin.

## KURMANCÎ

nermîn  
girmîn  
germîn  
darîn  
zêrîn  
çilmîn  
şîrîn  
berfîn

arîn  
jarîn  
korîn  
zîvîn  
germîn  
talîn

## SORANÎ

supasîn  
şermîn  
yekemîn  
gewreyîn  
barîkîn  
duwêmin

nermîn  
kokîn (bînîn)  
sarîn (balîf)  
berzîn

## KIRDKÎ

yewîn  
revîn  
rindikîn

darîn  
jarîn  
nermîn



adirîn	talîn
janîn	nalîn
rikîn	

17 - paşgîna <GÎN> wateya peyvê xurt dike, hevgirêdayînek dide xûyan, berdomîya karekî nîşandide.

#### KURMANCÎ

renggîn	=rengîn
cenggîn	=cengîn
zinggîn	=zingîn
lezzgîn	
fêrgîn	
hevgîn	
navgîn	
belggîn	=belgîn

#### SORANÎ

rengîn  
lezzgîn  
sengîn (cistî, disîplîn)  
cengîn  
nawgîn

#### KIRDKÎ

bargîn  
çingîn  
qilêjgîn  
rengîn  
suringîn  
velgîn  
vengîn

18 - paşgîna <JÎN> jî wekî —în û —gîn wateyek karakterkirina rengdêran li peyvê bar dike û wateya wan dide xurtkirin.

### KURMANCÎ

germ	germijîn
nerm	nermijîn
rêx	rêxijîn
şîr	şîrejîn

### SORANÎ

şîtît	şîtîtijîn
germ	germijîn
katand	katandijîn (wek evdal)

### KIRDKÎ

karm	karmijîn
rêx	rêxijîn
germ	germijîn

19 - Paşgîna >GAZ> pir kêma tê bikaranîn, wateyek rewşê û karmendî li peyvê bar dike.

### KURMANCÎ

belengaz  
denggaz  
gerdengaz

### SORANÎ

belengaz  
asingaz

### KIRDKÎ

belengaz  
asingaz  
engaz

20 - Paşgîna <ZAR> gelek kêma tê bikaranîn bi xwe di

wateya dev de ye. Li pey rengdêran tê bikaranîn. wateyek di rewşa wê rengdêrê de bûyîne li peyvan bardike.

### KURMANCÎ

çîmenzar  
dengzar  
zarezar  
şermzar

### SORANÎ

şermzar  
zarezar

### KIRDKÎ

zarezar  
şermzar

21 - Paşgîna <STAN> wateyek cîgehekî fireh, qadek û warê komek li peyvê bardike, bi xwe di wateya, welat, xak û cîgehek fireh de ye. Bi vê paşgînê piranî navên welatan tê virastin.

### KURMANCÎ / SORANÎ / KIRDKÎ

Di navê welatande	navê cîh û qadan de
Kurdistan	gulistan
Afganistan	goristan
Hîndistan	daristan
Hermenistan	zivistan
Rumenîistan	filistan
Tirkmenistan	kevirîstan

22 - Paşgîna <DANG /K> wateya kurahîyê, calîyê, yan jî, cîgehiya biçûkî li peyvan bar dike. Wateyek we yê din nîne. Hin kes vê paşgînê di wateyên din de bi kar tîne, mînak <paşdang /k> yanî di wateya paşgînê (paşgir) de bikartînin, lê

ne rast e, paşgîn (sufix) ne calî ye ne jî, kurahî ye.

### KURMANCÎ

xwêydang / xoydang /k  
çaydang /k  
avdang /k  
guldang /k  
xibirdang /k  
peldang /k  
xwelîdang /k  
şîrdang /k

### SORANÎ

çaydan /g  
guldan /g  
agirdan /g  
paldan /g

### KIRDKÎ

çaydang  
guldang  
gulvang  
awdang  
soldang

23 - Paşgîna <XANE> wateyek cîgeha bi dîwara vebirî, maxî û odegehiyê li peyvan bar dike. Peyv bi xwe peyvek Êranî û di wateya avayî û mal de ye, di hinek zaravan de dengê <x> xwe veguheztiye <y> û <h>

Mînak :

Goranî; yane =xane.  
Bextîyarî; hune (hone) = xane.

### KURMANCÎ

çayxane

pirtûkxane  
dersxane  
karxane  
barxane  
nexweşxane  
selexane

## SORANÎ

dermanxane  
nanewexane  
pirtûkxane  
balwêzxane  
qehwexane  
şetxane  
çêştxane (loqanta)  
wanexane (dersxane)  
têrxane (kêler)

## KIRDKÎ

kutûpxane  
avdêstxane  
barxane  
cebilxane  
berberxane  
qehwexane  
dersxane.

24-Paşgîna <GEH, GAH> wateyek cigehiya karek,  
livbazîyek û bûyînek li peyvan bar dike.

## KURMANCÎ

çêregeh  
bingeh  
rêgeh  
sengergeh  
sungeh

dergah  
seyrangeh  
baregeh  
xwendegeh  
dadgeh

### SORANÎ

Di vî zaravê me de bi piranî dengê <h> nayê bikaranîn. ango tê daqulandin.

dadge /h  
rîwange /h  
pange /h  
karge /h  
nusînge /h  
tepolge /h (lodkirin, nijinandin)

### KIRDKÎ

dergah  
sêrangeh  
wendageh  
rayêgeh  
waregeh

25 - Paşgîna <NAME> wateyek belgehî li peyvan bar dike.

### KURMANCÎ

Nasname  
bawername  
biryarname  
belgenome  
ajotname (ehlîyet)  
destûrname

### SORANÎ

belgenome  
sanugîname

berwaname  
ahengname  
supasname  
bername

## KIRDKÎ

belgename  
bawarname  
nasname  
desturname

26 - Paşgîna <Î> wateya zimanek, giştî û asûmanî li peyvan bar dike.

I - Di wateya zimanê gelan de

## KURMANCÎ / SORANÎ / KIRDKÎ

Almanî  
Tirkî  
Farisî  
Erebî (Herebî)  
Grêkî (Yewnanî)  
Rusî (Urisî)

II - Di wateya giştî û asumanî de.

## KURMANCÎ

ezman	ezmanî
mêr	mêranî
dem	demî
av	avî
şev	şevî
kor	korî
germ	germî

## SORANÎ

raman	ramanî
-------	--------

bandor	bandorî
bijîşk	bijîşkî
çêşdar	çêşdarî
dilpês	dilpêsi
asuman	asumanî
mang	mangî

## KIRDKÎ

nêweş	nêweşî
ard	ardî
hewr	hewrî
ageyray	ageyrayî
asme	asmî
mang	mangî
agist	axistî

27 - Paşgîna <KÎ> li gel nîşandina zimanan, şêwe, tevger û helwesta kesek yan jî, komek dinirxîne, wateyek nexuya û asûmanî jî, li peyvan bardike. Bi zêdeyî li pey peyvên bi tîpek dengdêr qedyayî tê bikaranîn, wekî din gelek kêma tê bikaranîn.

I - Li pey peyvên bi tîpek dengdêr qedyayî û nîşandayîna zimanan .

## KURMANCÎ / SORANÎ / KIRDKÎ

Ermenîkî  
Cihûkî  
Elenîkî  
Lazkî  
Urdukî  
Paşdokî

II - Di nirxandina şêwe, tevger û helwesta kesek û komek de.



KURMANCÎ / SORANÎ / KIRDKÎ

kes	komek
Hesokî	Almankî
Husokî	Herebkî
fatokî	gondîkî
berberkî	xortankî

28 - Paşgîna <ANÎ> , <KANÎ , GANÎ> wateyek kirin, asumanî, şeweyî û sîrusta kesek yan jî komek li peyvê bar dike.

KURMANCÎ

kuçik	kuçikanî
kor	koranî
tewş	tewşanî
ker	keranî
mêr	mêranî
Tirk	Tirkanî
jin	jinanî

SORANÎ

kiçek	kiçekanî
kurek	kurekanî
gul	gulanî
gulbax	gulbaxanî
çewe	çewekanî

KIRDKÎ

kor	koranî
kutik	kutikanî
lez	lezkanî
pey	peykanî
şaş	şaşkanî
tewş	tewşkanî

29 - Paşgîna <TÎ> jî cîgirê —î, —kî û —anî ye di zaravên

din de zêde nayê bikaranîn, lê di Kurmancî de gelek caran tê bikaranîn.

### KURMUNCÎ

heval	hevaltî
ker	kertî
mêr	mêrtî
jin	jintî
zarok	zaroktî
cîwan	cîwantî
jar	jartî
dîn	dîntî
kal	kaltî
pîr	pîrtî

30 - Bi kêmtî jî be li gelek deveran paşgîna <ayî>, <ahî> jî dihê bikaranîn. ev jî cîgirê —î, —kî, —anî ye.

Mînak:

sorayî	sorahî
berayî	berahî
korayî	korahî
reşayî	reşahî
zerayî	zerahî
talayî	talahî

### IV- BI ALÎKARÎYA LÊKERAN VIRASTINA PEYVAN

1 - Bi koka lêkera xwarin (werden) <WER> kû dengê <X> ketiye, ango rayê lêkera werden (zarava Kirdkî) Di hemû zaravan de bi vê awayê bikaranîn tiştek baş û hesane. Mînak:

xwînxwar	= xwînwer
berexwar	= berewer

### KURMANCÎ

canwer (cinawir)

xwînxwer  
berewer  
berjêwend  
cengawer  
aragwer  
malxwar

## SORANÎ

cenawer  
zendewer  
xwênwer  
berewer  
berjêwend  
cengawer

## KIRDKÎ

canwer  
gonîwer  
kesexur  
cengawer  
eraqwer  
malwer

cinawer

2 - Raya lêkera girtin (gureten) <GIR> wateya vê lêkerê li peyvan bar dike.

## KURMANCÎ

dadgir  
masîgir  
rexnegîr  
dengîr  
beygîr

rêgir  
bargir  
destgirtî  
xemgîr

## SORANÎ

wênegîr

wergir  
bergir  
ragir  
paşgir  
parewergir

### KİİRDKÎ

bargir  
destgir  
destgrota  
magir / mosegir

3 - Bi alîkariya raya lêkera kêşanê <KÊŞ> virastina peyvan

### KURMANCÎ

dûkêş  
govendkêş  
nexşekêş  
serkêş

### SORANÎ

pêşkêş  
wênêkêş  
hewkêş  
serkêş

### KİİRDKÎ

renckêş  
qarkêş  
serKêş

4 - Bi alîkariya raya lêkera kirinê (kerden) <KİR> virastina peyvan.

### KURMANCÎ

şerker

karker  
zêrker  
mîzker  
peyvker

### SORANÎ

peyker  
rêzker  
karker

### KIRDKÎ

keyeker  
mîzker  
payeker

5 - Bi alîkarîya raya lêkera kuştinê <KUJ> virastina peyvan.

### KURMANCÎ

mêrkuj  
arkuj  
jankuj

### SORANÎ

dilkuj  
mirovkuj

### KIRDKÎ

zerkuj  
mêrkuj / mordemkuj

6 - Bi alîkariya raya lêkera nasîn (şînasnayen) <NAS> virastina peyvan.

### KURMANCÎ

dîroknas  
zimanas

civaknas  
Rohilatnas  
Kurdnas

## SORANÎ

stêrnas  
pirtuknas  
torenas  
mafнас

## KIRDKÎ

heqnas  
civatnas

7 - Bi alîkariya raya lêkera gerîn (gerayen) virastina peyvan

## KURMANCÎ

werger  
hesinger  
dadger  
zêrînger

## SORANÎ

werger  
banger  
şoreşger

## KIRDKÎ

kenger  
gonîger  
ganger

8 - Raya lêkera patinê <PÊJ>

KURMANCÎ / SORANÎ / KIRDKÎ  
nanpêj

kulorpêj

9 - Bi alîkariya raya lêkera gotinê (vaten, wuten) <BÊJ> virastina peyvan.

KURMANCÎ  
dengbêj  
dîrokbêj  
çîrokbêj

SORANÎ  
goranîbêj

KIRDKÎ  
dengbêj

10 - Raya lêkera xwastinê

KURMANCÎ  
xêrxwaz  
şerxwaz  
dilxwaz

SORANÎ  
daxwaz

KIRDKÎ  
perwaz

11 - Bi alîkariya raya lêkera zayînê <ZA=ZI> virastina peyvan.

KURMANCÎ

bireza  
xwarza  
mamza  
metza

birarzî  
xwarzî / xwarzîya

SORANÎ

purza  
xaloza  
amoza

KIRDKÎ

dedza  
wareza  
biraza

12 - Raya lêkera şuştinê <ŞO>

KURMANCÎ  
firaqşo

SORANÎ  
firaqşut

KIRDKÎ  
firaqşu

13 - Raya lêkera rijandinê <REJ>

KURMANCÎ  
xwînrêj  
hesinrêj  
avrêj

SORANÎ  
xwînrêj

KIRDKÎ  
gonîrêj /gonîrij  
asinrêj

14 - Raya lêkera maliştinê (pakirinê) <MAL>

KURMANCÎ / SORANÎ / KIRDKÎ  
destmal  
pêştemal  
bermal

15 - Raya lêkera birrînê (birrnayen) <BIRR>

KURMANCÎ  
rêbir  
cobir  
cawbir

SORANÎ

KIRDKÎ  
cimbirr

16 - Raya lêkera zanînê <ZAN>

Mînak :

zimanzan  
nezan  
barzan  
rêzan  
gelzan



## V- BI ALÎKARIYA RENGDEËRAN VIRASTINA PEYVAN

Di Kurdî de gelek peyvên ji peyv û rengdeêrek hatîne virastin hene. Lê ezê ji her zaravekî tenê çend mînakên bidim.

### KURMANCÎ

dilxweş	mêrxas
bextreş	kumreş
cansivik	kumsor
serêş	dilêş
destteng	dilteng
çiftexas	porsor
çavzeng	heftreng
gobel	godirêj
dilpak	rûpak
sergir	devgir

### SORANÎ

zorcar	berîpan
reşbext	xerabmal
pakdil	dilsard
kembîr	çawreş
gwedirêj	bextreş
berîpan	xoşbehn
xoşewîst	nexoş
rengawaz	gulîzerd
sipîdar	dilteng
zarxoş	dilbarîk

### KIRDKÎ

çiftexas	bargiran
fekweş	destteng
destsivik	kêfweş
goşbel	çimsur

çimroşn	nankor
cêrîser	golmostik
sorawike	darsipe
darsoq	dormar
gosirmeti	fgonîweş
nîweş	panjqat

## VI- BI ALÎKARIYA PEYV Û PEYVAN VIRISTINA PEYVAN

Yanî bi girêdana du peyvan virastina peyvan. Ev di Kurdî de gelek in, lê ezê dîsa tenê çend mînanan bidim.

### KURMANCÎ

destnivîsar	avgost
jinbira	avsîr
pismam	dotmam
malbav	cîwar
jinbav	damarî
destbirak	sîremast
amojin	xalojin
tomast	Kurmet
pisxaltî	jintî
destxan	destçêxane

### SORANÎ

destxet	cawberg
darxurme	abrû
demûcaw	melbend
astîaw	roxîderya
mêşmegaz	palemar
fername	demîsal
Pîremêrd	şimşal
desthelat	rojhelat
pisman	dotmam

## KIRDKÎ

dêleverg	destmal
destbirak	solderz
teresbav	vengberz
pismam	dotmam
xalcênîye	serdgerm
serber	destgrowta

## VII- DI KURDÎ DE TEWANGA NAVAN

Di Kurdî de tewang bi alîkarîya îzafê, paşgîna zayendê û daçekan tê virastin. Ji tîpa li attrîbûtê tê zêde kirin re îzafe tê gotin. Di zaravan de îzafe hima bigire yek e, tu cûdahî tune.

Mînak:

KUR.	SORANÎ	KIRDKÎ	GORANÎ
...î, ...ê	...î, ...ê	...î, ...e	...î, ...e
vî hespî	pîyawî	no astorî	banî
vê pirtûgê	dayîkê	na bizê	î espe

### ARDELANÎ (SINE)

...î, ...ê (e)

I - Tewîneka hîmî, yan jî, tewîneka radêr (nomînativ) di vê tewînekê de peyv yan jî, nav tu paşgîn nagirin û naguhezî, di awaya xwe ya bingehîn de dimînin.

KUR.	SORANÎ	KIRDKÎ	GORANÎ
zava	zawa	zama	zama
bûk (bewîk)	bûwîk	veyve	wawî
dil	dil	zere	zîl
dar	dar	dar	dar
gund	dew / gund	dewe	dîya

av	aw	aw	ay /ou
zirav	barîk	barîk	bari

ARDELANÎ (SINE)

zava / zama

weyvî

dîll

dar

dê

aw

ziraw

II-Tewîneka tewangî (akk. oblîgus) hemû peyvên te tewandin, paşgîna îzafê digirn. ev di zaravên bakûr de li nola zayendê îzafê digire. Ji bo heyiyên nêr <î> û ji bo heyiyên mê jî <ê> digirin. Le zaravayên din de ji ber kû zayend mirine. Îzafê jî, tevlihev bûye. geh ..e (ê) geh jî ...(î) tê bikaranîn. Lê mirov rind li ser raweste gelek bi hêsanî divîne ku ew hîn jî, li ser esasê zayendê tên bikaranîn, çend Mînak :

KUR.	SORANÎ	KIRDKÎ	GORANÎ
nêr			
vî zavayî	zawayî / ê	no zamayî	î zamayî
vî camêrî	pîyawî / ê	camêrdî	î şîkarwanî
vî gayî	gayî	gayî	banî
gundî	dewe	dewî	
mê			
vê bûkê	melekê	veyvê	î wewe
vê bizinê	bizinî	bizê	
jinê	jinê	cênîyê	
dayîkê	dayîkê	dakê	

ARDELANÎ (SINE)

zawayê

weyvîyê

III - Tewîneka jê re, yan jî, tewîneka armancê (datîv). Ev tewînek di gelek zaravên Êranî de bi alîkariya ...re, ...ra, ...ro tê virastin. Di zimanê Kurdî de jî, bi bingehîn tê bikaranîn. Lê di zaravên Başûr de kê m tê bikaranîn, di Goranî de bi awayê ...ara, ...era tê bikaranîn. Çawa me pêş de jî, zelal kiri bû, wek berlêker (hoker) jî, tê bikaranîn. di Soranî devokê Mukrî de hîn car car tê bikaranîn lê di devokê Silêmanî de hema bigire nayê bikaranîn. Di devokê Ardelanî de jî, wekî Goranî bi awayê ...ara, ...era lê gelek kê m tê bikaranîn. Ev tewînek ji bo, ji yekî yan jî, tiştêkî re daxwazek kirin, ji bo daxûyana armancek bûyînek bicîhanînê tê bikaranîn. Em niha li zaravan binêrin :

#### KURMANCÎ

(ji) min re (ra)  
pirtûgê re  
ga re  
agir re  
rizgarî re  
mal re  
(ji) dayîkê re

#### SORANÎ

bo min (bom)  
bo pirtûgî  
bo gayî  
bo agir / awir  
bo rizgarî  
bo mal  
bo dayîkî

#### KIRDKÎ

min ra  
kitabê ra  
ga ra  
adir ra  
rizgarî ra  
çê (kê) ra  
dakê ra

#### GORANÎ

be emnî  
be kîlawî  
be wîştedarî  
awirekey ra  
rizgarey ra  
yanekey ra

#### DEVOKÊ NÊZÊ KERMANŞAHÊ

erê bawkim senim = Ez bavê xwe re digirim (distinim)

êwa erey min sen.	= Wî (wê) min re girt (sitand)
erê otaxim	= odê re
erê ga	= ga re
erê agir	= agir re

IV-Awayê xwedîtî yan jî, tewîneka xwedîtîyê (genîtîv), ev tewînek di kurdî de delometa îzafê jî, hildigire ser xwe. Lê gelek zimanzan vê tewînekê wek tewînek napejirînin û li ser ranawestin. Lê bi rastî tewînekek gelek giring û di zimanê me de rolekî gelek mezin dilîze. Yanî mirov bi alîkariya vê tewînekê têdigêhêje ku ew heyî yê kê ye. Ji wê jî mirov dikane jê re tewîneka xwedîtîyê bivêje. Ezê li ser îzafê û zayendê ranewestim, lewra me pêş ve zelal kiribû. Ji zaravan çend mînak:

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
nêr		
gayê bavê min	gayî bawkî min	gayê pîyê min (mi)
xaniyê xalê te	xaniyî (ê) xalî to	çeyê xalê to
agirê mala me	agirê mala ême	adirê çê ma
serê birayê wî	serî birayêt	serê birayê ê
mê		
dara jinika kevanî	darî jînikê	dara cênîya kebanî
bizina jînikê	bizinî jînikê	biza cîniyê
manga me		manga ma
dayîka te	daykît (to)	dayka to
MUKRÎ		
goşê de meydan		bizêde ma
befre de kuwe		
nanê de pîyawî		nanêde mor demî

**GORANÎ**

jinek (î) rahîmî  
wayî dukanekey  
goştê şîkarî

**ARDELANÎ (SINE)**

wek Soranî ye.

V-Awayê di cîh de yan jî tewîneka cîgehî (lokatîv), gelek zimanzanên me vê tewînekê jî, wek tewînek napejirîn. Di serî de Qanatê Kurdo ev tewînek zelal kiriye. Bersiva lokalî (cîgehî) dide û divêt wek tewînek bê pejirandin. Ev tewînek bi alîkariya daçekên ...de, ...le, ...te tê çêkirin. Di zaravên bakur de bi binge hî daçekê di.....de, ....de tê bikaranîn, ev di zaravên başûr de hima bigire bi tevhevî wenda bûye, di cîhê wê de daçeka “ lê, li” dê bikaranîn, bi dîtina min ji ber vê egerê wek tewînek nayê pejirandin û ev jî ne rast e. Di devkê Behdînan de jî car caran wisa tê bikaranîn “li ..... de”. Em naha jî bi çend mînakên zelal li zaravan bi nêrin.

**KURMANCÎ**

(di) mal de  
(di) gund de  
di rez de  
di avê de

**SORANÎ**

le mal  
le dew, gund  
le baxî  
le naw aw

**KIRDÎ**

çê de  
dewe de  
rez de  
aw de

**GORANÎ**

e dilî yaneyî  
e dilî dê  
e dilî baxî  
e dilî dîyê

Mukrî (devokê Soranî)

de ximzetî rewî de  
de desî (dest) bawî de

**ARDELANÎ**

wekî Soranî ye.

VI - Awayê jêve, yan jî tewîneka cîyê jê hatin, rêketin, derketinê. Ev hema hema bigire di piraniya zimanan de wenda bûye, lê di zimanê me de hîn wekî berê, bi taybetî di Kurmancî de tê bikaranîn. Bi alîkariya daçeka “ji” û paşgînên ...ve, û ...re(ra) dihên virastin. di Soranî de ti wateyek wê nemaye, daçeka “li” ji bona vê jî tê bikaranîn. Di Kidkî de jî paşgîna armancê “ ra “ di vir de tê bikaranîn. Dewlemendî di zarava Kurmancî û Goranî de heye. Di zaravan de tewîneka jêve wisa ye:

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
a- Bi alîkarîya “ve”		
dê ve	.....	.....
par ve		
gund ve	gundekawe	.....
piştê ve	.....	.....
mêr ve	pîyawekewe	.....
xwengê ve	xuşkanewe	
GORANÎ		
dîyake we		
dêweka we		
paştîya we		
pîyaweke we		
walîkane we		
b - Bi alîkariya “re , ra”		
gund re	.....	dewe ra
jêr re	.....	cer ra
ser çîyan re	.....	kûwe re sero
nav re	le naw	mîyan ra
GORANÎ		
dê re (yêra)		



ê mil pîakane re  
ê dilî baxî re

MUKRÎ (devokê Soranî)  
le kuçê mala Qeretajdîn ra  
le yêmen ra  
serî kuwan re

c - Bi alîkarîya daçeka "ji" di zaravên Soranî û Ardelanî de ev daçek tew nayê bikaranîn. Di Kirdkî de tenê di wateya keştiya sêwemîn de ev daçek wek "cê re" tê bikaranîn. Di Bextîyarî û Feylî de jî wekî Farisî "az" , "zi" û "zi" tê bikaranîn. Di Kurmancî û Goranî de wek hev gelek bi dewlemendî tên bikaranîn.

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
ji canê (gîyan) xwe bêzar e	.....	.....
ji qal û qira hev	.....	.....
ji nava bajarê Îsfahanê	.....	.....
ji mal	.....	.....
ji nav rezan	.....	.....

GORANÎ  
ce (je) gîyan bêzar  
ce (je) qanq û îşanewe.  
ce (je) dilî bazarî Îsfahan  
ce (je) yanekan  
ce (je) dilî baxî

Ev di zaravê Soranî û Sinê de bi alîkarîya daçeka li tê çêkirin.

le gîyanî bêzar  
le naw bazarî Îsfahan.  
le naw baxî  
le xanî derhêna.

VII - Tewîneka bangî ( Vokatîv). Ev di piranîya zimanan de mirîye. lê di Kurdî de hîn gelek bi dewlemendî dijî. Di zarava Kurmancî de hemû fonktionên xwe dileyîze. Bi kurtî ev tewînek bi alîkarîya îzafê / zayendê û carcaran bi taybetî di zafmarîyê de bi alîkarîya peyva “gelî” tê çêkirin.

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
<b>yewmarî</b>		
nêr		
lo hevalo	hevrêyo	hevalo
lo Huso	Huseyno	Wuşo / Husên
lo xalo	xalo	xalo
la lawo	kuro	la lawo
mê		
lê melkê	xuşkê	melê
lê delalê	xoşewîstê	delalê
xwayê /xwengê	waleyê	wayê
lê jinikê	lê jinê	çênê / çê çênê

**SINE**

dosto

roleş

meleş

xuşkê

**zafmarî**

a - bi alîkarîya paşgîna bangê —ino

hevalino

hevreyne

hevalene (o)

Husênino

wuseyne

jinino

jinikîne

cênikîne

**SINE**

dostel

roleş

jineş

b - Bi alîkarîya peyva “ gelî “

gelî lawan  
gelî xortan  
gelî jinan

gelî kuran  
gelî cîwanan  
gelî jinekan

gelî lajan  
gelî xortan  
gelî cînîyan

VIII-Herçiqaş wek tewînek neyê xuyan jî, lê bi bingeha xwe ve tewîneke. Hans Krache di xebata xweya “ pêkhatina zimanê Îndo- Germanî “ de li ser vê pirsgirêkê bi dirêjahî radiweste. Di termînolojîya rêzimanî de jî vê re “Instrumentalis” tê gotin. Di zimanê me de bi alîkarîya daçeka <bi> û paşgînên <ve> û <ra> tên virastin.

Çend mînak:

#### KURMANCÎ

Pisik bi darê ve helkişya.  
Golîk bi mangê ve çû.  
Pel bi dîwar ve zeliqî.  
Ez bi bavê xwe re diçim.  
Ew bi birayê xwe re hat.

#### KIRDKÎ

Min ve dey ra qewxe kerde.  
Olî eve zov-zêç  
ê xo ra ko ra mendenê.  
Cilonê xo ve domononê xo ra bijêro.  
Xo eve o hal ra vezeno.  
Alu ve Demenu ra dismenayenê xo.

Ev bikaranîn di zaravên başûr de tune, tenê bi alîkariya peyvên tevheviyê dinirxîne tên çêkirin.

Mînak :

“degel” ,  
“pey” (pêre, tevê, pîya)

#### MUKRÎ (devokê Soranî)

Kiçek degel mindalan çûwa. = Keçik tev zarokan çûye.  
Atoş degel xom debêm = Te tev xwe dibim.

ragelî kewt.  
Aminîş degel xoy debê.

= Li pey ket, teqalê ket.  
= Min jî tevê xwe dibe.

## C- BERNAVÊN KURDÎ

Ezê di vir de tenê bi mînakên rûbalên hev bikim. Ji sedemê lêparîna lêkerên nerawirî (Intransitiv) têgîhîştina van lêkeran bernavên me gelek giring in.

I - Bernavên ne tewangî , bernavên radêr (Rectus). Di Kurmancî de bi tevhevê, ji yên tewangî cûda ne. Di Kirdkî de zafmarîya yekan û dudyan de radêr û tewangî wekî hevin. Di zaravên din de tune.

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ GORANÎ	KIRDKÎ
azam	ez	....	ez
tava /teva	tu	....	ti
aêşa	ew	....	o
	”	....	a
ahmekem	em	....	ma
xşmakem	hûn		şima
yuş			
avahya	ew	....	ê

II - Bernavên tewangî (Casus Obliguus). Di hemû zaravan de tê bikaranîn. Di bernavên sêwemîn yewmariya Kurmancî, Kirdkî û Goranî de zayend tê bikaranîn, ango nêr û mê tê

cûdakirin.

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
	min	min (emin)	min (mi)
	te	to	to
	wî	ew	ê
	wê	„	ayê
	me	ême(ma)	ma
	we	êwe	şima
	wan	êwan	îna
	GORANÎ		
	min (emin)		
	to		
	(êwî) ad		
	(awî)adê		
	êma		
	şima		
	êwan		

III - Bernavên kesanîyên kurtkirî. Ev di kurmancî û kirdkî de wenda bûne. Kurmancî di dema lêparina lêkerên nerawirî de, ji bo keştiya yewmara yekan vê dinasê.

Mînak : ez têm.

Kirdkî jî di zafmariya yekan de vê dinasê:

Mînak : yênîmê .

Ev bernavên paşgînkiriyên kurtkirî di zaravên başur de gelek pêş ketine. Heta ev ji dema Awestayê jî, rawiriye û bo zafmariyê pêk hatiye.

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
...me	...m	...m	....
...te	....	...t	....
...şe	....	...y	....
....	....	...man	...îme

....	....	...tan	....
....	....	...yan	....

### GORANÎ

...m  
 ...t  
 ...ş  
 ...man  
 ...tan  
 ...şan

Mînak:

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
min bi xwe	xom	min bi xo
te bi xwe	xot	to bi xo
wî „	xoy	ê „
wê „	xoy	ayê „
me „	xoman	ma „
we „	xotan	şima „
wan „	xoyan	îna „

### .GORANÎ

wîm  
 wît  
 wîş  
 wîş  
 wîman  
 wîtan  
 wîşan

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
bavê min	bawkim	pîyê min
bavê te	bawît	pîyê to
bavê wî	bawîy	pêyê ê
bavê wê	bawîy	pîyê ayê

bavê me  
bavê we  
bavê wan

bawkîman  
bawîktan  
bawkîyan

pîyê ma  
pîyê şima  
pîyê îna

GORANÎ  
tatîm  
tatît  
tatîş  
tatîş  
tatîman  
tatîtan  
tatîşan

Di zaravê Kurmancî û Kirdkî de di keştiya yewmara sêwemîn de, awayek vê bernavên Kurtkirî heye. lê pir nayê bikaranîn. Mînak:

KURMANCÎ  
min gotê = min jê re got.  
min avitê = min ew avit.

KIRDKÎ  
min dey ra va.

IV - Bernavên şandek. Herçiqaş nola devokên biguheze jî dîsa gelek zelal e. Emê li vir tenî rûberê hev bikin.

a- Di nişankirina tiştên nêz de.

**Yewmarî**  
**bê zayend**

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
ayem	ev,î	em	ew (na)
êş	îroj	emro	ewro
	ev mal		

GORANÎ  
î  
î rû

<b>bi zayend</b> KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
<b>nêr</b> vî vî mêrî	.... pîyawî	ney (no) no mordemî
<b>mê</b> vê vê bizinê	...	na , naye na bizê

GORANÎ  
î pîyawî

**Zafmarî**

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
van /vanan van mêran	emaney	nêy nê Mordeman

b- Di nîşankirina tiştên dur, yan jî dûrîyek de.

<b>yewmar</b> AWESTA bê zayend haw	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
<b>nêr</b>	ew	ew	îna / ê
	wî		ê
<b>mê</b>	wî beranî		ê beron
	wê	.....	ayê
<b>zafmari</b>			



avahya	wan /wanan	ewaney	dîna
--------	------------	--------	------

	GORANÎ		
yewmarî			

ay  
ad  
ade

zafmarî	ayeşan		
---------	--------	--	--

c- Forma tewandî nenas.

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
xwadya	...ê ...ên	dey deyan	dey deyî

d - Bernavên din

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
ha	ha hanê waha	ha	aha hanî

V-Bernavên peywendî. Ev dibe di hêla hinekan ve wek bernav neyên pejirandin. lê di zimanê me de gelek bi dewlemendî tê bikaranîn.

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
yewmar		
mê		
a / ya	hî / î	a / ya
a min		a min
nêr		
ê / yê	....	ê / yê
ê min	....	yê min

**zafmarî**

ên / yên	yan	êde
stunên xanî		wustînêde xanî
êd / yêt	hîn	dey
êk		

VI - Bernavên serbixwe. Dema ev tê bikaranîn bi piranî naguheze, tenê di zaravên başûr de bernavên kurtkiriye paşgînkirî tên paş. di zaravên bakûr de tim serbixwe ne.

<b>AWESTA</b>	<b>KURMANCÎ</b>	<b>SORANÎ</b>	<b>KIRDKÎ</b>
xwato	xwe / xo	xo /xod	xo / ho
xwadya	jê / ê	dey	ci / dey
	min gotê	deygot	dey ra va

**GORANÎ**

wî / we  
jê (cey)  
watiş

VII - Bernavên hevgîn (hevdudanî, bargiranî). Di Kurdî de gelek bernavên hevgîn tên bikaranîn piraniya wan ji helandina daçek û bernavan pêk tên. Yan jî, pev re helandina hejmar û daçekan. Çend mînak:

<b>KURMANCÎ</b>	<b>SORANÎ</b>	<b>KIRDKÎ</b>
hevdû	yektir	yewbîn
bi hev re	ê kûdîn	jûbîn
nav(hev)de	yekudin	zumîn
tevhev/ pev re	lêk	tew / pîya
pev	pêk	pê / pîya
herdû	yekdû	hurdîman

**GORANÎ**

yewera  
yewe

herduman

VIII - Bernavên pirsê. Di zaravan de hima bigire wek hev in, yan jî, varyantên wanên velîstinê ne

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
çit / çiş	çi /çik	çi	çi / se /çik
ka / kve	kê /kî	kam / kê	kam
ku / koi	ka / ku	ku	kot / komca
kemcît	kîjan	kamyan	kamcîn
	kanê		hanê
	kuderê	le ku	kata
	ji ku		kotra
kada /kva	çewa	çon	çitor

GORANÎ

çi / çiş  
kam / kî  
çon

Bê van hin awayên afirandekên van bernavên pirsan jî tên bikaranîn. Lê ev yên herî girîng in.

IX-Bernavên nexuya, ne berçav bi gotinek din nebî (indefinita). Ev bernav bi gelek varyantên xwe ve tê bikaranîn. Di hin zaravan de yek bernavek bi sê çar awayan tên bikaranîn. Çend mînak :

AWESTA	KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
çwand	hin / hinek	hende	hend / tay
çaitî	çend	çend	çand /çond
	qas /qandê	qas	qasê

evant	çuqas	çendek	çiqas
çiça	ewqas	ewende	hode / qasê
kesçît	tişt / çîyek	şitek	çîyê
	kes	kes	kes
	gelek / epey	hend/ epey	hepey
hema	hima	hima	hima
	herkes	her kes	her kes

### GORANÎ

hanî  
çen  
çene  
ewende  
çiş yiwa  
kes  
her kes

X - Bernavên nayênî , Çend mînak:

### KURMANCÎ

na /no  
hîç  
ti /çu  
qe /t  
hew  
tew

### SORANÎ

na  
hîç  
nî çu  
.....

### KIRDKÎ

nê /na  
hîç  
çi /çu  
qe / t

## H- DAÇEKÊN KURDÎ

Zaravên me di warê daçekan de jî, nola zaravên bîyanî ji hev dûr neketine. Gelek dewlemend in û di peyvandina rojê de bi dewlemendî tên bikaranîn. Hinek yê herçiqas bi varyantên cûda bên bikaranîn jî,, dîsa tên fêmkirin. Ezê li vir jî zaravan rubalên hev bikim.

I - Daçekên kevn û nû. Ev daçek di zimanê me de gelek dewlemend e. Bo baş ifade kirina tiştan gelek girîng e.

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
di	de	de
li	le	...
bi	be	bi / vi /ve
be / ve		
...	...	eve /ebe
pay		
ji	...	... (ci)
bo /seva	bo	seva /serba
ba /bal	nik /ley	... / lay
bal /hêla	kin	hêt
...		
dû	diwa	dimê / peyo
bê	bê	bê
cem	lay / ley	lewe
şun	...	...
tev	...	têw

pey	...	pey / peco
ser	ser	ser
ber	ber	ver
nav	naw	mîyan /zere
navber	nawber	mîyan
pêş	ber /pêş	verênî /ver
bin	jêr	bin
jêr	jêr	cêr /jêr
jor	jor	cor / jor

### GORANÎ

e (e dilî)  
 çî / la  
 be / ve  
 jê / cê  
 pey /pay  
 pey /pay  
 pey /pay  
 la  
 paşt / dima  
 bê / bî  
 la  
 şun  
 paşt  
 ser / ere / ewe  
 ver  
 dilî  
 ....  
 pêş /dem  
 jîr  
 jîr /jêr  
 jûr /cur

II - Daçekên zo (cot) Hinek daçek hene tevê paşgînan tên bikaranîn. Di hinek zaravan de daçek cihê xwe daye paşgînan.

Çend mînakên girîng :

**KURMANCÎ**

ber bi  
 jî .... re  
 jê.....ve  
 di .... de  
 bi ... re  
 bi ... ve  
 nav ... re  
 nav ... de  
 li ser  
 li bin  
 li ber  
 jî paş  
 li duv

**SORANÎ**

berbe /berew  
 bo (...ra)  
 ..... we  
 le /le..de  
 be . / be .. ra  
 be(..we)  
 naw  
 naw... de  
 le ser  
 le jêr  
 le ber  
 le paşewe  
 le diwayî

**KIRDKÎ**

verbi /hêti  
 .... ra (ci ..ra)  
 .... ra  
 .... de /da  
 bi .... ra  
 bi .... ra /re  
 zere ... ra  
 zere ... de / da  
 ...da sero  
 bin da  
 ver da  
 pey ra  
 dimî da

**GORANÎ**

e la / e ver  
 jê ... /ere  
 cê ewe  
 e dilî  
 be ... era /ewe

III - Daçekên hevgîn (hevdudanî /bargiranî). Di Kurdî de gelek daçekên hevgîn tên bikaranîn. Zimanê me di vê hêlê de jî, gelek dewlemend e. Di zaravên bakûr de bi alîkariya daçek û paşgîna îzafê tê çêkirin. Di zaravên başûr de bernavên kurtkirî jî, lê bar dibin. Mirov bi alîkariya wan hevokan bi hêsanî fêhm dike. Em niha jî, bi mînakan çewa tên virastin, zelal bikin. Mînak:

Zaravên bakûr

- daçek + paşgîna îzafê = daçeka hevgîn

Zaravên Başûr li gel formula jor,

- daçek + paşgîna îzafê + bernavên kurtkriyên paşgînkirî =  
daçekên hevgîn.

a - Zaravên Bakûr

### KURMANCÎ

daçek		p. îzafê		daçek û paşgîn	=daçekê hevgîn
bi	+	ê			= pê
bi	+	ê	+	de	= pêde
bi	+	ê	+	re (ra)	= pêre
bi	+	ê	+	ve	= pêve
bi	+	ê	+	hev	= pev (pew)
di	+	ê			= tê
di	+	ê	+	de (da)	= têde (da)
di	+	ê	+	re	= têre (ra)
di	+	ê	+	ve	= têve
di	+	ê	+	hev	= tev (tew)
ji	+	ê			= jê
ji	+	ê	+	de	= jêde
ji	+	ê	+	re	= jêre
ji	+	ê	+	ve	= jêve
ji	+	ê	+	hev	= jihev
li	+	ê			= lê

### KIRDKÎ

bi	+	ê			= pê
bi	+	ê (ayê)			= piyê
bi	+	ê	+	da (de)	= pêda
bi	+	ê	+	ra (re)	= pêra/pira (pêre)
bi	+	-	+	di + ra	= bider
di	+	ê			= tê
di	+	ê	+	de (da)	= têde (têda)
di	+	ê	+	re (ra)	= têre / tîra /dîra



ci (ji) +	ê			= cê
ci (ji) +	ê (î)	+	ra (re)	= cê ra /cira / cirê

Di vî zaravê me de daçeka <di, di.....de> bi serê xwe ne xuyaye , lê di daçeka hevîn de çawa ku li jor hat zelalkirin bi giranî tê bikaranîn. Daçeka „li“ di vî zaravê me de nayê bikaranîn ev jî, gelek zelal e ku ev daçek dûv re ketiye zimanê me.

### b - Zaravayên Başûr

#### SORANÎ

daçek		p. îzafê		daçek û paşgin	ber. Kurt*	daçeka hevîn
bi	+	ê				pê
bi	+	ê	+		..m /t / y	pêm / t / y
bi	+	ê	+		..man / tan ..yan	pêman /pêtan pêyan
bi	+	ê	+	da		pêda
bi	+	ê	+	ra		pêra
bi	+	ê	+	we		pewe
bi	+	ê	+	yekî		pêk
di	+	ê				tê
di	+	ê	+	de		têde
di	+	ê	+	ya		teya
di	+	ê	+	yekî		têk
le	+	ê				lê
lê	+	ê	+	yekî		lêk
le	+	ê	+		..m/ t/ y	lêm /t / y
					..man /tan /yan	lêman

\* Bernavên kurtkirî.

/tan  
/yan

Devokên din jî, hima bigire wek Soranî ne. Di zaravê Goranî  
de ev daçekên hevgîn kêr tînin bikaranîn.

## E- HOKER

(fêlnîş, zarf, adverb).

Di kurdî de gelek hoker tên bikaranîn. Hema bigire di hemû zaravan de wekî hev in. Ezê dîsa zaravan rûberê hev bikim.

I - Hokerên demê

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
par	par	par
pêr	pêr	pêr
pêrar	pêrar	pêrar
îsal	emsal	emsar
îro / evro	emro /ewro	ewro
doh	dûwîne	vizêr / vijêr
paşê / li pey	le paş	pêyê /dimê
dûv re	diwe	peyê con
nika / ana	esta / noka	nika
êvar	le êwarewe	şand / san /son
rojê	be roj	rozê / rojê
nîvro	nîwro	pêroj/z
havînê	hawînê	omnan
payîzê	be payîz	hamonê payîze

her şev wê çaxê wê demê	her şew lew kat lew dem	herşew na wext a wext / dem
bihar / bahar	bûhar	wusar vahar
nêz / nêzîk	nzîk / nezîk	nêjdî / nêzdî
dûr îşev	dûr emşew	dûr (î) ew şew

### GORANÎ

par  
pêr  
pêrar  
îsal / îmsal  
....  
arû  
e paşt  
e dîr  
....  
ba rû  
nimerû  
....  
ê payîz  
her şew  
î ca / îm ça  
em wext  
vahar  
nêzîk  
dur  
îşew

II - Hokerên cîgeh û warê kirinê

KURMANCÎ

SORANÎ

KIRDKÎ

vê derê /vira	lem cîga	îta / tîya /na
wir / wê derê/ cîyê	lew cîga	ûza / ûca / dot
jêr /li jêr /xwarê	le jêr / li xwarewe	cêr / cêr da
kêlek / tenişt	li tenişt	kêlek de
li ku de rê /kanê	le kam cîge	kamcîn /kotî
wê de	bew lay	dot / haza
ji vir de	lew lay	nat / naza
virde wêde	lew bew lay	nat dot / navêr
		bovêr
li her derê	le her cîga	her cayê /de
nav de	le nawewe	mîyan / werte
		de
ji nav	le nawewe	mîyan, zere ra
		(o)
ji ser	le serewe	ser ra (o)

### GORANÎ

ca(yê)	îrîya / îca
acayê / ane	
la	
a jêr / ve ser	
î dem	
kanû / ci ku	
je cîya	
çi lawe / ciane	
çilawe cîane	
a her ca	
çi nîm	
je nîm	
je ser	

### III - Hokerên awayê kirinê

KURMANCÎ

SORANÎ

KIRDKÎ

hêdî hêdî	wurde wurde	hêdî hêdî/ senikî
giran giran	....	giran giran
zû bi zû / bi rev	zu be zu	rew bi rew
aha / ha	awa / wa	hên / nîya
wer / wusa / wulo	awa	nîya hên
dereng	dereng / ereng	herê / îherê
carek	be car	dolimê / rêy/ şopê
yek bi yek	yek be yek	yew bi yew / zu bi zu
bi xiravî/xirabî	be xirape	jû bi jû
bi qencî / rindî	be çake	bi xirabîyê
şev bi şew	şew be şew	be qencîyê / rendekî
roj be roj	roj be roj	şew be şew
car car / geh geh	caran	roz ve (bi) roz
cot bi cot / zo bi zo	cot be cot	corû / gegane
rêz bi rêz	rêz bi rêz	cut bi (ve) cut
parçe bi parçe	lete lete	rêz bi rêz
		lete lete / parçe parçe

Dervayê van hîn gelekên din yan jî, awayên vanayên lêvkinê hene, lê çawa ku min pêş ve jî, zelal kiribû, ev him yê herî giring him jî, mînak in. Hemû tê de nînin.

## F- PEVGIREKÊN ZIMANÊ KURDÎ.

Ev jî cure cure ne û gelek bi dewlemendî tê bikaranîn. Bê vê gelek caran di hin zaravê û devokên de bi awayên din tên bikaranîn. lê bi bingehîn yek in. Çend mînakên girîng:

### I - Pevgirekên serbixwe,

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
bi	be	bi / vi / evi / ebe
û	û / w	w / û / o
lê / hima	balam	lê / hima / hama
lakîn / lê belê	lakîn	labelê / lakîn
kû / ko / kî	ke	ke / kî / ko
eger / hekê / ger	eger / ger	eger / eke / heke
yanî / ango	yan	yan (yanî)
hima (him)	hem	hem / hima
kengî	key	key (î) / kamcî
da / lewre	çunke	serbeta / çimke / serva
heta / ta kû	heta / heta kû	heta / ta kû
wekî / mîna	weku	ze / zeke / zey
çi kû	çi ku	
gava kû	heta ke	gama ke
jî	....ş	jî / zî
li ber	lewe le ber	ver de
ji ber	le ber	ver ra
lema	...	dayê re / nayê re
bona / seva	boewe	seva / serba

### II - Pevgirekên (ji hev) veqetandinê.

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
----------	--------	--------

yan.... yan jî  
an(ya)... an(ya) jî  
carna ... carna jî  
geh..... geh jî

yan ... yan  
an .... an  
carek ... carek  
katek, katekîş

ya .... ya jî  
yan (an) ..... yan (an) jî  
gegane ...  
gegane...

### III - Pevgirekên beranberkirinê.

**KURMANCÎ**  
çewa...wusan jî  
çiqas .... ewqas  
her çend

**SORANÎ**  
çon ... ewsa  
çi ... çij  
her çend

**KIRDKÎ**  
se ... nîya  
çiqa ... hinde  
her çond.



## G- RENG DÊRÊN ZIMANÊ KURDÎ

Ev hîn dewlemendtir in. Eger em mînakek ji du rengan bidin, wê baş bê fêm kirin. Tenê rengê gihayî, 1- kesk, 2- kewikî, 3- sewzî, 4- hêşinahî û ev bi alîkariya <tarî> û vekirî hîn dewlemendtir dibe. Dema kû mirov goh dide kilamên dengbêjan, mirov baş têdigêhêje ku rengdêrên zimanê me çuqas dewlemend in. Di hemû zaravên Kurdî de ev dewlemendî xwe dide xuyan. Ezê dîsa li vê derê tenê dengdêrên herî giring yê sê zaravan rûberî hev bikim; Lewrê rengdêrên zaravên din jî hima bigirin wekî rengdêrên van hersê zaravan ne.

### I - Rengdêrên bingehîn.

KURMANCÎ	SORANÎ	KIRDKÎ
baş	baş	baş
berz	berz	berz
bedew	xoşewîst	bedew / rindek
bêcan	bêgiyan	bêgan / bêcan
bêmal	bêmal	bêmal / bê çê
bêpar	bêpar	bêpar
biha / bûha	giran	biha / baha
birçî	birsî	vêsî / vêsan /veyşan
çal	qul / çale	çale
çê	çak	çêyîtî
çep	çep	çep / e
çilek	çilek	çilek / çilekîn
delal	xoşewîst	delal
dirêj	dirêj	derg
erzan	herzan	erzan /erjan

fire  
genî /bînîn)  
germ  
gir  
hesan /asan  
hûr  
jar  
jêhatî  
kesk  
kevn  
kewikî  
kor / kur  
kûr  
kurt / kin  
mezin  
nexweşî  
nexwendî  
nû  
pak / temîz  
pan /pehn  
biçûk / qicik  
pir /zaf  
pîs  
qalind/stûr  
qilêr / qirêj  
qul / kun  
rast

reş  
rind  
ronî  
sar  
six  
sivik  
sor  
spî

frewan  
gende  
germ  
gewre  
asan / barsuk  
wurd  
hêjar  
jîrek /gurcûgol  
sewz  
kon  
sewz /kewekî  
kwer  
qul  
kurt  
gewre  
nexwoşî  
nexwendî  
nuy  
pake / temîz  
pan  
piçkole / çûk  
zor  
pîs  
stur  
pîsî / çilkîn  
kun  
rast

reş / sîya  
rind  
rûnak / ronak  
sard  
sext  
sûk / sûnk  
sur  
sipî / çerme

hîra  
boyîn  
germ  
gird / girs  
asan  
hûrdi / wurdî  
jîar  
jîhatî / jêhatî  
kesk  
kon / kan  
kewk / kewe  
kor / kur  
xorî / çale  
kilm  
pîl  
nêweşî  
nêwendî  
newe  
pak / temîz  
pan / pon  
qic /j /z  
zof / zaf  
pîs  
qalind  
qilêr / qirêj  
qule / lon / lan  
rast / raşt /  
eger to biçûwayt  
eger ew biçûway  
eger eme biçûwayîn  
eger ewe biçûwayn  
eger awan biçûwayn

\* Ji N. Büyükkaya  
\* Ji Î. Uşen

### Lêkerê têper

eger min	bêjim	eger min	bim	wutayî
eger to	bêjît	eger to	bit	wutayî
eger ew	bêje	eger ew	bi	wutayî
eger eme	bêjîyn	eger eme	bîman	wutayî
eger ewe	bêjin	eger ewe	bitan	wutayî
eger awan	bêjin	eger awan	bîyan	wutayî

### LAKÎ (KELHÛRÎ)\*

#### Lêkerên têneper

dema niha

eger min	biçim
eger tu	biçiyt
eger aw	biçiy /t
eger îme	biçîyn
eger îwe	biçîn
eger awan	biçîn

dema borî

eger min	biçiyam
eger to	biçiyayt
eger aw	biçiyay
eger îma	biçiyayn / yîn
eger îwe	biçîyan
eger awan	biçîyan

### Lêkerên têper

eger min	bikem	eger min	bim	kirdayet
eger tu	bikeyt	eger tu	bît	kirdayet
eger aw	bikew	eger aw	biy	kirdayet
eger îme	bikewîyn /yn	eger îme	bîman	kirdayet
eger îwe	biken	eger îwe	bitan	kirdayet
eger awan	biken	eger awan	biyan	kirdayet

### LORÎ (FEYLÎ)\*

#### Lêkerê têneper

eger men	biçîm	eger men	çîbam
eger tu	biçeyt	eger tu	çîbayt
eger aw	biçet	eger aw	çîbayt
eger îme	biçîym	eger îme	çîbayîm

\* Ji i. Rahman

eger îwe biçen  
eger awan biçen

eger îwe çîban  
eger awan çîban

Lêkerê têper

eger men bikem  
eger tu bikeyt  
eger aw bikeyt  
eger îme bikeyîm  
eger îwe biken  
eger awan biken

eger men bikirdam  
eger tu bikirdayt  
eger aw bikirdayt  
eger îma bikirdayîm  
eger îwe bikirdayn  
eger awan bikirdayn

GORANÎ  
Wek Feylî ye

## 10 - DI LÊPARÎNÊ DE DEMA WÊBÊ (Futur I)

Ev dem bê Kurmancî di zaravên din de pir ne xuyaye. Di zaravê Kirdkî de tenê li Siwêrekê awayek vê demê heye, li Gêlê jî, dibe ji hîkariya Kurmancî be, wek Kurmancî tê bikaranîn. Di Kirdkiya bakûr de bi giranî dema niha (ku di awayê dema fireh de ye) tê bikaranîn. Car caran jî, bi alîkariya lêkera “wazen” tê virastin. Di zaravê başûr de jî, ev dem nîne, yan dema niha yan jî, bi alîkariya lêkerên “**amawe = xwastin**” û “**tuwan**” ê tîr virastin.

Dibe ji lêkera hatinê (li bikaranîna dema niha li Hekarî binêrin) hatibe.

Em niha jî, bi mînakên vê mijarê zelalkin.

I - Ji dema niha pê ve dema wêbê.

KURMANCÎ

Di Kurmancî de bi alîkariya <ê> û <dê> ku dibe ji lêkera “hatin” hatibe, û bi tevê lêkera di formê rewayî (konjuktîv) de ye tîr virastin.

Mînak:

hatin		kirin	
ezê (dê)	bêm	ezê (dê)	bikim
tuê (tê)	bê /yî	tuê (tê)	bikî
ewê	bê	ewê	bike
emê (dên)	bên	emê (dên)	bikin
hûnê	bên	hûnê	bikin
ewê	bên	ewê	bikin

### SORANÎ

Di vî zaravê me de ev form nîne, lê mirov bixwaze di wê wateyê de tiştek bivêje, divêt lêkera alîkar “amewe” û foram rewayî (konjuktîv) bi kar bîne.

Mînak:

dema niha		Bi alîkariya “amawe”	
Ez esta	d /eçim	min amewe	biçim
to esta	eçî	to amewe	biçî
ew esta	eçe	ew amewe	biçe
êma esta	eçin	ême amewe	biçin
êwe esta	eçin	êwe amewe	biçin
êwan esta	eçin	êwan amewe	biçin

### KIRDKÎ

Di nav gel de hema bigire ev form nayê bikaranîn. Dema ku mirov biryarek bê vege û bê rawestan jî da, bi alîkariya lêkera “wazen” vê formê dilêvîne . Lê di devokê Gêlê de bikaranînek wekî Kurmancî û li Siwêregê jî awayek nêzîkê Kurmancî heye. Ev di devokên bakûr de nîne.

Gêl*		Siwêreg**	
ezê şora		ez do	bida
tiyê şorê		ti do	bidê
oyo şoro		o do	bidô
aya şora		a do	bida
mayê şorê		ma do	bidê

\* Ji i. Cihan

\*\* Ji N. Büyükkaya



şimayê şorê  
êyê şorê  
Bakûr (Dêrsim)

şima do  
ê do

bidê  
bidê

ez wazena şêrî  
ti wazenê „ ûwd.

### ARDELANÎ (SINE)

Di vî zaravê me de jî, bi giranî dema niha ji bo dema wêbê jî, tê bikaranîn, lê mirov dikane bi alîkariya peyva “**gerekman**” vê demê bi kar bîne

min	gerekman	bêjim
to	gerekman	bêjît
ew	gerekman	bêjî
ema	gerekman	bêjiyn
ewe	gerekman	bêjin
awan	gerekman	bêjin

### LAKÎ Û LÛRÎ

Di van zaravên me de jî nîne, mirov dikane tene bi alîkarîya lêkera xwastinê “**tuwan**” vê formê (eger gelek pêwîst bî) bi kar bîne.

Lakî

Lorî

min tuwam (gerek)	bikem
tu gerek	bikeyt
û hwd.	

men tuwam	bikem
tu gerek	bikeyt

## 11 - BIKARANÎNA DEMA PASÎV

### I - Pasîva veşartî

Pasîva bi dizî yan jî ne berçaviya herî kevn ji Êraniya kevn tê û hîn di gelek zaravên me de dijî. Ev di zaravên Êranî yê din de najî, miriye. G. Morginstierne (74) wisa dinirxîne. “Di

dema boriya lêkerên têper de virastinek jê re dezgehê pasîv tê gotin, bi dewlemendî heye.”

O. Mann (75) di vî warî de nirxandinek wisa çêdike : “Li gel van paşgînên <re>, <ra> ku pêkhatinek gelek dûv re ye, virastina pêkhatina forma pasîvî ya herî kevn ya ku ta hetanê raya pasîva Êraniya kevn <ya> diçe Di zaravên Kurdî yê din de, bi taybetî di Sineyî û zaravê başûr de û devokên der dora Kermanshahê de ev forma <ya> bi tevhevî dijî” . Ev di Kurmancî û Kirdkî de bi alîkariya navgirek <îy, îyen > tê virastin. Bê vê mirov dikane lêkerên paşgîna <andin> digirin jî, di vê xalê de binirxîne. Em naha jî bi Ardelanî dest pê kin, mînakan ji zaravan bidin.

### ARDELANÎ (SINE)

Dema nika

min ekujyem  
to ekujyît,  
ew ekujye  
ema ekujyeyn  
ewe ekujyen  
awan ekujyen

Dema borî

kujyam  
kujyayt  
kujya  
kujyayîn  
kujyan  
kujyan

### FEYLÎ LAKÎ

Ev herdû zaravê di vî warî de hema wekî Ardelanî ye.

Kurdeyl e kujyeyn.

Kurdeyl e kujyen.

### KÛRMANCÎ

a - Bi alîkariya <y>

Li min geriyane	= geriyân
tu jê bizdiyaye	= bizdiyân ( bizdandin)
xanî herîşiyaye	= herîşiyân (herîşandin)
em jê rawirîne	= rawiryân

b - Bi alîkariya <andin>

aktîv	pasîv	
çêran	= çêrandin	pez çêrand
xemilîn	= xemilandin	xanî xemiland
westan	= westandin	wê ew westand
lerzîn	= lerzandin	Kê erd lerizand.
û hîn bi sedan.		

SORANÎ

b - Bi <andin>

aktîv	pasîv	
gerîn	= gerandinewe	
lerzîn	= lerzandine (we)	
wergerîn	= wergerandine (we)	
pekîn	= pekandin	
lewêrîn	= lewêrandin	
pisan	= dapisandin	

KIRDKÎ

a - Bi alîkariya <y>

aktîv	pasîv #	
esten	= erziyene	welat nîerziyno
kişten	= kişiyene	
vaten	= vaciyene	nîya vacîno
werden	= weriyene	non werîno

b - Bi alîkarîya <nayen>

alezîn	= alaznayen
birîn	= birnayen
ceribîn	= ceribnayen
dawasîn	= dawasnayen

helîn = helênayen (î)  
nivisîn = nivisnayen (î)

Di zaravên din de jî, hima bi awayê Soranî tê virastin. Ji wê hewce nake kû mirov li ser raweste.

II - Forma pasîv ya bingehîn di Kurmancî Goranî û Kirdekî de bi alîkarîya lêkera <hatin /amayen> tê virastin. Di soranî de ev form gelek kêmtê bikaranîn. Ev di zaravên din de jî, pê raya lêkera hatinê (ê) tê virastin.

### KURMANCÎ Dema nika

ez	têm	kuştin
tu	tê (yî)	kuştin
ew	tê	kuştin
em	tên	kuştin
hun	tên	kuştin
ew	tên	kuştin

### Dema borî

ez hatim kuştin.  
em hatin kuştin

tê xwarin, tê gotin, ûwd.

### Di dema wêbê de

Ewê bê (bêt) kuştin  
Navê min wê bê gotin.  
Wê evê bê xwarin.

### Yewmarî :

1-bêm, 2- bê /t, bê,

### çîroka dema niha

ez dihatim kuştin  
em dihatin kuştin.

Zafmarî:  
bên

### SORANÎ

Çawa ku min li jor jî, anîbû ziman ev form hema hema  
miriye , lê dîsan jî hîn bi çend bikaranîna be jî , tê xûyan  
Mînak:

dête nûsîn  
dête birdin  
dête xwardin

hate nûsîn.  
hate birdin  
hate xwardin.

### KIRDKÎ

Dema nika

Nan êno /yêno  
Qisey êno  
Kurd êno  
Nam êno

werdene.  
vatene.  
kiştene  
nivisnene.(nuştin)

Dema borî

çîroka dema nika

Nan ama werdenê.  
Qiseyama vatenê  
Kurd ama kiştene  
Nam ama nivisnene  
/nuştene

Nan amêne /ye werdene  
Qisey amêne vatene.  
Kurd amêne kiştene  
Nam amêne nivisnenê  
/nuştene

ûwd.

Di dema wêbê de

Gerek nê bêrê kistene  
bêrê werdene  
bêrê vatenê

## GORANÎ

Kurdekey	mîyon	kiştê /ey.
darekey	mîyon	wîstenê /ey.
ow (ad)	mîyo	persînê /ey.
Ce Heş	mîyon	tersenê /ey.
Tarîx	mîyon	zanenê /ey.
Ra	mîyo	lûenê /ey.
û hwd.		

### Dema borî

Kurdekey amên		kiştêkê /ey
Darekey amên		wîstenê /ey.
ow amên		persînê /ey.
Ce heş amên		tersenê /ey.
Tarîx amên		zanenê /ey.
Ra amên		lûenê /ey.

### ARDELANÎ (SINE)

Kurdgel e	kujîn	Kurdgel e	kujgê
Hesen e	kujin	Hesen e	kujgê
Kelîme e	witîn	Kelîme e	wutyan
ûwd.			

### LAKÎ (KELHÛR)

Kurdeyl	e	kujyen.
Nan	e	xurêt.

### LUR (FEYLÎ)

Kurdeyl	e	kujyeyn
Nan	e	xurêt

III - Forma tenê di Soranî de tê bikaranîn. ev bikaranîn Soranî ji hemû zaravan diqetîne. Yanî tenê di Soranî de xûyaye.

## SORANÎ

Dema niha bi alîkariya <rê> û dema borî bi alîkariya <ra> tê virastin.

Lêkerê radêr	Dema nika	dema borî
gezin	gezênrê	gezênra
wûtin	wutrê	wutra
bestin	bestrê	bestra
nûsîn	nusrê	nusra
girtin	girrê	girra

## 12 - DÎSA AWAYEK FORMA PASÎV (dan kirin)

Ev di zimanê me de bi alîkarîya lêkera “dan” tê virastin. û hema bigire di hemû zaravan da yek e, lê ji ber ku di zaravên başûr de bernavên paşgînkiriyên kurtkirî tîen bikaranîn, ev form hinek cuda ye.

Mînak:

I - Zaravên bakûr

### KURMANCÎ

Dema niha

Ez	didim	nivisandin
tu	didî	nivisandin
ew	dide	nivisandin
em	didin	nivisandin
hûn	didin	nivisandin
ew	didin	nivisandin

Dema borî

min	da	nivîsandin
te	da	nivîsandin
wî /wê	da	nivîsandin
me	da	nivîsandin
we	da	nivîsandin
wan	da	nivîsandin.

çîroka dema niha

min dida nivîsandin  
çîroka dema wêbê.  
minê bida nivîsandin

Dema wêbê

ezê bidim nivîsandin  
çîroka dema borî  
min dabû nivîsandin.

### KIRDKÎ

Dema niha

ez	dana	vindernayene.
ti	dane	vindernayene
o /a	dano/a	vindernayene
ma	dane/îme	„
sima	danê	vindernayene
ê	danê	vindernayene

çîroka dema niha

ez dayê /ne vindernayene  
ma dayêne /îme vindernayene

çend mînakê piratîkê:

Ez to dan efkerdenê.  
Sima mordemê ma day kistenê.  
Hima to ez werdû, mi dana kistenê.  
A sewe îne ûza danê vindernayene.

Dema borî

mi	da (y)	kistene
	/	vindernayene
to	da	kistene
ê /ayê	da	kistenê
ma	daê	kistene
sima	daê	kistene
îna	daê	kistene.

çîroka dema borî

min davî / bî kistene  
ma davî / bî kistene



O wazeno ke Mêm bido kistene.

II - Zaravên başur

SORANÎ

Dema nika

min	dem	da	benûsîn
to	det	da	benûsîn
ew	dey	da	benûsîn
ême	deman	da	benûsîn
êwe	detan	da	benûsîn
êwan	deyan	da	benûsîn

Dema borî

min	dam	benûsîn
to	dat	benûsîn
ew	day	benûsîn
ême	daman	benûsîn
êwan	dayan	benûsîn.

### 13 -DI KURDÎ DE FORMA TAYBETÎ (Ergetive )

Forma taybetiya di zimanê Kurdî de heye û di zimanê zimanzanînê de jê re “Ergetive konstruktion” tê gotin ; di nav gel de bi giranî tê bikaranîn. Di zaravên bakûr de tê bikaranîn. di vê formê de bernavên kesanî di awayê serve (Complément) yê de tê bikaranîn. di awayek pasîvê de tê xûyan û tenê di bikaranîna dema borîya lêkerên têper (rawirî) de ev form tê xûyan.

Mînak :

Wî ez dîtîm                      = Ez bi hêla wî ve hatim dîtî, yê ku ez

dîtime ew e.

Wan em dîtin                   = Em bi hêla wan ve hatin dîtin.  
Te ez dîtîm                    = Ez bi hêla te ve hatim dîtin .

Em niha jî, li zaravên binêrin û mînakan ji zaravan bidin. Bi vî awayî vê mijarê zelebikin. Ji ber kû di zaravên başur de bernavên radêr (rectus) nînin. Ev forma jî, bi awakî din û ji zaravên bakûr cuda tê bikaranîn. Lêker paşgîna kesanî nagire, tenê bernavê tewangî îzafê digire.

### I - Zaravên bakur

#### KURMANCÎ

Dema borî

çîroka dema borî

Wî ez       dîtîm  
Wî tu       dîtî  
Kur ew      dît  
wê em      dîtin  
wê hun     dîtin  
wê ew      dîtin

wî ez       dîtibûm  
wî tu       dîtibîyî  
wê ew      dîtibû  
wê em      dîtibûn  
wê hun     dîtibûn  
wê ew      dîtibûn.

#### KIRDKÎ

Dema borî

çîroka dema borî

Ê ez       dîya.  
ayê ti     dîye  
ê o /a     dîyo /a  
îna ma    dîmê  
îna sima  dîyê  
îna ê      dîyê

ê ez       dîbîya  
ayê ti     dîvî /yê  
îna o /a   dîvî /yo /ya

### II - Zaravên başûr

#### SORANÎ

Di Soranî de ev form bi rastî tune. Tenê bernav paşgîna

îzafê digire û bi awayê jêrîn tê bikaranîn.

Dema borî

çîroka dema borî

Kur minî dît  
Kur toy dît  
Kur ewî dît  
Kur êmey dît  
Kur êwey dît  
Kur êwanî dît

kur minî dîtibû.  
kur toy dîtibû  
kur ewî dîtibû  
kur êmey dîtibû.  
kur êwey dîtibû.  
kur êwanî dîtibû.

#### 14 - LÊKERÊN ALÎKAR

Me çend hevên wan pêş vê mijarê bikaranî. Ezê di vê mijarê de bi tevhevî verisim. Ezê disa zaravan yek bi yek bi mînakan bidim zelalkirin. Lewrê ev lêker gelek girîngin.

##### KURMANCÎ

Lêkerên alîkar yên di Kurmancî de tên bikaranîn ev in.

bûn /bûyîn,  
hatin,  
dan /dayîn,  
xistin

kanîn / şekanîn  
xwastin  
vîn  
kirin

Mirov dikane jî bo dema wêbê “**dên**” jî, bipejirîne.

Lêparîn

bûn

Dema niha

Dema borî

Pêş dema niha

pey dengê ,  
lal (dengdar)

pey dengdêran

ez im  
tu î  
ew e

me  
yî  
ye

ez bûm  
tu bû /bûyî  
ew bû

em in ne  
hûn in ne  
ew in ne

em bûn  
hûn bûn  
ew bûn

Dema wêbê

çîroka dema nika

ezê bibim  
emên bibin

ez dibûm  
em dibûn

Çîroka dema boriya rast

ez bûbûm  
em bûbûn

vîn : bi giranî nayê lêparîn di awayê kesê sisyan de tê bikaranîn. Demên wê yên borî hima bigire nayên bikaranîn.

min divêm  
te divêt /yî  
wî /wê dive /e  
bi giranî  
min divê tê bikaranîn.

me divên  
we divên  
wan divên

Dên

tenê bi awayê paşgînî carna jî, bi awayek daçekî tê bikaranîn

yewmar

zafmar

I - ê

ên

II - dê

dên

wê = wê Kurdistan serbixwe be.

SORANÎ

Di vî zaravê me de lêkerên alîkar ev in.

tuwan	xwastin / wistin
bûn	dan
vîn	kirdin

Yek jî, ji bo dema niha (di peyva rojanî de pir kêr tê bikaranîn)  
<amawe> heye.

bûn		dema borî
Dema nika		

pey tîpên	pey dengdêr		
lal (dengdar)			
min im	m (e)	min	bûm
to î (t)	t	to	bûyt / bûy
ew e	ye	ew	bû
ême î	î	eme	bûn
êwe n	n	êwe	bûn
êwan n	n	êwan	bûn

amewe:

- Min amwêt biçim / min amawe biçim.

tûwan =kanîn

min tuwanim            ême tûwanin.

### KIRDKÎ

Di vî zaravê me de lêkerên alîkar ev in:

bîyen	wazen
şikîyen /besekon	amayen
dayen	kerden

û peyva <gerek> bo mecbûrîyetê di cîhê lêkera alîkar de tê bikaranîn.

bîyen

Dema nika

Dema borî

Siwêrek

pey tîpên  
lal (dengdar)

Pey dengdaran

ez a  
ti ê  
o o  
a a  
ma ê  
şima ê  
ê ê

ya  
yê  
yo  
ya  
yê  
yê  
yê

ez bî /ya  
ti bî /yê  
o bî  
a bî  
ma bî  
şima bî  
ê bî

Dema fire

ez bena,  
ti benê  
a /o bena /o ê

ma bennê  
şima bennê  
bennê.

Dêrsim

ez a / ne ya /nê /wûne  
ti a /ê wa /yê  
o /a o /a yo /ya  
ma me me  
sima ê yê  
ê ê yê

ez bi /ne /ya  
ti bî /yê  
o /a bî  
ma bîme  
sima bîyê  
ê bîyê

Di pratîkê de

- Ti kot ra wa?
- Ez Qurze ra wûnê.
- çê kam ra wa?
- Tornê Usênê Mîrzalî ûnê.
- Pîyê to kot o ?
- Nêzonen ke kot o.
- Way biko ti wes a.

Se beno wa bibo = çi dibe wa (bila) bibe

### ARDELANÎ (SINE)

bûyîn			
min	im	-m	bûm
to	î	-t	bûyî
ew	e	-ye	bû
eme	în	-n	bûyîn
ewe	in	-n	bûn
awan	in	-n	bûn

Çîroka dema borî

Min	dêhatî	bûgîm	= Ez gundî bûm.
To	„	bûgî	
ew	„	bûge	
eme	„	bûgîn (bûgîyn)	
ewe	„	bûgîn	
awan	„	bûgîn	

### LAKÎ Û LORÎ

Lêkera bûn

Min	Kurd	im
Tu	Kurd	ît
aw	Kurd	e.
îme	Kurd	îmen
îwe	Kurd	in
awan	Kurd	in

Dema borî

Min ewime mamoste

tu ewit  
aw ewbut  
ême ewîmen  
îwe ewin  
awan ewin.

### GORANÎ

emin Kurde na  
eto Kurde nî  
ou(ai)Kurde ne  
ême Kurden me  
şima Kurden ne  
ouan (ayşan) Kurden ne.

Dema borî

ême	Kurd	bîyana
eto	Kurd	bîyanî
ou(ai)	Kurd	bîyane
ême	Kurd	bîyenîme
şima	Kurd	bîyenne
awan (eyşan)	Kurd	bîyenne

### 15 - DI KURDÎ DE LÊKERA “hebûn”

Ev lêker di zaravan de cuda cuda tê bikaranîn, di du wateyan de tê bikaranîn. Yek di wateya hebûn û jiyana kesani, ya dudyar di wateya xwedîtiyê de.

### KURMANCÎ

Wateya hebûn û jiyana kesani de

Dema niha  
ez heme

Dema borî  
ez hebûm



tu heyî  
ew heye  
em hene  
hûn hene  
ew hene

tu hebû (y)  
ew hebû  
em hebûn  
hûn hebûn  
ew hebûn

Wateya xwedîtiyê de

**Yewmari**

nanê min heye  
nanê we heye  
nanê me heye  
bizina min heye

**zafmarî**

nanên min hene  
nanên we hene  
nanên me hene  
bizinên min hene

**SORANÎ**

wateya hebûn û jiyana kesek,

Dema niha  
min hem  
to heyt  
ew heye  
eme heyn  
êwe hen  
ewan hen

Dema borî  
min bûm (hebûm)  
to bûyt / hebûyt  
ew bû  
ême bûn / hebûn  
êwe bûn  
ewan bûn.

Wateya xwedîtiyê

**Erênî**

min (nan) heme  
to ..... hete  
ew heyetî  
ême hemane  
êwe hetane  
ewan heyane

**nayênî**

min ..... nîme  
to nîte  
ew nîyetî  
ême nîmane  
êwe nîtane  
ewan nîyane.

**KÎRDKÎ**

Wateya hebûn û jîyana kesek de

Dema nika  
ez esta  
ti estî (ê)  
o /a esto /a  
ma estê (îmê)  
şima estê  
ê estê

dema borî  
ez bîya  
ti bîyê  
o /a bî (yo /ya)  
ma bî (bîmê)  
şima bî (yê)  
ê bî (yê)

Diwateya xwedîtiyê de

**yewmarî**

.... ê min esto

.... a min esto

Nayênî.

çîno

**zafmarî**

....ê ma estê

....a ma estê

Ardelanî

Lêkere hebûn

min hem

to heyt

ew hes

eme heyîn

ewe hen

awan hen

Ardelanî

Min nan hes (t)

Kirdkî

nanê mi esto.

Lakî (kelhûrî) û Feylî (Lorî)

Di van herdû zaravên me de wek Kirdkî di dema niha de peyva „dîr“ di dema borî de jî, lêkera „bûn“ tên bikaranîn.

**Dema niha**

min dîrem

tu dîrîyt

aw dîrît

îme dîrîm

îwe dîrin

awan dîrin.

**dema borî**

min bû /m

tu bû

## I - ÇEND MÎNAK JI HEVOKÊN KURDÎ HEVOKSAZÎ - SINTAX

Ev mijare bi serê xwe lêkolîneke kûr dixwaze. Ezê tenê bi çend mînanan li ser rawestim.

1 - Parên peyvê  
Em bi mînakek vê vekin.  
Mînak:

Ez (kiryar) ji Kurdistana gewre (serve) têm (lêker - livbazî).  
I - Kiryar (xwedîyê kirinê, subjekt)  
Mînak:

KURMANCÎ	KIRDKÎ	SORANÎ
Sîdar hat.	Sîdar amo.	Sîdar hat.

II - Livbazî (kirin, bûyîn, livbaziya kiryar bi cîh aniye.)

KURMANCÎ	KIRDKÎ	SORANÎ
Evîn got.	Evîn va.	Evîn wut.

III - Serve (navgîn û tiştên kiryar ji bo wan di livbaziye de ye. Yan jî nav, daçek, hoker û bernavên di hevokê de tên bikaranîn. Du serve hene. yek serva rast, ya dudyan serva nerasterast (nedîrekt).

a - Serva rast.

Dema ku di navbera kiryar û livbaziye de, yan jî, daçek û rengdêrên li pey livbaziye tên û paşgîna zayendê (îzafê) hildigire, bi temamkarê xwe ve dibe serva rast.

KURMANCÎ  
Tu min nas dikî?

Merivên bi salan dinya dîtî.

KIRDKÎ

Pîyê mi Erzingan de hepis o.

Nêweşîya xo zature bîyê.

SORANÎ

To çend mindalakit hen.

Pîyawanî bi salan dinya dîte.

b - Serva li dorê re zivirî, ya nerasterast (nedîrekt).

Dema ku lêker bi tevên daçekan tê bikaranîn, yan jî lêker wek nav û rengdêran tê bikaranîn, awayê serve pêk tîne.

KURMANCÎ

Beriya pirskirina hal û xatirê me got.

KIRDKÎ

Sarwedardena şêx Seîd nêna mi vîr.

SORANÎ

Pêşî hal pirsinî (pirskirdinî) xoman wut,

2 - Hevokên hêsan : Hevokên ne bi hêthevokan zêde hatin virastin.

Mînak:

KURMANCÎ

Usiv kirîvê te ye.

KIRDKÎ

Uswo kewrayê to yo.

SORANÎ

Usiv bîraderê to ye.

I - Hevoka pirsê

a - Bi deng şidandinê û lêvkinê.

KURMANCÎ

Bavê min hat ?

KIRDKÎ

Sima sonê ?

çekê we heye ?  
Lawê min tu naçî dehlê ?

çekê sima estê ?  
Lazê mi /n ti nêsona birr ?

SORANÎ  
Bawkim hat ?  
çekêtan hen ?

b- Bi alîkariya pevgirekê pirsê.

KURMANCÎ  
Gelo zerara xwe heye ?

KIRDKÎ  
Aceva zerarê xo esto ?

SORANÎ  
Botay heye zîyan û zerar ?

c - Bi alîkariya pêşgira (partîkel) pirsê.

KURMANCÎ  
Ma tu wî nas dikî ?  
Ma tu tê têyî?

KIRDKÎ  
ma ti ê naskenê ?  
Ma ti yêna /ê ?

SORANÎ  
Qet piyawî wa dête Juanê ?

d - Bi peyvên pirsê virastina hevoka pirsê.

KURMANCÎ  
Ev çi ye?  
Tu ji ku yî ?  
Ev Kî ye?

KIRDKÎ  
Na çik a ?  
Ti kot ra wa ?  
No kam o?

SORANÎ  
çi katî bû?  
Pareket da be kamyan ?

II - Hevokên baneşan (hewarê )?

KURMANCÎ

Way li min por kurê !

Way li mino, tu bûye  
Feleka min!

KIRDKÎ

Wêêy, wêêy lemin Heyder  
kist, kist !

Limin wêêy ti bîya  
Feleka min !

SORANÎ

Hewarim we ber ew Xulayê teq û tenya ya !  
Hewarim ey Xulayê Cabbara !

3 - Hêthevok

a - Hêthevoka radêr têde delometa kiryarê hildigire.

KURMANCÎ

Xwendinê rind fêr dibim.  
Dor hat, peydakirina defter û qelemê.

KIRDKÎ

Wendenê rind bimisnê.  
Sira amê, peydakerdena defter û qelemê.

SORANÎ

Xwardinekey hêna, de peş mîr na.  
Xwardinî wam, nêwardîewe.

b - Hêthevoka tamamkirinê,

KURMANCÎ

Ma ez zarok nînim ku tu wiha divêjî .  
Ez dizanim ku tu nexweş î.

### KIRDKÎ

Ma ez domon nûne kî ti hen vana.

Ez zonnena ke ti nêweşe.

Mi nîyade ke zonê (ziwanê) xo ha wo amo tever.

### SORANÎ

Cîgey ke tê de rêzdar hen.

Ew baxî buhişte ke merov tê de digerin.

4 - Hevokên rewşê.

### KURMANCÎ

Ta ku bikanibe vegere welatê xwe ew mêvanê me ye.

Piştê kû tu bi rê ketî, min bala xwe dayê ku te pirtûga xwe li vir bîr kiriye.

### KIRDKÎ

Ma tê de rindek zonemê ke ewro zaravê Zazakî de wendenû nusnayan zehmet a. (senik a)

Tirkî ya roza ke saz bîya heta ewro, yasax no ra zonê miletê Kurd ser.

### SORANÎ

Dergay tenekey jûre qorînekem kirdawa takû hawayê pak helmijim.

Cîgay ke tê de rêzdar hen, le gul û kulilk digêhên.

5 - Hevoka relatîv

### KURMANCÎ

Ew gundên li jor, yên li ber qûntara çîyê, gundê Kurdan in.

Ew mêrikê kal, ewê ku di kûçê de diçe, ji ku ye ?

### KIRDKÎ

Tayê herfî, ya ki hêcey kelîmû /an ra êrjîne tever.

Kirmancê ma, yê Soran kî qesa "Kirmanc" eve kar anêne.

Dînê Zerdeştîyêra gureto, ya ki binê tesîra ey de esto.

6 - Hevokên hevgîn.

#### KURMANCÎ

Em rastî hev hatin, me dest dan hev û ez çûm rîya xwe , ew rîya xwe.

Dema ku min li zozanê çîyapanîkê (çapanîk) pez diçêrand, herder dar û ber bûn.

#### KIRDKÎ

Sewa virêne ke ma vîyarnê ra bî sodir, ez ûstine ra xo ser, mi nîyadi ke hevalê min çînê.

Ez ki amûne qatê bin qewa, min kursîyê ont binê xo çay waste.

#### SORANÎ

Kiçekan û kurekanê xoşewîst, gwegir bin, êwe debînim û debîzim, min çi delêm, piçek rawestin.

Reng û rûyê nayab, porî serî zerd, çawekanî gewr w kal bûn.



## ENCAM

Dema ku mirov vî xebatê rind hûr bikole, mirov bi hêsanî têdigêhêje ku cûdahiyek di navbera zaravên bakûr (Kurmancî, Kirdkî) û başûr (Soraniî û zaravên din) de heye. Goraniî di gelek xalan de digêhêje zaravên bakûr. Em dikanin van cûdahiyên wisa rêz bikin:

Zaravên bakûr

1 - Zayend heye.

2 - Bernavên kurtkirî tune

3 - Du awayên bernavan hene

I - Bernavên radêr (rectus)

hene

II - Bernavên tewangî (obliquus)

hene

Zaravên başûr

1 -zayend nîne

(tine, çîno)

2 - Bernavên kurtkirî

hene

3 -Awayekî bernavan

heye.

I - Bernavê radêr

tune

II- Bernavê tewangî

(obliquus) heye

Di Kurdiya başûr de tunebûna bernavê radêr û tewangî sîstema lêkerên têper û têper tevlihev dike. Ji wê di zaravayên başûr de cûdakirina lêkerên têper û teneper gelek zehmet e; tenê bi alîkariya bernavên kurtkirî tê fêmkirin.

4 - Di zaravên bakûr de tîpa

<v> heye

5- Ji tesîra zimanê Kafkasyê

di zaravên bakûr de varyantên

tîpên <ç, t, k, p> yê şidandî

pêkhatine.

6 - Di zaravên bakur de forma

pasîv bi alîkariya lêkera hatinê tê

virastin

4-Di zaravên başûr

de tîpa <v> nîne.

5- Ev varyant nîne

6- Di zarava Başûr

Soraniî de bi alîkarîya

navgîrên <re>, <ra> tê

Yên din dişibên zaravên bakûr.  
7 - Forma ergatîv gelek  
zelal e.

virastin

7 - Forma ergatîv ne  
zelal û xuyaye.

Cudahiyên bingehîn ev in. Di warê bikaranîna daçek, hevokê û wekî din de jî, hinek cudahî hene. Ev cudahiyana gelek bi zelalî rê didin ku em zaravên Kurdî wek bakûr û başûr ji hev biqetînin. Ji ber kû lêparîna lêkeran di Kurmancî û Soranî de hima bigire wek hev in, Pir kes van herdû zaravan wek komek zaravan divînin. Zaravên Kirdkî û Soranî jî, di warê peyvan de û hinek lêkeran de pir caran jî, di bikaranîna daçekan de digêhêjin hev.

Em niha jî, di hinek waran de yekîtî û cudahiyen zaravan, yan jî têkiliyên wan bi hev re û yekîtiyên wan mêze bikin.

## A - KURMANCÎ

Kurmancî û têkiliyên wê bi zaravên din re

### 1- Yekîtiyê Kurmancî û Kirdkî:

Di hemû xalên Me di bin zaravên bakûr de nîşan daye ev herdû zaravan digêhêjin hevdu.

I- Di herdûyan de zayend heye.

	Kurmancî	Kirdkî
Zayenda pevxistinê : Mê	a	a
nêr	ê	ê
Pey paşgînekî	mê	ê
nêr	î	î
Tewanga bangê de	mê	ê
nêr	o	o

Di Kirdkî de zayend hîn dewlementir e. Mînak Lêker jî, di

kestiya sisyan de û peyv di rewşa radêr (nomînatîv) de paşgîna zayendê digire.

II - Du awayên bernavan hene

	Kurmancî	Kirdkî
a - Bernavên radêr (rectus)	ez	ez
	tu	ti
	ew	o / a
	em	ma
	hun	sima
	ew	ê
b - Bernavên Tewangî	min	mi /n
	te	to
	wî	ê
	wê	aye
	me	ma
	we	sima
	wan	îna

III - Di herdu zaravan de Tîpa <v> bi giranî tê bikaranîn û varyantên şidandi yên tîpên <ç, k, p, t> hene.

IV - Di herdû zaravan de jî, lêkera “hatin / amayen” wek lêkera alîkar di virastina forma pasîv de tê bikaranîn.

Mînak :

Kurmancî  
Nan tê xwarin

Kirdkî  
Nan êno werdene.

V - Di herdu zaravan de forma ergetîv heye.

Mînak:

Kurmancî  
Wî ew dîtîn

Kirdkî  
Aye ê dîyê.

VI - Dema mirov li Ferhenga Malmisanij û ferhengokên

Munzur çem li paş romana wî “Hotay Sera Usivê Qurtzkizî” û N. Büyükkaya çêkirî dinêre, mirov dikane bi hêsanî bivêje ku peyvên di herdu zaravan de tê bikaranîn bi hinek lêvkerinên (telafuz) cuda ve ji sedî heştê zêdetir hevdu digirin. Tenê di Kirdkî de peyv di awayê radêr de jî, zayendê pirê caran digire.

Çend lêvkerinên cuda di navbera herdu zaravan de.

### **Kurmancî**

av  
erebe  
ajne / avjenî  
bes  
bizin  
bûyîn  
jêkirin  
cihê  
çar  
dehl / dal  
didan / diran  
idî / êdî  
firnik  
genî  
gulî  
gir  
hêk  
xewn  
ka /kuda  
kevir û kuç  
kiras  
lepik  
jmar /jimartin  
mêrik  
mij  
nav  
nan

### **Kirdkî**

aw / ow  
areve  
azne / ajne  
besên  
bize  
bîyen  
cêkerden  
cîya  
çor / çuar  
dalik  
didon  
êndî  
firne  
gendî  
gile  
girs  
hak  
hewn  
kata  
kemer û kuç ( m < v)  
kuras  
kapik  
maren /moren  
mordem  
miz  
name (m<v)  
non

pelixandin  
pir / pire  
rawestan

rijandin  
sal  
ser  
tirsîn  
dever  
barîn

pelexnayen  
pird  
rawusten (rabûna ser pê, li pê  
sekinîn)  
risnayen / rijnayen  
sar  
sare  
tersayen  
tever / teber  
varayen / vorayen

VII. Hinek peyv û bikaranîna wan di devokên Kurmanciya Hekarî, Botî û Behdînanî de bi tev hevî wek Kirdkî ne.

Mînak:

a- Peyva pirsê <çi, çû> di van devokên Kurmancî û Kirdkî de wekî Mûkrî di wateya negatîv de tê bikaranîn.

**Hak. Bot. Behdînan**

çûkes  
çûne

**Kirdkî**

çikes (tikes)  
çîno

b- Lêparîna lêkera hatinê di van herêman de wek Kirdkî bê afirîndeka hedayê “di” tê çêkirin.

**Hak. Bot. Behdînanî**

hatin  
ez êm  
tu ê /êyî  
ew ê  
em ên  
hûn ên  
ew ên

**Kirdkî**

amayen  
ez êna /yêna  
ti ênê /ênî  
o /a êno / a  
ma ênê /ênîmê  
sima ênê  
ê ênê

c- Hin peyvê tenê li van herêman û Kirdkî de tê bikaranîn.

**Hak. Bot. Behdînan**

evro  
 şiyen (kanîn / şekanîn)  
 lêbelê  
 lay  
 lewîn / rewîn  
 hînge  
 têwerkirin

bîn / bîyîn  
 xweyê  
 hên  
 serva  
 werkirin  
 to  
 herrî  
 konne  
 nêzd  
 qefilîn  
 qeşa  
 qeşirandin  
 simore  
 îna  
 hinard  
 ûwd.

**Kirdkî**

ewro  
 şînayen  
 labelê  
 ley  
 lewayen (r < l)  
 hinge (wê demê)  
 têverkerde (pêçan, nava  
 hev de lurkirin)  
 bîyen (bûn / bûyîn)  
 weyîr / wayîr  
 hên  
 serva  
 werkerden  
 to  
 herr  
 konne  
 nêzd  
 qefilyayen  
 qeşa  
 qeşernayen  
 simore (simbolek)  
 na / no  
 ard

d - Him li botan û Hekarî û him di vê zarava me de tîpa <h>  
 tînin serê peyvên bi tîpekî dengdêr destpêkirî.

**Li deverên din**

anîn  
 ew  
 ûwd.

**B. û Hekarî**

hênan  
 hewe

**Kirdkî**

herd / hard  
 hewr / hawr

## 2 - Cudahiyên zarava Kurmancî û Kirdkî.

Em dikanin cudahiyên van herdu zaravên bakûr wisa rêz bikin.

I - Di Kurmancî de gava lêker di dema niha de tê lêparîn bi giranî afirîndeka hokera “heda” <di> li ber lêkeran tê bikaranîn. Di Kirdkî de tenê di devoka başûr de awayek vê heye, wekî din yan nayê bikaranîn yan jî, di hokeran û berlêkeran de bi dizî maye. (li bin sernivsa dema niha binêrin)

Bê vana ev rika (îddîa) min jî heye; çawa ku min li jêr jî, bi nivisandina tarî daye xuyan, Ev daçek di keştiya yewmara yekan û zafmara yekan ku wekî <a>, <e> xûya ye li paş lêkeran tê bikaranîn. lewre dema ku di Kirdkiya başûr de li ber lêkera tê bikaranîn ya duv lêkeran wenda dibe, ev yek, ya dudyar di Kirdkî de berlêkerên lêkerên vebirî (veqetandek) dema di dema niha de jî, lêker tê qetandin û li duv lêkeran tê bikaranîn

Mînak ; 1

rakewten = kotena ra ûwd.

Mînak:2

**Kurmancî**

ez **divînim**

ez **didim**

**Kirdkî**

ez **vînena**

ez **dana** û hwd.

II - Di Kirdkî de bi piranî daçek li pey navan, yanî bi awayê forma helbestî (poesî) tê bikaranîn, Di Kurmancî de tenê di helbestan de û di devoka Behdinî de jî, gelek caran tê bikaranîn.

Mînak:

**Kurmancî**

**ser seran, ser çavan.**

**nayê bîra min**

**Kirdkî**

**serê min sero,çimûnê min sero**

**nêna mi vîr.**

ber çavê min

çimunê mi ver.

### Botî Behdînî

Erê lawê min te çend dost hene.

=Erê lawê min çend dostê te hene.

Babo min gelek hene.

min pê çênabît

=Pê min çê nabî.

III-Di zarava Kirdkî de hinek dengên kevn neguherîne wek xwe mane , lê dîftonga “xw” tipek xwe wenda kiriye. (li bin sernivsa veguhestina dengan binêrin.)

### 3- Hin tegînen cuda xuyadikin lê bi bingehîn ne cuda nin

I - Hinek peyvên di Kirdkî de cuda xuya dikin, lê dema mirov li hêla semantîk û virastina peyvê ve lê binêre tên fêmkirin. Vaciyê wê jî, wisa ye, em tenê çend mînakan bidin.

#### Kirdkî

adaşt, adeş (alî, hêl, hêt)  
arey (aş)  
arîye (xurnî,)

az, aj kerden (lul kirin)  
ban akerden (derva kirin)  
berbayan, bervayen,  
(bermayen)

bêvind (bê rawestan)  
cayê xwî (xo) dîyen  
çiriyayen (çirî=nûça xirav)

deverdayen (berjêrkirin)  
dexerîyayen (xevra çûyîn)

Di Kurmancî de tê fêmkirin (h. semantiki ve)

=Ji peyva tenîştê;“tenîştê min”  
= ji peyva ard, arvan afirîye.  
= Xwarinak li ser nigan tê xwarin, reyî.

= aj kirin, daran aj kirin.  
= ban (banê xanî) vekirin  
= (girîn) ber da way û wax kirin, berketin“Wer ber dikeve hesrê çavan naskine”

=bê bîhn, bê behna xwe bigire.  
= ciyê xwe dîyîn (dîn, dîtin)  
= ji “çiriya te were” tê fêmkirin.

= daberdan, berjêr berdan  
= xericîn, daxericîn, de + xeriqî> xerî



dery rî decayen (dêjayen)	= ey re > wey re > we re eşan (dejan)
doman (zarok)	= li pey man, nivşê li du hatî hîştin, dûnde jî peyva dûv + man =dûman.
era, êra (xw-e + ra)	=“e (ê)”kestîya sisyan ya veşartî ye
ra	=“ra” navgira tewangê ye.
era vîr kerden	= xwe re (ra) bîr ketin.
era dest kewten	= xwe re (ra) dest ketin.
ero ci pîyayen	= xwe re (ra) lê payîn
fek (dev)	= ji peyva vekirinê “vek” tê fêmkirin
gala bere kerden	= pê re galmê kirin, galmê pê re kirin.
gerey xwi (xo) bere kerden	= giliyên xwe pê re kirin.
gurenayen ( gûrenayen)	= di gorina (karina) xwe de bûyîn, karandin.
het >hêt (hêl, alî)	= Hêta rastê, yanê aliyê rastê.
hembaz >embaz >imbaz	= yanê kesên bi hev re ne, bi hev re baz didin, ango hevaltî dikin, hem taş.
hemilnayen	= hemilandin
hesi piro anten	= hezkirina xwe pê re anin.
hetiknayen	= hetika wi kir cîh, ango, rezil kirin.
hayî ro ci biyayen	= haya xwe jê bûyin, wateya semantiki yeke
hewn ra sayene	= xew (n) ra çûyîn.
Hîrê (sisê)	= Di gelek zaravên Êraniya bakûra rojava de “tr” xwe guheziye “f” “k” û “h” Mînak: Putra > Kur , tri >hirê >fer ûwd. Birastî hejmara sisyan di Kurmancî de “fer”e. pesva

“sê” ji Farisî tê (ev rika min e)  
ji yeki re “fer” nayê gotin  
“tek” (tenê yek) tê gotin. çend  
peyvên wisa hene.

Mînak:

Kirdkî	Kurmancî
hêr (hira)	fire
hîrê	fer

hure (hev)

= wateya “hev”ê dide .

Mînak :

Kirdkî	Kurmancî
hure arden	hev anîn
hure kewten	hev ketin
hure nayan	(li) hev dayîn

= karkirin, karîn.

karîten

kelaverden (So: keleşîr=dik) = beranberdan, mantiq yek e.

kist (kişt)

= ji peyva “tenîşt”ê tê fêm  
kîrin.

ko , kue

= wek “kox” Mina koxê

Bîhngulê

Kose xemilnayan (gaxend)

= li hinek deverên Serhedê jî

Kosegelî tê gotin ango piro

ziya newrozê (serê salê)

Kuşad (henek, yarî)

= ji “ku” + “şad” pêk hatiye û  
tê fêmkîrin.

lemat (lepat, M >v >b >p)

= bi hesanî tê fêmkîrin.

lew pi ra nayan

= lêv pê re dayîn, ango

maçkîrin.

lêr kerden

= glêr kîrin.

lew verra dayen

= lêv berdan

leyrek (So: roley, roleyr)

= levrek : nerm teze, çêlik

(tejik) jî teze ne.

Ma (maykî)

= mak, wek “bermak”

masayan (qelew, perçivin)

= peyva “masî” bi mecazîti bo

	qelewbunê
	tê bikaranîn. Minak: Wer xurt e wek masî ye. bi vê hêlê ve bi hesanî tê fêmkirin.
Misnayen ( m >v)	= hevisandin (li Garzan û Botan) hînbûn, fêrbûn
namiten (nimiten)	= Ji nimandinê tê fêmkirin.
nayen	= nan, nayin (pirnayê bikaranîn.)
panayen	= pê ve nayen, pê ve kirin
pawiten	= payîn (li yekî)
pade (pêde) şîyayen	= pê de, pê ve çûyîn
ravêrnayen	= rawirandin (derbazbûn)
rawisten (rausten, rawurzen)	= rabûna ser nigan, peyva "rawestan" hêla wateyîva ev peyv bi xwe ye.
rasnayen (restnayen)	= Gîhandina derek, rasthatin, rastêbûn
(ra) romerdayen	= ramedyan
sînayen (hezkerden)	= girtina sînê, di sîna xwe de hewandin, hez kirin. Mirov dikana vê tim bi kar bîne. sînê sînê sînemê , gelo ? ne di wateya êvîndarê de ye ?
şanayen (dan ber)	= Di nav gelê me yê Kurmanc de bi pirani di peyvîna hin deverê Serhedê de ji bo beran, nerî, gayên dikin rik, nig didin erdê û tu tande jî, naçe, tê bi karanîn.
	Mînak:
	"Ga nig şa da." ev ji vê lêkerê tê.
tadayen (badayîn)	= têdayen, badan
tepişyayen (girtin)	= Dema serê xaniyek tê girtin ev lêker tê bikaranîn.

tever (der)	Mînak: “hima wer tepişand”, yanê rind negirt. = der, dever û teber ji yek rayekî ne.
vecîyayen (vejîyayen, veten)	= vejenîn, jê vekirin, jê derxistin.
vêsayen	= sotin (vesotin), sojin (vesojin)
vindayen (vîn = bîn)	= bîhnek dayîn (bîndayen)
virasten (çêkirin)	Mînak: Lo lo em westiyan hela bînek bide. = ristin, rastin >verastin.
viz (s)nayen (viz=biz)	= bizdandin.
vîyartin (vîyar = bihur)	= bihurandin, buhurîn
wedayayen (xo dano we)	= vetelandin, xwe vedanîn.
weçînayen	= veçinîn
welî bi to ra	= xwelî bi te ra (li te be)
wenaye ( waha)	= wanakê
waternayen	= wêrandin
wêca (wî cî yî)	= li wî cîh wîcî
zeydnayen	= zêde kirin.
zigar	= zixar
zurî (derew)	= peyva “direw (derew)” ji du + rî (rê) hatiye afirandin. “Zo (zu)” di Kurmancî de tê wateya “cot (çift)” ango wateya “dudyan”dide. zu + rî ango du + rî bi hesanî tê fêmkirin.

II - Di vî zaravê me de gelek peyv tînen kurtkirin, ez li vir çend peyvên biyanî wek mînak bidim, da ku em kanibin yekîtiyên wek cudahî xuya dikin, fêmkirin.

**Kirdkî**

melmeket  
 meslet  
 mesore  
 movet  
 saden  
 welcax  
 sala, sola (Kurm: şala)  
 îsû  
 û hwd.

**Biyani**

memleket  
 musallat  
 meşverete, muşaverede  
 muhabet  
 şahîtlîk  
 olacak  
 inşallah  
 insan

**4 - Yekîtiyên Kurmancî û Soranî**

Her çiqas di warê rêzmani ve cudahiyên Soranî û Kurmancî hebin, yekîtiyên wan jî, gelek in.

I - Di lêparîna lêkerên dema niha de di herdu zaravan de jî afirîndeka hokera “heda” <di, e> dihê bikaranîn û hima bigire lêparîna lêkeran wekî hev in. çudayiyên hene jî, ji ber bernavên kurtkirî û bernavên radêr tên.

Mînak :

**Kurmancî**

Ez diçim  
 ez dikenim

**Soranî**

min deçim /eçim.  
 min dekenim /ekenim

Hema bigire piraniya lêkeran yek in. (Li bin sernivsa lêkeran binêrin)

II - Bi giranî peyvên tê bikaranîn wekî hev in. Yan jî raya wan yek e.

III - Bernavê tewangî wek hev in.

IV- Piraniya daçek û bikaranîna wan wekî hev in.

V - Virastin û bilêvkirina hevokan hima bigire wekî hev in. Dema ku mirov Kurmancî rind bizane û gohê xwe rind bidiyê gelek têdigêhêje.

### 5 - Cudahiyên Kurmancî û Soranî

Hemû cudahiyên di navbera zaravên bakûr û başûr de di navbera herdu zaravan de hene. Em dîsa jî, bi kurtî rêz bikin.

#### Kurmancî

- I - zayend heye.
- II- Du awayê bernavan hene.
- III-Forma pasîv bi alîkar çêdibe.
- IV - Forma ergetîv gelek zelal e.
- V - Dem wêbê heye.
- VI - Bernavên paşgînkirî tune.
- VII - Daçeka <jî, jê> heye.
- VIII - Formê “ewe”, “awa” tune

#### Soranî

- I - Zayend nîne.
- II - Awayekî bernavan heye.
- III - Bi alîkarîya Pa: <re,ra> çêdibe.
- IV- Ev form ne zelal e.
- V - Dema wêbê nîne.
- VI - Ev bernav hene.
- VII - Ev daçek tune.
- VIII- Ev form heye.

Lê her çiqas ev cudahî hebin jî, dîsa ewqas ne durê hev in.

### 6 - Wekhevîyên Kurmancî û Goranî:

Goranî bi gelek taybetiyên xwe ve digêhêje zaravên bakûr. Û gelek yekîtiyên wî û Kurmancî heye. Em hin xalên girîng wisa rêz bikin.

I - Di herdu zaravan de jî, <î> bi serê xwe di wateya <ev>, <va> de tê bikaranîn. Di zaravên başûra rojava (Feylî, Lakî û wd.) de jî, ev xûya dike.

Mînak :

**Kurmancî**  
ev, va, vê

**Goranî**  
î

vî nêçîrvanî  
îsal  
îşev  
îroj  
îcar

î şîkarwanî  
îsal / îmsal  
îşew / îmşew  
îruj / îmruj  
îmcar

II - Di herdu zaravan de jî, daçeka <jî> tê bikaranîn. Û ev bi taybetî di van herdu zaravan de heye, di zaravên Feylî û Lakî de jî xûya dike, her çûqas di Kirdkî de awayek vê <ci, cê> hebe jî, wekî bikaranîna di van herdu zaravan de nîne.

Mînak:

### Kurmancî

ji nav xanî  
ji Amedê  
ji nav bazarê Mêrdîn.

### Goranî

(ce) je dilî yanne  
(ce) je Amedê  
(ce) je dilî bazarî Mêrdîn.

III - Di herduyan de jî, dengê <v> heye û bi firehî tê bikaranîn.

IV - Hin peyv hene hema bigire tenê di Goranî (Hewremî, Kendûlay) û Kurmancî de xûyadikin û tînen bikaranîn. çend peyv ji wan :

### Kurmancî

gup (perçivî, gupa dev)  
gun  
gîsk  
keşk  
kulîmek  
kun  
kut  
met  
mist

### Goranî

gup  
gun (hêlik)  
gîsk  
keşk  
kulîmek  
kune  
kut  
metî (Soranî : pûre)  
mist / mişt

pir

pizî

sinc

dêl

zarû

xewirandin

xewirî

pir (Sorani û Kirckî de  
di wateya tijî de ye.)

pizî (piziya derpê)

sincaz

dêl

zarû

awiryan

awirya

b- Wekî din jî bê peyvên Farisî û Erebî hema bigire giraniya  
peyvên hevdu digire.

Çend mînak.

### **Kurmancî**

carê

cil

cihê

co

çalav

çavkanî

çepal

da (çunkî)

demrû

diz

dûbare

durust

gerdan

gi / gişt

gîya / gîha

gezik

hewar

hevsan (bo tujkirinê)

heşyar

kevanî/kebanî

kilît

### **Goranî**

carê

cil

ciya

cû

çalaw

çawhanî

çepal

da

demrû

diz

dubare

durus

gerdan

gi

gîyaw

gîze /geze

hewar

hêsan

huşyar

keywanû

kilît



kitik (pisîka nêr)  
ku  
kuçe  
laş  
mam (ap)  
masîgir  
nêzîk  
noker  
nîk (nîka teşîyê)  
pişt  
pîre peya/pîrewer  
pîrejin  
post  
rê  
rû  
ron  
sivik  
şûn  
ta ku  
tarîk  
tenê  
tuj  
tu /te  
zire zir  
jar  
gerew girtin  
ûwd.

kitî  
ku  
kuçe  
leş / laş  
mamû  
masîgir  
nêzîk  
noker  
nuk  
peşt  
pîre peya  
pîrejin  
pust  
ra  
rû  
ruen  
suwuk  
şûn  
ta ku  
tarîk  
tenya  
tîj  
tu /te  
zire zir  
jar  
gir amaden

V - Di herdu zaravan de jî, lêkera hatinê (amayen) bo virastina forma pasîv wek lêkerê alîkar tê bikaranîn.

Mînak

**Kurmancî**

Kurd tên kuştin

**Goranî**

Kurdekey mîyon kiştayî.

VI - Di herdu zaravan de hîna lêparîna lêkeran di gelek ciyan de hevdû digirin.

Mînak :

**Kirmancî**

**Goranî**

Tu dikevî  
ew dikevin

tu /tou mîkefî  
awan mîkefan

Di demê borî û rewayî de jî, gelek cî hevdu digirin.

VII - Tewanga navan hema bigire wekî hev in. (Li bin sernivsa “tewanga navan” binêrin)

VIII - Di herdu zaravan de zayend heye, lê zayenda di zarava Goranî de hema bigire nayê bikaranîn. Hîn gelek yekîtiyên van herdu zaravan hene.

### **7 - Cudahiyên Kurmancî û Goranî**

I - Di Kurmancî de bo dema niha afirîndeka hokera kevn “heda” tê bikaranîn, Di goranî de ji hîkariya Zimanê Farisî daçeka kevn ya “hemi” tê bikaranîn.

Mînak:

**Kurmancî**

**Goranî**

dikevî  
divêje

mîkefî  
maçu

II - Di Goranî de Bernavên kurtkirî yên paşgînkirî hene, di Kurmancî de tenê di keştiya yekan û cîh bi cîh di keştiya dudyan de maye.

III - Di Kurmancî de du awayên bernavan (rectus, obliquus)

heye di Goranî de tenê yê tewangî hene.

IV - Goranî gelek dengên kevn parastîyê hinekên wan di Kurmancî de guherîne.

### **8 - Yekîtiyên Kurmancî û Lorî (Feylî)**

Ev zaravê me jî, gelek di bin hîkarîya zimanê Farisî de maye, lê dîsa yekîtiyên wî û zaravê Kurmancî gelek maye. Ez dikanim nola derfetê di destê xwe de wisa rêz bikim.

I - Radêriya lêkeran û piraniya lêkeran bê guhertin wekî hev in.

Mînak : Hatin, çûn, keftin ûwd.

Ev di warê dema borî de jî, wisa ye.

II - Telafûza axaftinê nola zaravên din gelek nêzîk hev in.

III - Di keştiya dudyan de hîn bernava radêr û tewangî xuya ye.

Mînak:

-zi tey bî = ji te bû.

-tu bîyayî = tu bibya / bibuyayî/bibayî

IV - Di vî zaravî me de hîn afirandeka hokera “heda” li ber navan tê bikaranîn, “li” dîv re ketiye ziman nayê bikaranîn.

Mînak :

- di Platan = di Platan de / li Platanê

- Di şîkarî ahû bî = Di nêçîra ahûyê de bû.  
/ li nêçîra xezalê bû.

V - Di Lorî de jî, wek Kurmancî daçeka “ji” bi awayê “zi” tê bikaranîn.

Mînak:

Zi canê xuş (xwuş)	= ji canê xweş
zi kuca ey /tîya	= ji ku têy
ci re gut.	= jê re got.

VI - Gelek peyvên bi giranî tenê di Kurmancî û Lûrî de tên bikaranîn, hene.

Mînak:

### Kurmancî

tule (se,kuçik)  
saq (çîp, ji qorê berjêr)  
serad  
qey /key  
bimire  
ta  
dak /dayîk  
pizik  
şujin  
genî  
derpê  
çît  
kurtan

### Lorî (Feylî)

tile / tule  
saqe  
seran /serand  
key  
bimire (fermana mirinê)  
ta  
dak  
pize  
suze /size  
gen /genî  
derpê  
çît  
kurta

Bê van dîsa piraniya peyvan hevdu digirin.

Mînak:

dêlik	dêl /dalik
tepe	tepe
zîrek	zîrîn
çê ye.	çê ya
firsend nebî / nevî	firset nevî
serezîr	serejêr
kuro	kuro

çend sal	çen sal
birrîn	bûrrîn
xak bi (li) serî	xak ve serî
jehra mar	jehra mar
mêl	mêl
tay (tay min xebitî)	tay / tey
canê minî	canê minî
hemdemê min	hemdemonim
tu bimînî	tu bimênî
bayê xem	bayê xem
ser kêşim	ser kêşim
tajî	tazu
xonçe	xonçe û hwd.

VII - Forma pasîv ya Feylî hima bigire wek Kurmancî tê virastin.

### 9 - Cudahiyên Kurmancî û Lorî (Feylî)

I - Di Kurmancî de afirîndeka “heda” di dema nika de li ber lêkeran tê bikaranîn. Di lorî ya gundan de ev xêr ji çîroka dema niha tew nayê bikaranîn. Ya bajaran di bin hîkariya Farsî de maye.

II - Di Kurmancî de du tewînekên bernavan hene di Feylî de bê kestîya dudyan ev nîne.

III - Di Kurmancî de bernavên kurtkirî nîne, di Feylî de heye.

IV - Di zaravê Feylî keştiya zafmara yekan de paşgîna wek Kirdkî <îm> tê bikaranîn lê ev di Kurmancî de nîne.

**10- Zarava Lakî (Kelhûrî) jî hema bigire wek Lorî (Feylî) ye**

Ji wê têtikiliyên wî û zaravê Kurmancî jî, wek têtikiliyên van hedu zaravan e. Lê mirov dikane bivêjê Lakî (Kelhûrî) nola Lorî hîn bêtir nêzîkê zaravê Kurmancî ye. Mînak:

Kestiya zafmariya dema niha yekan ya Lakî wek Kurmancî, ya Feylî wek ya Kirdkî ye.

### **11- Ardelanî di awayek navbera Soranî û Lorî de ye**

Têtikiliyên wî û Kurmancî wek têtikiliyên Kurmancî û Soranî û di hin formên rêzimanî de jî, wek têtikiliyên Kurmancî û Lorî ye.

## **B- KIRDKÎ**

### **1 - Têtikiliyên Kirdkî û Kurmancî**

Fermo li bin sernivsên “yekîtîyên Kurmancî û Kirdkî, Cudahiyên Kurmancî û Kirdkî “ binêrin.

### **2 - Têtikiliyên Kirdkî û zaravê Soranî**

Di warê bikaranin gelek rengdêran, hin daçek û lêkerên hevgin (hevdudanî) de, bi taybetî di warê peyvan de digêhêjin hevdu. Bi taybetî devokê Mukrî bêtir nêzê Kirdkî dibe.

I - Rengdêrên herdu zaravan yek in.

#### **Kirdkî**

sîya  
sur  
barîk  
wurde  
zerd  
vila  
berz

#### **Soranî**

sîyaw  
sur  
barîk  
wurd  
zerd  
awala  
berz

sard	sard
asan	asan
kon	kon
pir	pir (tijî)
bon	bon (bêhn)
teysan	teynû
bêgan	bêgîyan
ley	ley / lay

II- Piraniya lêkerên hevgîn wek hev in.  
çend mînak:

**Kirdkî**

**Soranî**

we kerdên	we kirdin
ar kerdên	ar kirdin
Pîyanayên	pîyanusan
pir kerdên	pir kirdin (tijîkirin)
têra kerdên	têro kirdin
dirnayên	dadirîn
kay kerdên	kay kirdin
pirodayên	pirîdayîn (pirîdaye)

Dîsa bê van çend mînakên me li jor dane, virastina gelek  
lêkerên din wek hev in.

Mînak :

**Kirdkî**

**Soranî**

kerden	kirdin
merden	mirdin
nayên	nan (lêkerek alîkare )
nam ra nayên	naw lê nan
kewten	kewtin
berden	birdin
û hîn wek din.	

III - Hîn di herdu zaravan de tîpa <d> ya li paş peyvên wek xwe mane, di Kurmancî de ev ketiye.

<b>Kirdkî</b>	<b>Soranî</b>	<b>Kurmancî</b>
zerd	zerd	zer
kerden	kirdin	kirin
sard / serd	sard	sar
pirde	pirde	pir / pire
ûwd.		

IV - Bê wan peyvên me li jor nivisandîne, hîn gelek peyvên din bi lêvkirina (telafuz) xwe ve wek hev in.

<b>Kirdkî</b>	<b>Soranî</b>
bazine	bazine
herdiş	ereşî / reşî
ko /kuwe	koî / kuwe
henge / mêşe	henge
engustane	engustîla
kulî	kulle
şuwane	şuwan
hengemîn	hengu
şane	şane
lêw	lêw
keynek	keyjek
kerdi	kerde
mil	mil
kam	kam (kî)
koçike	keuçik /koçik
merd	merg / merd
meyman	meywan
tay	hintay / hindaye
têverver	dêwerber
tîj	tîj /tijk



vaten	wutin
vînen	bînîn
bestin	bestin
simore	simore (simbolek)
rawan	rawend
şemşer	şemşer
xo	xo
ewro	ewro /emro
asin	asin
roşt	roşn /roşnayî
wazen/wayştin	wistin
mang	mang
taştin	taştin
ariq	areq (xweydan)
boyen	bogen
arwêş	karwêş
goşare	goşare /guşare
dufişk	dufişk
verg	gurg /gweg
dewe	de /dew
Mestê (sive)	esta (ji naha û pêve)
hêga / hêlga	kêlîga (zevîya acotî)

V - Bi negatîvî bikaranîna peyva pirsê <çi>

### **Kirdkî**

### **Soranî (Mukrî)**

çîno  
çi kes

çi nebû  
çikes

Di warê hevokzanînê, dema borî, çîroka dema borî, rewayê de digêhêjin hevdû.

### **3 - Cûdahiyên Kirdkî û Soranî;**

I - Hemu cûdahiyên di navbera Kurmancî û Soranî de di

navbera Kirdkî û Soranî de jî hene (Li bin sernivsa cûdahîyên Kurmancî û Soranî binêrin.)

II - Daçeka <li> ku duv re ketîye ziman di Kirdkî de nîne, di Soranî de heye. Di Kirdkî de awakî afirîndeka heda <da> tê bikaranîn.

III - Di Soranî de berlêkera <de,e> heye, di Kirdkî de bi giranî nayê bikaranîn.

#### 4 - Yekîtiyên Kirdkî û Lor (Feylî)

I - Di herdu zaravan de jî di zafmariya yekan de bernavê paşgînkiriya Kurtkirî tê bikaranîn.

Mînak:

Kirdkî	Lur (Feylî)
Ma ênîme	îma tiyeyîm
Ma vanîme	îma ewşîm
ma kewtîme	îma keftîm ûwd.

II - Di herdu zaravan de jî, afirîndeka daçeka “heda” bigiranî nayê bikaranîn.

Mînak:

Kirdkî	Lur (Feylî)
ez dana	min dêm
ti kewta	tu keyt û hwd.

III - Di herdû zaravan de jî daçek gelek caran li pey navan tê bikaranîn.

IV - Gelek peyvên herdû zaravan hema bigire wekî hevin.  
Mînak :

## Kirdkî

ma bîyarêm  
uca  
ci re va  
wurza

Her kes degera cengê  
xo nêkenê.

ca  
bîyarê  
name  
resayen  
herdiş  
loqme nun bîyarê.  
pize  
seva çi oma  
teyşan bî  
sine  
ziwan / zuon  
serd  
vir kerdin  
meyman  
nal kerdin  
ver  
veten  
game  
lay / lew  
ded / dedza (pismam)  
nayen

## Lur (Feylî)

îme bîyarêm / bîayêm  
ucî  
cîri wu / gut  
virîsa

her kes buha cengê xu  
nêkenê.

ca  
bîyarê  
num  
resîn  
rîş  
luqme nun bîyarê.  
pize  
sî çi omay / hatîy ?  
tuşan / tuşnam bî.  
sîne  
zevon  
serd  
virkirdin  
mehmun  
nal kerdin / kirdin  
vir  
vezêne  
gum  
la.  
tata / dada (mam / ap)  
nîyan

V - Di Kirdkî de carcaran <n> zafmariyê dikeve û li paşîyê  
<o> yan jî <u> bo zafmariyê dihê bikaranîn. Ev rewş di Feylî  
de jî heye.

Mînak :

## **Kirdkî**

Forma bingehîn      forma bi o

Alan                      Alon > Alo > Alu  
Demenan                Demenon > Demeno > Demenu  
daran                    daron > daro > daru

## **Lur (Feylî)**

Bingehîn                forma bi <o> û bi <u>

Kuran/kurekan/yel    kuro  
Liristan                 Luîsu û hwd.

VI - Di Luî de jî wekî Kirdkî daçeka <bi> bi awayê <ve, eve> tê bikaranîn. Ev herdû zaravana divir de jî digêhêjin hev.

## **Kirdkî**

## **Lorî**

ve                        ve  
eve                        eve

VII - Di herdu zaravan de jî dengê <v> bi giranî dihê bikaranîn.

VIII - Di herdu zaravan de lêkera hebûn di dema niha de bi alikariya peyvek tê virastin, lê dema borî de tenê lêkera "bûn" tê bikaranîn.

## **Kirdkî**

## **Feylî**

Deme nika                Min nanim dîrem.  
Nanê mi esto            yek dustim bî  
Dema borî  
Tavî dostê ma bî

## 5- Cudahîyên Kirdkî û Lorî (feylî)

I - Di Kirdkî de zayend heye, lê di Lorî de wenda bûye.

II - Di Kirdkî de bernavên kurtkirî tenê di zafmariya yekan de heye, lê di Lorî (feylî) de wek zaravên başûr bi giranî tê bikaranîn.

III - Cudahî di çîroka dema niha de heye.

IV - Di Kirdkî de du awayên bernavan hene, di Lorî de tenê yewmariya dudyan de xuya ye.

## 6 - Kirdkî û Lakî (Helhurî).

Bê bernava kurtkiriya zafmariya yekan Lakî jî, wek Lorî (Feylî) ye. Yanî yekê Feylî bizanibe bi hesanî Lakî (Kelhurî) diaxive . Ji wê mirov dikane bi zelalî bivêje yekîtî û cûdahiyê Kirdkî û Lorî ji bo Kirdkî û Lakî jî, derbaz dibin.

## 7 - Kirdkî û Ardelanî (Sine).

Me di pêş de jî, gotibû ev zarav di navbera Soranî û Lorî de ye. Ji wê hewce nake em bi giranî li ser vê mijarê rawestin. Lê em dîsa jî dikanin çend mînakên bidin, ji ber ku gelek girîngin.

### Kirdkî

a-  
vore (berf /befr)  
vore varena  
alinçe  
engîştane  
nîm  
game  
zimistan

### Ardelanî

êware ( dibare, varena)  
befr (wefr) êware.  
halûçe  
enguştar  
nîm  
qam  
zimisan

zama (zava)  
sîne  
vêsayen  
se (sed)  
herrî  
sodir  
veyv

zamawend (dewet, veyv)  
sîne  
esuzen / esuzayen  
se (sed)  
herik  
sozî û hwd.  
weyvî

b- Di ardelanî de jî gava di dema niha de lêker tê lêparîn, zafmariya yekan tim dengê <î> digire Di devokê Kirdkî ya bakûr de ev <îme>

### **Kirdkî**

ma ênîme  
sima ênê  
ma amayîme  
sima amê

### **Ardelanî**

eme eçîn (eçîyn)  
ewe eçin  
eme çûyîm  
ewe çûn

c- Bikaranîna lêkera şînayeyên /şîkayen ê

### **Ardelanî**

Min eşa biçimaw malan. = Ez şîkena ûwd.

### **Kirdkî**

## **8 - Kirdkî û Goranî û yekîtiyên wan.**

Herkes ji ber hinek peyv û lêkeran, deng û bermayiyên kevn van herdu zaravan nezê hev divînin, yan jî, dinirxînin. Lê bi rastî yekîtiyên Feylî, Kelhûrî û Goranî hîn zêdetirin, heta mirov dikane van di komek de binirxîne. Em niha yekîtiyên Goranî û Kirdkî ruberên hev bikin.

I - Kirdkî û Goranî di warê dengên kevn parastinê de digêhêjin hev.

Mînak:

**Kirdkî****Goranî**

a - Dengê <m> neguheziye.

dimê	dimê
game	hengam
zama	zama
name	namî

b - Dengê <v> neguheziye

va	va
verg	verya
vaten	vaten
varan	varan
ver	ver

II - Dîftonga kevn <XW< dengik wenda kiriye.

war	war
weş	weş
xo	wî /we

III - Gelek peyvên herdû zaravan wek hev tên bilêvkin.  
Mînak:

**Kirdkî****Goranî**

a / o (ew)	a / ou
engûrî	angurî
awro /ewro	arû
asin	asin
teber	ber
mil	mil
eşkucî	eşkuçî
cor	cur

çîye	çûy
heş	heş
xoz	xu
hêne	hane /hanî
her	her
kêrga	kerya
leyrik	leyre
milîçik	milî
nîm	nîm
simer	semer
ve (bi)	ve
zimistan	zimisan
ziwan	zuan
vore /vaure	waure
zerence	jereç

IV - Gelek lêker hema bigire wekî hev in.

Çend mînak:

**Kirdkî**

**Goranî**

amayen	ameyan
kewten	keftan
vîsten	vîstan
huwayen	xûayîn
werden	wardan
eşnawiten	şinaftan
kerden	kerden
vaten	vatan
merden	merden
nîyan	nîyan

V - Bikaranîna daçekan jî nêzîkê hev in.



## 9- Cuahiyên Kirdkî û Goranî

I - Her çiqas di Goranî de zayend hebe jî, zêde nayê bikaranîn. Di kirdkî de Bê zayend nabe.

II - Di Goranî de ji hîkariya Farisî di lêparîna dema niha de <mi> ya farisî tê bikaranîn, Di Kirdkî de hema bigire berlêkera dema niha nayê bikaranîn. Paşgînên lêparîna dema niha jî, hevdu nagirin.

Mînak :

### Kirdkî

ez yêna  
ti yênê  
a /o yêna /o  
ma yênê /yênîme  
sima yênê  
ê yênê

### Goranî

emin milû  
tu milûî /milî  
ou milû (ad, adê)  
îma milûîme (yek in)  
şima milûîdî  
auşan milûyan

III- Di Kirdkî de du tewangê navan (rectus, obliquus) hene, di Goranî de wek zaravên başûr tenê bernava tewangî heye.

IV - Di Goranî de bernavên paşgînkiriyên kurtkirî hene, ev di Kirdkî de tune.

V - Di Goranî de wek Kurmancî daçeka <ci, ji> bi giranî tê bikaranîn, di Kirdkî de wezîfa wê jî <ra> yê hilgirtiye.

VI - Di Goranî de paşgirên <awa, ere> wateya dubariyê li lêkeran bar dike bi giranî tê bikaranîn, ev Kirdkî de nîne. Tenê bi awayê <era>, <ero> li pêş lêkeran bikaranînek heye ew wateya lêkeran xurt dike.

VII - Di Goranî de wek Kurmancî ablatîva kevn dijî, ev di Kirdkî de nîne.

## C- SORANÎ

### 1- Yekîti û cudahiyên Soranî û Kurmancî

Min bi bingehîn di bin sernivsa “yekîtiyên Kurmancî û Soranî û Cudahiyên Soranî û Kurmancî” de dane zelalkirin, fermo lê binêrin.

### 2- Soranî û Kirdkî

Fermo li bin sernivîsa Kirdkî binêrin.

### 3- Yekîtiyên Soranî û zaravên başûr yên din

Ez dikanim bivêjim ku Soranî wek zimanê nivisandinê bikar tê hîkariya wê li hemû zaravên başûr bûye. Bê vê gelê me yên zaravên başûrên din diaxive jî, Soranî wek zimanê nivisandinê pejirandiye (bigiranî). Ez dîsa jî, çend yekîtiyên wan li vir diyar bikim.

I - Di hemûyan de bernavên Kurtkirî hene.

II - Di giştan de paşgirên dubarkirinê <ewe> tên bikaranîn.

III - Di hemûyan de tenê bernavên Tewangî hene.

IV - Bi giranî peyvên wan hevdû digirin.

### 4 - Cudahiyên wan

I - Di Feylî Goranî û Lakî de dengê <V> hîn bi giranî dijî, ev deng di Soranî de wenda bûye.

II - Forma pasîv di Goranî de wek zaravên bakûr, Di Feylî Lakî û Ardelanî de bi alîkariya raya lêkera “hatinê” <e> û forma kevn tên virastin. Di Soranî de bi alîkariya paşgirên <re, ra> tên virastin.

III - Gelek peyvên zaravên din telafuza xwe wek telafuza zaravên bakûr in.

### D- ZARAVÊN BAŞÛRA ROJHILAT Û GORANÎ

Ev zarav ev in; Lorî (bi taybetî devokê Feylî), Lakî (Kelhûrî), Kermansahî , devokên Goranî û zaravên navînên biçûk.

Ev zaravan ger ji hêla lêvkirin de be, di hêla bikaranîna lêkeran, daçekan , rengdêran de digêhêjin hev. Kesên van zaravan hema bigire ji sedî heştê hevdû fêmkirin. Goranî jî, di pir xalan de digêhêje van zaravan, Mirov dikane bêşik bivêje Goranî zaravek di nabera, Zaravên Bakûr û zaravên başûrê rojava de ye.

Cudahiyên van zaravan yên herî giring, kîjan zêdetir di bin hîkariya Farisî û zaravê Soranî de mayîne.

#### 1- Yekîtiyên Z. B. Rojhilat û Zaravên bakûr

I - Di herdû koman de jî, dengê <V> bi giranî tê bikaranîn. û tev dengê <b> gelek caran vedilîze.

II - Forma pasîv gelek nêzê hev e, di Z. B. Rojhilat de forma kevn û rayê lêkera <hatinê> bi hev re tê bikaranîn. Di koma bakûr de herdu bi serê xwe ne.

III - Peyvên wan bi giranî wekî hev in, lêvkirin (telafuz) hema bigire yek e. Eger mirov hîkariya Farisî ji ser bavêje. Bi tevhevî tê fêmkirin.

IV - Di herdu Koman de jî, daçekên <Ji, ci, zi> û <re, ra, erê> di wateya xwe ya bingehîn de tê bikaranîn. Bê van bi giranî, di cîhê daçeka nû <li> de bi giranî afirîndeka daçeka kevn <di, dil> tê bikaranîn.

V - Formên lêkeran di awayê partîzîp de, û di lêparîne de

wekî hev in. Bê van rengdêr û bikaranîna wan, û virastina hevokan nêzîkê hev in.

## **2 - Cudahiyên van zaravan**

I - Di zaravên bakûr de du awayên bernavan hene. di Z. B. Rojhilat de tenê çend nîşanê wan mane.

Mînak:

**Feylî**

**Goranî**

Kestiya dudyan de  
tu te /y

Kestiya sisyan de  
ou ad /ade

II - Di zaravên Bakûr de forma ergetîv gelek zelal e. Di Z. B. Rohilat de ev ewqas ne zelal e.

III - Di Z. B. Rojhelat de Bernavên Kurtkirî hene û tên bikaranîn. Lê di zaravên bakûr de tenê çend paşmayî hene.

IV - Di zaravên Bakûr de zayand hene û di peyvînê de tê bikaranîn, Di Z. B. Rojhilat de her çiqas xuyake jî, bi giranî nayê bikaranîn.

## **GOTINA DAWIYÊ**

A-Dema mirov vê xebatê hûr bikole, gelek bi hêsan dikane klasifikationa zaravan bike. Ezê bi nola materyalê di destê xwe û zanîna xwe wisa tasnîf bikim.

**1 - Zaravên Bakûr** : Kurmancî û Kirdkî

**2 - Zaravên Başûr** : Soranî bi devokên xwe wek Mukrî û Suleymanî.

**3 - Zaravên Başûrê Rojhilat** : Lorî (Feylî û devokên din),

Lakî ( Kelhurî û devokên din) û zaravên derdora Kermansahê.

**Goranî zaravek** di navbera Zaravên Bakûr û Z. B. Rojhilat de ye. Hela giramatîkî ve bi giranî mêla xwe li ser Zaravên Bakûr e.

**Ardelanî (Sine)** : Di hinek xalan de digêhêje Zaravên Başûrê Rojhilat. Lê bi giranî digêhêje devokên Soranî, yanî wek devokek Soranî xuya dike. Ji wê gelek kes vê wek devokek Soranî dinirxînin.

B- Dema mirov vê xebatê yan jî zaravan rind lêbikole, Mirov bi hêsanî têdigêhêje ku zaravê Kurmancî hem bi aliyê rêzimanî dewlemendiya xwe ve, him karakterê hemû zaravan di nav xwe de hilgirtîne ve û hem jî, bi hêla hemû Karakterên Zimanê Kurdî û cudahiyên di naber a zimanê Kurdî û zimanê Êraniyên din de di nav xwe de parastîne ve zaravê herî dewlemend e. Eger em minak bidin.

1- Di Kurmancî de Hemû demên wêbê ( çîroka dema wêbê, dema wêbê, dema wêbê ya di pêşeroja de diqede.) hene, lê di zaravên din de ev dem nayê bikaranîn.

2 - Forma vokatîv gelek zelal e, Hem di yewmarî û hem jî, di zafmariyê de bi dewlemendî tê bikaranîn. Ev di zaravên din de xuyake jî, ne wek Kurmancî dewlemend e.

3 - Forma Ergetîv jî wisa ye.

4 - Hema bigire karakterên hemû zaravan di nav xwe de hildigire. Mirov dikane hemû zaravan, yan jî nîşanên wan di Kurmancî de gelek bi zelali bivîne. Hete ez dikanim bi hêsanî bivêjim, Kurmancî zaravek hemû zaravan bi hev ve giredide, ye.

## K- FERHENGOK Û TÊGÎN

Ezê di vê mijarê de hin peyvên min di vê xebatê de bi kar aniye, jî bo xwendewan bi hesanî têbigêhêjin, Ferhengek biçûk û Mijara têtîgînên Rêzimanî bigirim destê xwe. Min berê jî\* li ser vê mijarê hinek tişt nivisandibû. Ezê li vir hîn bi firehî li ser rawestim. Daxwaza min, terminolojiyek hêsan, bi aheng û di hemû zaravan de bê egerek tê bikaranîn, e.

Îroj terminolojiya Latînî ya rêzimanî navnetewî û bi taybetî di nav netewên Îndo- Ewropî de hatiye pejirandin. Pirkes ev bi qismî wergerandine zimanê xwe. Ezê di vê mijarê de jî li ser wateya van têtîgînan (terminus) di Latînî de bi Kurdî şirovebikim, bersivên wan di Kurdî de bidim, û kî di rêziman de çi bikaraniye û rûberê hev bikim. ezê li ser vê rawestim, ma gelo mirov dikane van têtîgînan tîk bikaranîn di hemû zaravan de bê têtîgîhîştinekê xelet yan vacî bikarbîne.

**Afirîndek** : Tiştên li ser rayê tiştên din pêkhatine, ji rayek afirîn, pêkhatin, ji rayek (kokek) derketin, (türeme) Mînak: daçeka <di> ji daçeka <heda> derketiye.

**Radeng (Artikulatorî)** : Peyva Latînî bi Kurdî tê wateya, cîhê deng jê derdikevin, kaniya dengan ku devê mirova ne.

**Nasdar (Attrîbût)**: Peyva latînî tê wateya tiştên pê re, li gel, pê ve kirî drûv (durf), nasandar, tamamkarê peyvê. Yan jî drufkirin, nîşankirin, sombolkirin û fermandayînek dide xuyan. Dr. K. Bedirxan navê vê têtîgîne <xuyadar> danîye Mirov dikane jêre <drûv> <drufîn> jî bivêje. Hin jêre danasîn dibêjin.

**Awa (Variant)** : Peyva variant Latînî ye, tê wateya awa û

---

\* Di "Rewşen" a li Almaniyayê de hat weşandin.

rengên tiştan. Mînak varyantên Tîpan ûwd.

**Berlêker** : Daçek, peyv û pêşgînên li ber lêkeran tên bikaranîn, bi latînî Praefix yan jî, partîkel tê gotin.

**Bernav** : Ez di vir de di wateya pronomen de bi kar tînin. Yanî peyvên di cîhên navan de tên bikaranîn. Min çima ev bikaranî, dikanim wisa zelal bikim. Ji ber ku di zaravê me yê Kirdkî de tîpa <g> carcaran xwe diguhezîne tîpa <c> ew ji <gû> re <cî> divêjin. Dema mirov ji vê têgînê re <cînav> bivêje, kesên vî zaravî dipeyîvin wê awakî din fêm bikin. Piraniya kesên li ser vê zaravê dinivîsin ji ber vê egerê <bernav> ê bi kar tînin. (Lerzan Jandil) Û ev peyv bersiva vê têgînê yanî bersiva <pronomê> dide. Li hêla din divêt dema em têgînek dipejirînin wateya wana di zaravan de jî, bigirin ber çav. Dr. K. Bedirxan ji vê têgînê re <Pronav> gotiye, lê ev niv Latînî û niv Kurdî ye. Kurdên Soran ji vê têgînê re <ranaw> dibêjin, lê pêşgîna <ra> wateya <ber û cîh> li peyvan bar nake, ji wê ev jî bersiva pronomîna nade.

**Bernavên Radêr (rectus)** : Ev tê wateya bernavên hîn nehatine tewandin û tu paşgîn û pêşgîn negirtî yanî di awayê nomînativ de ne. Soran di cîhê <radêr> de peyva <cawk> bi kar tînin. ji ber ku ev awayê bernav di vî zaravê me de nîne, nav jî, lê nekirine. Ev bernav ev in: Ez, tu ûwd.

**Bernavên Tewangî (obliquus)** : Bernavên hetine tewandin, yanî di awayê tewangî de ne. Di Kurdî de ev bernav him di awayê xwedîtî de ye him jî, dema borî yê lêkerên têper bi alîkariya van bernavan tên lêparîn. Ev bernav ev in: min te/ to ûwd.

**Bernavên Kurtkirî (awayek Kopula)** : Bernavên kesaniyên kurtkirî û wek paşgîn tên bikaranîn. Mînak : ..m, ...t, ...y, ...man, ...tan, ...yan. Ev di zaravên bakûr de bi piranî wenda bûye. Lê di zaravên başûr de bi giranî tên bikaranîn.

**Bernavên şandek (demostrativ)** : Bernavên mirov bi alîkariya wan tişt û heyiyan zindî nişan dike. Mînak : ev /na, ew / no. ûwd.

**Bernavên nenas (indefinita)** : Bernavên veşartî ne û ne xuya ne. Mînak : Min gotê, dey ra va.

**Bernavên peywendî (possesiv)** : Bernavên xwedîtiya heyyek dinirxîne, yê kê ye, aîde kê ye dide xuyan. Mînak : yê min, ya, hîn ûwd.

**Bernavên Serbixwe** : Bernavên girêdayiyê tu heyyê nîne, li ber hemû heyyan tê bikaranîn. Mînak : xwe, jê, ci û hwd.

**Bernavên hevgin (contracte)** : Di nav hev de helîn daçek û bernavan van bernavên hevgin diafirîne, mînak: jê, lê, pê ûwd. Dr. K. Bedirxan navê vê têgînê “Pronavê lihevxiştî” daniye. Ev peyv him giran û him jî bersiva vê têgînê bi tevhevî nade. Mirov bi hesanî dikane jê re bivêje “ **Bernava Hevgin**”. Ev peyv afirandinek nû nine, di nava gel de jî tê bikaranîn ( mînak: dema du kes ji hevûdû hez bikin mirov divêje “Xwedê we hevgin e ). Mînak : hevdu, yektir, yewbîn ûwd.

**Bernavên Pirsê (Interrogara)** : Cînavên ji pirsan hatiye virastin. Mînak: kî, kam, kîjan ûwd.

**Bernavên nexuya** : Ew bernavên gelekîyek bê hêjmar dinirxîne, wek peyvên serbixwe xuya ye. Mînak : çend, hin, tay ûwd.

**Bûgin** : Ev ji zaravê Ardelanî ye, tê wateya <bûyînek>, hebûnek, bi Tirkî <olgu> dibêjin. Mirov dikane di warê felsefê û ramiyê de bi kar bîne.

**Daçek (praeposition)**: Peyva Latînî ji du peyvên hatîye virastin yek “prae” tê wateya ber, pêş, li ber, li pêş. Mînak; li ber derî. Yê dudyan “Position” di wateya druv, tevger û rewşê de ye. Praeposition : tê wateya peyvên bi serê xwe bi giranî bê wate ye û li ber peyvên tê bikaranîn re tê gotin. Dr. K. Bedirxan navê vê têgînê “daçek” daniye û ev hema bigire rûniştîye. Kurdên Soran jê re “amraz” dibêjin.

**Dengzan (Phonetik)** : Bi nav netewîtiya peyva Phonetîk tê bikaranîn û “Phon” di wateya deng de ye. Mînak dengê di zimanê Kurdî de.

#### TÊGÎNÊN CÎHÊ DERKETINA DENGAN,

**Lêvî (labîal)** : Ji dengên (tîpên) bi alîkariya herdû lêvan tên derxistin re dengên lêvî tên gotin. Mînak: b, p ûwd.

**Lêv û didanî (labiodental)** : Cîhên dengên bi alîkariya lêv



û didanan tên derxistin. Mînak: v, f.

**Didanî (dental)** : Dengên bi alîkariya didanan tên derxistin.  
Mînak : d, t, z.

**Paşpidî (alveolar)** : Dengên li paşpidîyên didanan derdikevin. Mînak : ç, c.

**Ezmanê stûr (Praepaletal)** : Di asûmanê dev de cîhên hinek dengên stûr (hişk) derdikeve û ev deng, ber û pey ezmanê stûr jî hene. Mînak : k, s,

**Ezmanê nerm (velar)** : Li paşiya asûmanê dev de jî hinek deng derdikevin, ji van re jî, dengê velar tê gotin.

Mînak : g, q.

**Zimanê Biçuk (uvular)**: Ev deng di zimanê me de nîne, tenê çend dengê Erebî hene.

**Qirikî (pharingal)** : Ji dengê ji qirikê derdikeve re dengê qirikî tê gotin, di zimanê me de tenê tîpa “h” heye.

**Fîtikî (plosiv)** : Dengên di derketinê de bi fîtikî derdikevin re tê gotin. Tevhevên dangan ya bi fîtikî ye yan jî bê fîtik in. (li dengzanîne binêre.)

**Lêgerî (Frikativ)** : ji dengên dema derketinê de li nav dev û didan de diçe û tê re lêgerî tê gotin. Mînak : v, z,

**Pozî** : Hinek deng bi alîkariya poz derdikevin mîna <n> , ev dengên pozî ne.

**Layêre (lateral)** : Dengên di ber re derdikeve.

**Fijiqî (vibrantin)** : dengên ji dev bi fijiqînê derdikevin, yan jî, ji dev difijiqe.

**Fonem** : Di wateya deng de ye lê bo jûbînek jî, tê bikaranîn.

**Kombînekirî** : Mirov dikane jê re hevhatî bêje, tiştên li hev tînan.

**Fakultatîv.** : Di wateya divêtî, mecal, derfetên cûr bi cûr, îmkanên din de ye.

**Delomet** : di wateya wezîfe de ye,

**Dem** : wext, zaman, di vir de di wateya awayên lêparîna lêkeran de tê bikaranîn. Mînak : Dema niha.

**Dema niha (Praesens)**: gava livbaziyeke tê kirin û mirov yan jî heyî di nav livbaziye û çalakiye de ye û hîn neqediyaye. Mînak Ez tîm, tu diçî.

**Dema borî (Praeterîtum).** Ji hemû demên derbazbûye, buhurî û rawiriye re tê gotin, çend awayên vê demê hene.

**Dema borîya têdayî (perfectus)** :Bê kêmasî qedandin, xilaskirin, û karê niha bi tevhevî qedyaye, mirov bi xwe ev bûgîn jiyaye û qedandina wê dîtiye. Mînak : Sîdar do hat.(min bi çavên xwe dît.) Dr. K. Bedirxan navê vê têngînê <Boriya têdayî> daniye. Qanatê Kurdo jê re <wexta berê buhurî> lê boriya têdayî hima bigire runiştîye.

**Dema Boriya dudar (passe sîmple, indirekt).** Ev tê wateya tiştên cûda, bi hev re nehatine danîn. Dema ku mirov ne raste rast di dorê re bîfitile, yan jî ji devê yekê din bibîhîse û bivêje. Di rêziman de jê re passe simple divêjin. Mînak : Sîdar do hatiye. (Yê ku ev gotiye, bi çavên xwe nedîtiye, ji yekî bihîstiye. yan jî wisa bawer dike.) Dr. K. Bedirxan jê re <boriya dudar> gotiye Qanatê Kurdo navê vê têngînê. <Wexta berê niha> daniye. Bi dîtina min û rastî <Boriya Dudar> him rast û him jê çêtir e.

**Çîroka dema borî (Plus-quam-perfect)** :Peyva Latînî tê vî wateyî ; Plus: Piranî, zêdeyî û rindiya erênî. Quam : Dema ku wekî û mîna. Perfect : Bê kêmasî bi cîh anîn. Di rêziman de dema bûyînek yan kirinek di nav dema borî de bê qedandin û di çîrokê de bimîne, Jêre Plus quam perfect tê gotin.

Mînak : Sîdar pêr hati bû,

Sîdar par hatibû. (gelek dem di ser re derbaz bûye, êdî bûye çîrok.)

**Çîroka dema niha (imperfect)** : Dema bûyînek yan jî kirinek di dema borî de bidomê, yanî di vegotina çîrokê de bikaranîna dema niha re çîroka “Dema Niha” tê gotin. Dr. K. Bedirxan navê vê têngînê “çîroka dema niha” daniye, û ev di ziman de rûniştîye.

**Dêndem (futur 1):** Dema hîn li ber kirinek û bûyînekî, li pêş e. Dema mirov bixwaze tawayek (tiştêk) bê zivirandin bike û bi cîh bîne, ev dem tê bikaranîn. Dr. K. Bedirxan jê re “Dema wêbê”, Qanatê Kurdo “Paşwext” gotiye. Mirov dikane. Bi kurtî “ Dêndem” bivêje.

Di vir de zimanzanên me ji hev diqetin û tukes “dên” wek

lêker napejirîne. Dema em li Farisî mêze dikin, Lêkera “şûden” kû ji lêkera “bûyînê” afirîye tê bikaranîn. Dîsa di gelek zimanê Îndo - Germanî de bi awayê Farisî ji lêkera “bûyînê” lêkerên alîkar ji bo dema nika afirîne. Di zaravên me yên Feylî Kelhûrî û Ardelanî de bo forma pasîv jî awayek vê lêkerê tê bikaranîn. Bikaranîna wê ya di dema wêbê ya Kurmancî de nîşana lêkerik serbixwebûyîna vê lêkerê tesdîq dike. Ji wê ez dibêjim. Lêkera “dên” lêkerik serbixwe ye û bi dîtina min mirov dikane navê vê têgînê “dema dên” yan jî, “dêndem” lêke.

**Dêndema duduyan (Futur II):** Ev jî, dema mirov bê şik bawer bike ku mirov dikane kirinek yan jî, karekî bi cîh bîne, yan jî demak mirov bi berad, çalm, quretî û pozbilindî bivêje ez dikanim filan karî bi cîh bînim, vê formê bikartîne. Ev bê zaravê Kurmancî di zaravên din de ne xuya û zelal e.

**Drûv :** şikil, xesyet, wesf.

**Evolution :** Pêvajoka pêkhetinê, di pêvajokek kur û dirêj de guhertin û veguhezîn, dem û domdariya pêkhatin û veguhezînê.

**Êlat :** Eşîr, komekî malbatên ji yek rîçalek, yan jî xwe ji yek rîçalek dihesibîne.

**Fermî :** Resmî, bi nasnameyî.

**Hevgîn :** Yekbûnek, di nav hev de helîna çend tiştan, hevdudanî, bargiranî, tiştên gîhîştine hevdû.

**Hevok :** Cumle, bi Soranî “rist”, Komek peyvên jê dîtin û hestek tê fêmkirin.

**Hêthevok :** “Hêt” bi Kirdkî ye û tê wateya alî, hêl û gel tişteki. Yanê hevokên alîkar yên hevoka bingehîn tamam û têr dike.

**Hoker (Adverb):** Tiştên ji bo der û dorê tînin gotin. Peyvên dûrî, der, cîh, dem, rewşek, erênî, nayênî, piranî û kêmiyek dinirxîne re Hoker tê gotin. Dr. K. Bedirxan navê vê têgînê “Hoker” , Qanatê Kurdo jî fêlnîş lêkiriye. Di zimanê me de “hoker” rûniştîye. Soran “hokar” divêjin.

**Jîyana Komaleyî :** Jîyan û heyata miletek, yan jî komek mirovan bihev re dijîn û jiyanê dajon. Jiyana civakî.

**Jûbîn** : Peyvek Kirdkî ye, di wateya komikek, tevheviyek biçûk. Bi Tirkî : Bîrim. Mirov dikane di wateya fonem de jî bi kar bîne.

**kargûzarî** : Delomet, wazîfe.

**Kiryar**: Xwediyê livbaziye, kesêk karek kiriye, Subjekt.

**Komaleya ziman** : Malbata ziman, Mînak:Kurdî Komaleyek ziman e. yan jî malbatek ziman e.

**Kontînent** : Reşbelek, Qita.

**Lêker (verba)** : Ji livbaziyek, çalakiyek, tevgerek, guhertinek, rewşek bikaranîn û armancekî di naveroka xwe de şanî dide; yan jî peyvên demê re lêker tê gotin. Mînak : Hatin, gotin, ketin û hwd. Dr. K. Bedirxan navê vê lêker lêkirîye û ev peyv di zimanê me de cîh girtîye.

**Lêkerê radêr (Infinitiv)** (Infinitivus modus) :Rewşa lêker ya hîmî û hîn neguherîye. di awayek bingehîn de ye û ti paşgîn û pêşgîn negirtîye. (li bin sernivîsa lêkeran binêrin. Dr. K. Bedirxan navê vê “radêr” lêkiriye, Qanatê Kurdo jê re “fêl” gotiye. Bi giranî peyva “radêr” tê bikaranîn.

**Lêkerê aktîv (Verbes activ)** : Lêker bi du awayan tê bikaranîn, yek biawayek aktîv, yanê bê navgîn dîrekt. Mînak :Ez diçim . Ew tê. ûwd. Dr. K. Bedirxan navê vê “lebatî” lêkiriye. Lê bi dîtina min mirov dikane bi hêsanî peyva “aktîv” bi kar bîne.

**Lêkerê pasîv ( Verba la pasîvum)**: Peyva pasîv di wateya serî danîn, daxwarin, bê dengî, bê livbazî û bi tirs tevgerandinê de ye. Di rêziman de dema livbaziyek ne raste rast bi hêla kiryar de bê kirin, jê re forma pasîv tê gotin. Mînak : Nan ji min tê xwastin.

### **Celebên lêkeran di hêla virastinê de:**

**I- Lêkerên alîkar (Auxiliar, Modal verba)** : Di rêziman de hin lêker hene delomet û karguzariyek alîkariyê hilgirtine ser xwe. (Li bin sernivîsa lêkerên alîkar binêrin.) ji van re lêkerên alîkar tê gotin.

**II- Lêkerên hêsan (Verba la delikat)**: Ji lêkerên hêsan û xwerû û tu paşgîn yan jî berlêker negirtî re tê gotin.

**III-Lêkerên hevgîn (Verba Composuit):** Lêkerên bihev ve hatine bestin, berlêker yan jî, bi lêkerên alîkar hatine afirandin re tê gotin. Dr. K. Bedirxan jê re “lêkerên hevdudanî” Qanatê Kurdo jî “fêlên bargiranî” gotiye, lê ev peyv hem giran û hem jî bersiva “Composuit” nadin.

**IV-Lêkerên bê kesanî (Impersonal):** navê xwe li sere, lêkerên bê kesek, bi serê xwe tê bikaranîn. Mînak : Berf datê.

**Celebên lêkeran di hêla kargînî (fonction) de :**

**I - Lêkerên têper ( transitîv) :** Dema tişteke yan jî navgînek bê rawestan seranser derbazbe jê re transitiv tê gotin. Di rêziman de dema ku lêker xwe di nav hevokê de bide temamkirin jêra lêkerên transitiv tên gotin. Dr. K. Bedirxan navê vê “lêkerên geranî” daniye. Qanatê Kurdo berê jê re “fêl derbaz” dûre jê “têper” gotiye. Hinek kes peyva “derbaz” û hinek “rawirî” bi kar tînin. Bi dîtina min çewak di Kovara Lêkolîn de jî hatiye bikaranîn peyva “têper” him hêsane û him jî pratîke.

**II - Lêkerên teneper ( Intransitiv) .** Lêkerên xwe di rewşa tewangî de nede temamkirin re lêkerên teneper tên gotin.

**III- Lêkerên Bernavî (Verba la prominal) :** Lêkerên di rewşa tewangî de xwe bi bernavan bide temamkirin re tê gotin. Mînak: xwe şuştin.

**Celebên lêkeran ji hêla druvî:**

**I - Lêkerên Rêzgîn (regulier) :** Lêkerên di lêparîne de ne guherbar in, bi hoye, bi sazuman û li ser rêzekî ne.

**II - Lêkerên ne rêzgîn (iregulier) :** Lêkerên di lêparîne de tên guhertin, ne bi merc û sazuman in, ne li ser rêzekî diçin.

**Lêparîn (Konjugation) :** Tewandina lêkeran, kişandin û ontana lêkeran. Nav tên tewandin, lêker tên lêparîn. (li bin dema lêkeran binêrin.)

**Lêvkirin:** telafuz kirin, anîna ziman. awayê derxistina dangan.

**Mînak :** Nimûne, mîsal, wekok.

**Navgirêk** : tejên (pirtik, kîte, birge) yan jî partîkilên di navenda peyvan de cîh digire. hêceyên navîn.

**Nijad**: Cins, irq, kok û rîcala miletek.

**Paşgîn (Suffix)** : tej û parçên bi paş ve xwe digêhêjîne peyvan û pê ve tên girêdan, paş ve gîhîştin Dr. K. Bedirxan jê re “dawînî” gotiye, ev vê bersivê nade û di wateyên din de tê bikaranîn. Qanatê Kurdo jê re “paşpirtik” gotiye, ev jî, bersiva “sufixê” nade. Hinek jî “qertav” divêjin. ev gelek bîyaniye. Selîm Piçuk jî bi peyva “paş” ve paşgîna <dank> ( ev paşgîn wateyek calî, kurahî û cîhek girtî li peyvan bardike. Ji we mirov nikane di afirandina têgînek wisa de bikarbîne.) girêdaye û “paşdank” afirandiye. Kurdê Soran “paşgir” divêjin, ev jî hima bigire di wateya rast de ye. Lê peyva **paşgîn** xweş e û wateya Sufixê dide.

**Pêşgîn (praefix)** : Li ser zêde rawestan ne hewceye, lewrê min ditina xwe di Paşgînê de bi zelalî vekiriye. tê wateya tejên pêş ve digêhêje peyvan.

**Peyv** : Ji lêkera peyvandinê tê, di wateya Gotin, kelîme de ye. Kurdên Soran jê re “wuşe” dibêjin. Hinek kes jî çekû divêjin. Dr. K. Bedirxan jê re “bêje” gotiye. Lê <peyv> him pratîk, hêsan û wateya kelîmê dide.

**Pêdivî** : hewcetî, ihtîyac, tiştê gerek dike û lazim e.

**Perwerdeyi** : Karê fêkirinî, hînkirinî.

**Pejirandin** : Qebûl kirin, taw kirin.

**Peykar** : Izafe,

**Pîşe** : Meslek, senet û delometa hatiye fêrbûn.

**Radêr** : Rewşa bingehîn, hîn neguherîye, nehatî tewandin û lêparîn.

**Rengdêr (Adiectivum)** : Ji Komên peyvan, yên rewş, reng, drûv, dem û hêjmara navan dinirxine re rengdêr tê gotin. Dr. K. Bedirxan navê vê rengdêr daniye û vî peyvî di zimanê me de cîhê xwe girtiye.

**Rengdêrên şandek (demonstrativ)**: Tiştêk nîşankirin, rava yekî kirinê de rengdêr û bernavên şandekên tên bikaranîn re tê gotin.

**Rengdêrên nexuya**: Mînak : filan kes, bêvan kes , ango

rengdêriya ne xuya re tê goti.

**Rengdêrên pirsê** : Rengdêrên ji pirsan tèn.

**Rengdêrên Hêjmerî** : hemû hêjmarên di nav hevokan de tèn bikaranîn.

**Rengdêrên wesfîn(Qualitatîv)** : Di nava gelê me de jî ev peyv bi awayê “qalîte” tê bikaranîn. Di wateya wesf, çêtirîn de ye. Du celebên wê hene, yek Hûrgîn (hûredar) ya dudyan Berhemîn e.

**Rewa (mode, Konjunktiv, conditional)**: Mode te wateya nola (gora) demê guhertina çeşt û hewesa derûnî (hundirîn) û dervayî. Konjunktiv tê wateya vegotin û îfada divê (îhtîmale) bibe. bi merc û hoyî, tiştêk dive di nava merc û hoyek de bibe. Dema em bi tevhevî bivêjin, ango îfade û vegotinên daxwazek, dîtinek, nêrînek dinirxîne, dîve ev di rastiya jiyane de neyên cih jî. Ji van forman re “rewa” tê gotin.

**Rewaya heke (bi egerî)** : Ev daxwazek divêt hatiba kirin lê bicîh nehatî dinirxîne. Mînak: Heke Sîdar dê hatiba (Sîdar hatîba.)

**Rewaya Fermanî (Imperatîv)** : Ev di wateya forma fermanî de ye. Mînak : Sîdar were (bê). Sîdarino werin (bên).

**Rewaya pêşkerî (indikativ)**: Di wateya dema niha de ye.

**Rewaya Radêr ( infinitiv)** : Awayê hîmî, di awayê bingeîn de bûyîna lêkeran.

**Rewaya Daxwazî** : Daxwazek anîna ziman. Mînak: Sîdar bihata.

**Rewaya berkar (partizip)** : Lêkerên wek nav û rengdêr tèn bikaranîn.

**Rewaya Xwezî** : Xwastina bi lavatî. Mînak : Xwezila Sîdar hatîbûya.

**Rûberkirin (Contrantive)**: Dayîna berhev beramber kirin, du heyîyan anîna berhev.

**Serve (Complementum)** : Qedandin, serrast kirin. Di rêziman de peyvên wateya hevokan sererast dikin, wateya hevokan bê kêmasî temam dike; bi kûrtî ser ve bûn: Serve (tümleç). Du tovên serveyê hene.

**I - Serva serrast** : Serveya gelek zelal xûya dike.

**II - Serva fitilî** : serveya nexuya ye.

**Têgîn (Termînîs)** : Peyva Latînî <Term> di wateya kevirê tixûb, encam û rêz de ye. “Terminieren“ tê wateya di nava çarçovek û tixûbek de dîtîne. “Termînus” tê wateya têgîhîştînen di heş de, ne di rastiya bercavî de, peyva zanistiya tofek û têgîhîştînek dide xuyan. Hinek miletan ev peyv pejirandine, û hinekan jî, ji lêkera têgîhîştîne afirandine. Alman jê re “begriff” ( ji lêkera begreifen tê), Tirkan jî jê re “kavram” ( ji lêkera kavramak tê) gotine. Di zimanê me de Mirov dikane ji lêkera “têgîhîştîne” bi afirîne. Yanî “têgîn”.

**Tej (syllaba)** :Piraniya zimanên Indo - Ewropî peyva “**Syllaba**” pejirandine û hinek jî, li zimanê xwe anîne. Ev peyvek Grêkî ye. Di wateya bi hev ve girtin û parek (perçek) tevheviyê de ye. Di Girêkiya kevn de di wateya tejê de jî, hatiye bikaranîn. Di rêziman de tê wateya par û parçê peyvê, piraniya wan bi serê xwe bê wate ne. Di zimanê me de tenê peyva “**tej**” bersiva vê têgînê dide. Li Tirkîyê jê re “hêce” tê gotin. Dr. K. Bedirxan jê re “**kîte**”. Ev ji kîjan peyv û lêkerê afirîye ne zelal e. Bikaranîna vê peyvê gelek giran e. Mînak : Bikîteyê (kîte bike), dikîteyê (kîte dike) bi kurtî li rêzimanê me nayê. Qanatê Kurdo jê re “pirtik” gotiye. Ji peyva pûrtê, pirtik û yan pirtikandinê tê. Gelek mirovên me yên dinivîsînînan vê bikartînin. Lê ne rast e û di rêziman de bikaranîna wê gelek dijwar e. Mînak : Ez dipirtikim (dipirtikînim), bipirtike (bi pirtikîne). bi kurtî li rêzimanê me nayê û di awayek peyva pêkenîyê de ye.

Kurdên Soran jê re “**birge**” divêjin, ev jî di nîv wateyî de ye ,yanî wateya Syllaba bi tevhevî nade . Peyva “**tej**” him hêsan him bersiva Syllaba dide û him jî di rêziman de bikaranîna wê hêsane. Hêla wateyî de. Mînak : Kon tevheviyekî ye ji tejan pêktê ; tejê kon. Fîstan tevhevîyekî ye ; Fîstanê te çend tejî ye?. ûwd. Di rêziman de bikaranîn gelek hesan e; Mînak : bitejê, ditejê, zarok peyvê ditejînin, min tejand ûwd.



**Têkilî** : Alaqe, peywendî

**Temamkar (Attribût)** : Peyvên drûvên navan dinirxîne, danasîn, nasnama peyvan, tewawkarê xwedîtiyê.

**Tewang (Declination)** : Peyva Latînî di wateya xwe ya bingehîn de vetewina bizmar û tiştên hesinî ye, çiva di nabera stêrkê Hurcî û Ekvatora asuman de ye. Di rêziman de jî, tê wateya veguhestin, vetewîn ango tewanga nav, bernav, û rengdêran. Dr. K. Bedirxan navê vê “tewang” daniye û ev bersiva vê peyva latînî dide û di ziman de cîhê xwe girtiye.

**Tewinek (casus)** : Tê wateya zanyariya rewşek (halekî) tewandin û veguhestinê. Kesî navê vê têgînê daneniye. Mirov dikane bi hêsanî “tewinek” bivêje. Hemû zanyarên zimanê Îndo - Ewropî bi bingehîn behsa 8 tewinekan dikin. Prof. Hans Krahe (76) wusa rêzdike : 1- Nominativ (radêr), 2- Akkusativ (Tewangî ), 3- Dativ ( Jêre), 4- Genitiv (xwedîtî ), 5- Ablatîv (jêve), 6-Lokativ(Cîgehî),7- Vokativ (bangî), 8- Instrumentalis (hogirtî) û ji gelek zimanan mînan dide.

**Tewîneka Radêr** : Di wateya peyvên hîn nehatine guheztin de ye, yanî rewşa xwe ya bingehîn diparêze. Bersiva kî ? û çi ? dide.

**Tewîneka Tewangî** : Di wateya objeyên nêz, berî dayîyênêk yan jî rasthatinekî dinirxîne. Bersiva pirsên kê çi û ku? dide.

**Tewîneka Jêre** : Ev objeyên dûr û armançek dinirxîne. Yan jî kirinek ji bo objeyek, bo yekî bicîhanînê dinirxîne. Bersiva; (ji) kê re, (ji) çi re, dide.

**Tewîneka Xwedîtî** : Tê wateya tewîneka nav û dengdêran di nav warekî de bikaranînê. Xwedîtî û girêdayiyê dinirxîne. Bersiva ; yê (ya) kê, ê (a) çi dide.

**Tewîneka Cîgehî** : Ev tewînek cîh û rawestinek di nava dem û warek de dide xuyan. Bersiva pirsên; (di) ku de, (di) çi de, li ku, li çi, dide.

**Tewîneka Jêve** : Ev tewîneka cîh, rîçal û serê destpêkê ye. Cîh û xala jê hatiye rawirtin û derketinê dide xuyan. Bersiva pirsên ; ku ve, çi ve, ji ku, ji çi, dide.

**Tewîneka Bangî** : Ev dema bangkirinê de tê bikaranîn.

**Mînak** : Lo Heso, lê Fatê, Gundino.

**Tewîneka Hogirtî** : Ev bi objeyek û kesek re hevaltî kirin, bi objek ve hilkişîyan, yan jî pêveçûyînê dinirxîne. Bersiva pirsên ; bi kê ve; bi çi ve, bi kê re, bi çi re dide.

**Vebirî** : Lêkerên veqetandek, objeyên ji hev hatine vebirîn û qetandin. Di Kurdî de hima bigire hemû lêkerên hevgîn vebirîne, ev karekterek zimanê Kurdî ye. Di zarava Kurmancî de, vebirîn bi alîkariya daçek û berlêkerran xuya dike. Mînak : Vekirin = vedibe, vebibe, venebe. Di zarava Kirdkî de berlêker ji lêkerê diqete û li pey tê bikaranîn. Mînak : Rakewten = ez kewt ra, ez kuna ra û hwd. Di Soranî de û di zaravên başûr yên din de gelek berlêker wek peylêker bikartên. Mînak: xwardinewe û peylêkerên “ere, ewe” ûwd. Bikaranîna li herêma “Torê”, Torîkî : dirabim, dirunim ûwd.

**Velîstin** : Cîh guhertina dangan, nerm yan jî stûrbûna dangan (tîpan).

**Veristin** : Jihev qetandin, ji nav hev derxistin, analîzkirin. gelek caran jî diwateya çareserkirinê de tê bikaranîn.

**Virasten (virastin)** : Ristina peyvan, dezgeh û avayiya peyvan, Struktura rêzimanî. Ji zaravê Kirdkî hatî girtin.

**Wate** : Naveroka peyv, bûgîn û objeyek, mana. Mînak: Ev tê çi wateyê?

**Wêje** : Edebîyat, lîteratûr . Wêjeyî: Edebî, lîteratûrî.

**Yewmar** : Peyvek zaravê Kirdkî ye. Ji peyva yew(yek) û raya lêkera marenê (jimartin, jimarî, hêjmartin) ye. Wateya yekhêjmarê (singular) de ye. Peyva yekhêjmar gelek dirêj û giran e. Bikaranîna peyva “yewmar” him hesan, him kurt û him jî bo nêzîk kirina zaravan gavekî ye. Ev peyv berê di hêla Lerzan Jandil ve hatiye bikaranîn.

**Zafmar** : Ev jî payvek zarava Kirdkî ye. Ji payva <zaf> û raya lêkera <maren> hatiye virastin û wateya pîranî (gelhêjmarê, plural) dide. Mirov nikane peyva “pîranî” bikarbîne, lewrê bê zaravê Kurmancî û Goranî ev di zaravên din de tê wateya “tijî”. Peyva gelekhêjmar (gelhêjmar) jî him dirêj û him jî giran e. Peyva zafmar him hêsan, him pratîk û

gavek ji bo nêzîkirina zaravan e. Ev peyv jî berê di aliyê Lerzan Jandil ve hatiye bikaranîn.

**Zarava:** Devokê herêmek mezin, Lehçe, dialekt.

**Zayend :** Nêrî û mêtiya peyvvan, yan jî pêşgînên nêrî û mêtiyê dinirxîne.

## ÇAVKANIYÊN VÊ XEBATÊ

- 1—Heidrun Pelz, (kritische Wissenschaft) Linguistik für Anfänger , (Weşanxana Hofmann û Campe.)  
Rûpel : 198
- 2-Guchmann, Allgemeine Sprachwissenschaft Band :1  
Berlin 1975, Rûpel : 412
- 3-M.D. Stepanova, I.I.çernyûeva; Leksikologie der deutschen Gegenwartssprache (weşanxana Moskau „Hochschule,“) 1975, Rûpel :191
- 4-Walter Porzig , Das Wunder der Sprache (Probleme, Methoden und Ergebnisse der Sprachwissenschaft) (Francke Verlag) München 1971, Rûpel : 218
- 5- Kovara P.M. (Peter Moosleitners Interessates Magazin) hejmar =8 -1992 Rûpel: 30
- 6-Max Müller, Lectures on the science of language, London 1861 (ji pirtûka Walter Porzig W.S.) Rûpel : 296
- 7-N.J. Marr , Die Entstehung der Sprache, (Ji pirtûka W. Porzig) Rû: 296
- 8-Kovara P.M. 8-1992 Rû : 30
- 9-W.D.Whitney Language and Study of Language, New York (ji pitûga W.Porzig) Rû:298
- 10-Mielliet, Allgemeine Sprachwissenschaft , bend 1 Akademie Verlag Berlin 1975 Rû:394
- 11-Walter Porzig Das Wunder der Sprache . Di bin sernivîsa „çima ziman diguhere” de.
- 12-G-Morgenstierne, Handbuch der Orientalistik- Iranistik Leiden , Köln 1958, Rû: 155
- 13-F.Justi, Kurdische Grammatik , Rû: xxv
- 14-Şerefname ya Şerefxanê Betlîsî , di bin sernivîsa „Mîrîtiya Hekarî û Dimbilî,, de
- 15- Mielliet, Li hêjmara 10 an binêre.
- 16-Hinek kopîyên ku, Birêz Cimşid Bender ji Arkologê

- muza Xarpêtê Suha Bulut girtî û daye min.  
 18-W. D. Whitney, Li hêjmara 9 an binêre.  
 19-O.Jespersen, „Language its Nature development and  
 Origin,, London 1922 (ji pirtûka W.Porzig) Rû: 300  
 20-W.Porzig Rû: 302  
 21-P.M. 8-1992 Rû :31  
 22-W.Havers, „Handbuch der Erklärende Syntax,,  
 Heidelberg 1931, Rû :156  
 23-Kemal Fuat, „ Kurdische Handschriften,, Berlin 1970,  
 Rû : XV  
 24-Kovara P M 8- 1992 Rû :30  
 25-Ji Informantek  
 26- Ji pirtûka Handbûch der Orientalistik, Iranistik.  
 27- E. Xemgîn, İslamiyeten Osmanlılara kadar Kurdistan  
 Tarihi 5000 Köln 30 1989, Rû : 53  
 28-Prof. H. Jensen „ Neue Persische Grammatik,,Heidelberg  
 1931, Rû: 2  
 29-Karl Hoffmann, “Handbuch der Orientalistik- Iranistik”  
 Rû :1  
 30-Ji pirtuka Handbuch der Orientalistik, Iranistik.  
 31-O.Mann, Kurdische und Persische Forschungen; Tacik  
 Mundarten in Provinz Fars. Berlin 1909, Rû: XIV  
 32-Li hêjmara 28 an binêrin.  
 33-Li hêjmara 29 an binêrin.  
 34-W.B.Henning, Handbuch der Orientalistik- Iranistik,  
 Rû: 90-93  
 35-H. Jensen Neupersische Grammatik Rû ;3  
 36-Li hêjmara 12 an binêrin. Rû: 167  
 37-Pierre Lecoq, wergerandina Mamo Cumî ya di rojnama  
 Azadî 2-8 gulan 1993 an. Rû : 5  
 38-Li hêjmara 12 an binêrin . Rû : 159.  
 39- Li hêjmara 12 an binêrin . Rû : 159  
 40-41- Li hêjmara 37 binêrin. 25.4-1.5 1993  
 42- Rojnama Azadî ya 18- 24 Nîsanê 1993 an Rû : 5  
 43- R. Azadî 25.4, 1.5.1993 Rû : 5  
 44-Necmetin Büyükkaya, Kaleminden Sayfalar,Spanga,

- Swêd 1992, Rû :461-467
- 45-Li hêjmara 12 an binêrin, Rû:166
- 45-li hêjmara 23 an binêrin.
- 46- Mîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot; Kûrtçe Gramer, (weşanê Doz) Istanbûl Rû: 13-14
- 47- Rojnama Azadî ya 18- 24.4.1993 Rû : 5.
- 48- G. Morgenstierne, Handbuch der Orientalistik, Iranistik Rû : 158.
- 49- G. M. Rû : 158
- 50- Karl Hoffmann H.O.Î Rû : 8
- 51 -W. B. Henning, Handbuch der Orientalistik, Iranistik Rû: 78.
- 52 -Karl Hoffmann, Handbuch der Orientalistik, Iranistik Rû : 11-12
- 53- G. Morgenstierne, H.O.Î Rû : 159
- 54- Pierre Lecoq, Ji Rojnama Azadî ya 18 - 24. 4. 1993 Rû : 5.
- 55- Oscar Mann, Kurdisch- Persische Forschungen, Tacik Mundarten in Provinze Farsî, Rû :XXI.
- 56- P. Lecoq, Ji Rojnama Azadî ya 18-24. 4. 1993. Rû :5
- 57- G. Morgenstierne, Handbuch der Orientalistik, Iranistik Rû : 158.
- 58- P . Lecoq ji rojnama Azadî ya 18- 24. 4. 1993. Rû : 5.
- 59- Karl Hoffmann, Handbuch der Orientalistik, Iranistik Rû : 2
- 60- Li hêjmara 57 an binêre.
- 61- Karl Hoffman, Handbuch der Orientalistik, Iranistik Rû :5 - 10
- 62- W. B. Hennîng, H. O .Î Rû : 91.
- 63- F. Justî, Kurdische Grammer di benda ABC de
- 64- K. Hoffmann, H. d. O. Iranistik Rû : 16.
- 65- H. Jensen, Neupersische Grammatik Rû: 74
- 66 -H. Jensen, N. P. G Rû: 75.
- 67- Lerzan Jandil, Kovara Lêkolîn, Weşanê Institutiya Kurdi, Berlîn Rû : 141
- 68- Lerzan jandil, Kovara Lêkolîn Rû : 141.

- 69- P. Lecoq, ji Rojnama Azadî ya 25.4- 1.5.1993 an Rû:5.  
 70- G. Morgenstierne H. d. O. Iranistik Rû :165.  
 71- Necmettin Büyükkaya Kaleminden Sayfalar .  
 Hazirlayan ve Derleyen : Şerwan Büyükkaya Spanga 1992. Rû  
 : 461.  
 72- Li hejmara 65 û 66 an binêrin.  
 73- G. Morgenstierne, H. d. O. Iranistik Rû : 164.  
 74- G. Morgenstierne, H. d. O. Iranistik Rû : 166.  
 75- Oskar Mann, Kurdisch-Persische Forschungen Mundart  
 der Mukri Rû : XCVIII.  
 76- Hans Krahe, Indogermanische Sprachwissenschaft.

### **Çavkaniyên Zaravan;**

#### **A-Çavkaniyên Kirdkî,**

- 1-Xebata Lerzan Jandil ya li ser, bernav, zafmarî û tewangê.  
 2-Xebata Lerzan Jandil ya di Rewşen Hejmar 10 sibat 1993  
 an de.  
 3-Karl Hadank, Mundarten der Zaza, Hauptsaechlich aus  
 Siwerek und Kor Berlin 1932.  
 4-Romana Munzur çem „Hotay Serra Usivê Qurzkizî,,  
 Stokholm 1992  
 5-Malmisanij, Ferhenga Dimilkî - Tirkî , Jîna Nû yayinlari :  
 Upsala 1987  
 6-Berhevkirinên min yên ji Informantên, Dersîm, Palo,  
 Gimgim, Çêrmîk û Çewligê.  
 7-Informant, Cîhan Ji Gêlê.  
 8-Informant Usên ji Dêrsim.

#### **B- Çavkaniyên Devokê Sinê,**

- 1-Infomant Raşidyan û zarokên wê, ji nava bajarê Sinê  
 (Sanandaj) ne.  
 2-Informant Mohamed ji gundekî bajarê Sinê ye.

3-O. Mann, K. P. F. Mundart der Mukrî.

C-Çavkaniyên Goranî,

- 1- Karl Hadank, „Mundart der Gûraen besonders das Kendûlûî, Aûramanî und Badschûlanî,, Berlin 1930
- 2- Informant, Ji Kurdistana Başûr, Eziz
- 3- Dr. Yosef Sand
- 4- Informant Rahman

D- Çavkaniyên Soranî û Mukrî,

- 1-Oskar Mann, die Mundarten der Mukri Kurden teil: I , II (Grammatische Skizze, Texte in Phonethischer und Persischer Umschrift) Berlin 1906
- 2- Qanatê Kurdo „Gramera Zimanê Kurdî, Kurmancî - Soranî „, Weşanên Roja Nû.
- 3-Newzad Mohamad, Ferhengoga Almanî - Kurdî, Darmstadt, 1988.
- 4-Zimanî Yekgirtuy Kurd, Cemal Nebez Weşanê NUKSE.
- 5-Informant ji Hewlêr û Silêmanî

E- Çavkaniyên Kurmancî,

- 1-Kovara Rewşen (hemû Hêjmar)
- 2-Rojnama Welat
- 3-Hêvî, (Kovara çandîya Giştî) hêjmar 1, Îlon 1983
- 4-J. Blau, Kürtçe - Türkçe sözlük , Sosyal yayinlari 1991,
- 5-Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot , Kürtçe Giramer, Doz yayinlari.
- 6-D.Îzolî, Ferheng, Tirkî , Kurdî.
- 7-Qanatê Kurdo, Zimanê Kurdî, Rêziman , 1981
- 8-Mele Muhamed Dêrşewî, Miştaxa çiya Gotinên Pêşiya, Stockholm, 1989
- 9-Xebat û berhevkinên min.

F-Çavkaniyên Lor (Feylî) û Lakî. û Gundên Kalûn û Ebdu.

- 1- Oskar Mann, K-P-F. Dî Mundarten der Lur- Staemme im Sudwestlichen Persien. Berlîn 1910.



2- Oskar Mann, K. P. F. Die Tajik Munartin der Provinz Fars. Berlin 1909.

3- Informant Rahman (bi xwe Lakî ye)

**Çavkaniyên din;**

1-Duden 7; Herkunftswörterbuch. Duden Verlag / Mannheim, Zürich, Wien. 1989

2 - Richard Von Kienle, Fremdwörterbuch Lexikon Den Keyserschen Verlagsbuchhandlung München. 1964.

3-Ars Graeca, Griechische Sprachlehre. Ferdinand Schöningh - Paderborn 1968.

4 - Indo - Germanische Sprachwissenschaft Dr. Hans Krahe, Unî - Tübingen (Zanyariya Zimanê Îndo - Germanî)

5 - Karl - Dieter Bönting, Einführung in die Linguistik. Fischer Athenaeum Taschenbücher Verlag Frankfurt /am Main 1973.

6-Grammatik der Deutschen Gegenwartssprache. O. Moskalskaja, Verlag Hochschule Moskau 1975.

**P**irtûk, li ser gelek zaravên Kurdî ji hemû parçeyên Kurdistanê radiweste, bi rûberîneke xurtepeyv dixwaze zelalî di navbera zaravan de ava bike. Carcaran cîgirtina hin peyvên devokan, bi taybetî devokên herdu zaravên Bakur wek mînakên alîkar naverokê xurt dikin, Rûberîn ne tenê di warê peyv û hevoksazî de, di warê rêziman û dengzanistî de jî, dihêle ku mirav bi gelemperî çavekî li ser form û naveroka zaravan bigerîne. Bi vî awayî pirtûk, ne tenê ji bo pispor û zanbaran lê ji bo xwendevanan hemû balkêşiyek tîne pêş...”

**Înstîtûta Kurdî**  
ji bo Lêkolîn û Zanist

15,-DM

© **ÎNSTÎTÛTA KURDÎ**  
**ISBN: 3-930943-10-7**